

مەھفەل

گوچارە کا رەوشنەنیرى وەرزانە يە
g.mehfel@yahoo.com

2
ئىمارە:



Mehfel 2

2010

مەھفەل



پاييزا 2010 - دەھوك

پەزىز 20

بۇ / سەرنىقىسىرى كۆفارا (مەحفل) زۇر بەرىزىز

ب / پیروزی

سلاطہ وریز . .

ب هلکه دنیا تازه هر کهفتا کزفرا و میا هیزا "مدحفل" جوانترین پیرزیاهیان ب نافی لقی دهزک
بین سندنیکا روزنامه نهیسین کور دستانتی ناراستادی هولوین برای خودان نتیمیاز و سردنیسر و دهستادی
نهیسینی و کادری ته کیکار دکدین و هیغه دارین هر میا همه سوز دلی شین درووشی خو چهیشن و باشر
خرمداه بیافی روزشبری یا گشتنی یا کوردی ل ستووری دهتمرا مه و هدرینما کور دستانتی بکهن و ب به
دهنگی زهانی خرمداتکرا کملتوروی مللتنی کورد دفی بیافی دا.

دزیاره پرور زیاهی ل گشت کاستنی کفرانی دکلین و هیقدارن هدر سدر کشفی بن و نهم چافرینه ژمارین
بین باشز و دودله مدنتر بن پی خزمتا راگهاندن و روزنامه فانی ل دورو پرمنسپین پیشای.

سگنیزی لقی دهوك سندبک روزانه میشین کور دستا

ویندهک بز:

المفتى

مجلة ثقافية فصلية

صاحب الامتياز
ريسان حسن جندي
resandinay@yahoo.com
0750 4501690

رئيس التحرير
كوفان ريسان خانكي
Xanki_kovan@yahoo.com
0750 4969810

سکرتیر التحریر
حجی مفسو حسو
Hijy_mag2010@yahoo.com
0750 4576304

هيئة التحرير
مصطو الياس الدناني
مروان شيخ حسن رشکانی
الياس نعمو ختاری

الفنى خانگی

مطبعة هاوار - دهوك

g.mehfel@yahoo.com

العدد
(2)
خريف
2010

(2010/6/10) (272)

سەرگۆتار

سەرنفیسکار

1

ب ھەلکەفتا عيدا جمايا پيرۆز و دىرىين، پيرۆزباھييەن خوه ل گشت كوردان و ب تايىھەتى ئىزديان دكىن ل سەرانسەرى دنياىي و ب تايىھەتى ل كوردستانى. هيقيدارين گشت رۆزىن مللەتى مە جەژن و خوهشى بن. پيرۆزه..

2

ژ بەر وى پېشوازيا زۆر يا ژ بال جەماوەرى فە ل ژمارا ئىكى يَا گۆفارا مەحفل ھاتىيە كر، گۆفار ب دەست ژمارەكى زۆر يا خەلکى نەكەفت، لەورا ئەم داخوازا لىبۈرىنى ژ وى خەلکى و وان خودندهقانىن ھىئا... نفيسەرىن ب روومەت دكىن. خودندهقانىن ھىئا... دى ھەول دن گۆفارا ھەوە مەحفل بەر ب پېشە بن و زىدەتر بابەت و لىكۈلىنин كەسانىن ئەكادەمى وەشىن، دەھەمان دەم ژى دا رى ل بەر نفيسكارىن خود يېئن ژىھاتى و گەنچ ژى ناگىن، چونكى مە گەنجىن خودان شيان ھەنە، دىسان داخوازى ژ نفيسەرىن ھىئا دكىن ئەۋىن بابەتان بۇ مەحفل رى دكىن ئەم هيقيدارن ئەو بابەت ل جەھان نەھاتىتە بەلاغەكىن.

خودندهقانىن ب روومەت.. ھەزما رىكىن ل سەر كىسى خودانى ئەمتىازى و سەرنفیسکار ھاتبوو چاپكىن، ئەڭ ھەزما رى ل سەر كىسى خودانى ئەمتىازى و سەرنفیسکار و دەستەكى نفيسەران ھاتىيە چاپكىن.

گەل خودندهقانان.. ژ بۇ ۋىن ھەزما رى گەلەك گۆتار و لىكۈلىنин ب نىرخ ژ بۇ مەحفل ھاتنە، لەورا ئەۋىن د ۋىن ھەزما رى دا نەھاتنە بەلاغەكىن، داخوازا لىبۈرىنى ژ خودانىن وان دكىن و هيقيا خودى د ژمارىن بھېت دا دى جەھىن خوه كن. ھەر دسەركەفتى و دېرەدەوان بىن ژ بۇ خزمەتا كەلتۈرى كوردى بىن رەسەن و دەولەمەند و كىيم خودان.

- سەرگۆتار سەرنفیسکار
- شرۇفەكىن سەمبولا ئىزدىان "تاووسى مەلەك" د. خانا ئۆمەرخال 1
- ج جەڭ و نەتهەو مينا ئىزدىان پەيشا خودى بكارنائىنە كەمال تۆلان 5
- دنافىبەرا ئىزدىياتىي و مىرتائىي دا فەھى بابى رۆزانى 14
- مەزارى خودانى بارانى ل قونتارا چىايى مەقلوبى شىيخا كۆفان خانى 17
- خەرقە، پيرۆزى، سوند و باوهرى د ئىزدىياتىي دا مەروان شىيخ حەسەن 25
- سەراتىيەك راستىنى ژ مىزۇويا ئىزدىان يانىزىك ب. فرياد 37

القسم العربي

- آراء و مقتراحات لتشريع قانون الاحوال الشخصية الايزديةالحقوقى: حسن الجوتىار 41
- جبل شنگال في العصور الجيولوجية الأولى و علم المتحجرات فيها قاسم عطوط او صمان 45
- حوار هادئ مع اعلاميين في الشأن الاعلامي مصطفى الياس الدنابى 48
- الموت والدفن حجي مغسو حسو 64
- لالشيات ح.3..... حسو هورمي 70
- عاقبوا الحب ... أثيروا الحب !! نسرین محى الدين اليوسفى 76
- ماذا تعرف عن منطقة بن كند؟ الياس نعمو ختاري 79

Kurdî – latînî

- Berxwedana êla Xalta, Mîrzikê Zaza Dr. Eskerê BOYÎK 1
- Nerînek li dîroka kevnar Dr. Tosinê Reşid 20
- Notenivîsar Ji arşîva prof. Hecîyê Cindî Dr. Nûra Cewarî 27
- Ûsê Hersan Dr. Deham Ebdulfetah 30
- Projeya Dibistanê Kurdî li Almanya Dr. Celalettin Karal 33
- Rezo-Aro, ji me xeyidî û çû... Dr. Bayê Nazê 58
- Cegerxwîn, bilbil û mertalê jar û bindestan Berken Bereh 61

تاووسى مەلەك

دەربارى تاوسى مەلەك دە نېرىنلىن زەحەف بەرامبەرى
ھەڤ و جودا ھەنە. چەند سەيىاهان د سەياحەتنامەيىن
خوھ دە، ژ بۇ ئىزدىيان، ژ بەر ھەباندن و پاراستىنا تاوسى
مەلەك گۆتنە "دىۋپەرسىت". نېسىكارىن نەزان ئىن دەما
كەفن ژى وسا گۆتنە و ب ۋى سەددەمى ئىزدى وەك
"دىۋپەرسىت" نىشان كرنە. فەرىن وسا ژ ئەنجامى
شاشىيەن مەزن تىن. ھەر وە ج ژى ب فەرىن ئىزدىيان،
درەھەقى ۋى مەلەكى مەزن دە زانىنەكە گاشتى تونەيمە.
دەمَا ئىرۇ گەلەك جاران د ئىنتەرنىتى دە ل سەر
مالپەرىن ئىزدىيان، كتىب و گۇتارىن دەرەھەقى ئىزدىياتىنى
دە، نىشانا سەمبولىكا تاوسى مەلەك ژ ئالىي علمدارى
نارقۇلۇجىلى. نابۇ ۋە، كو ھەۋچەرخى مەيمە، ھاتىيە
چىكىنى. ئەو نىشان گەلەك ب حەواسە و ب نېرىندا من
گەلەك فەرەھ نىتا بىناتىن ئىزدىياتىن نىشان دە.^۱
ئەڭ نىشانا ئىزدىيان، كو ئەز د ۋى گۇتارى دا ژى شروعه



د. خانا ئۆمەرخال/
زانكۈيا گۇتنىن،
ئەمانىا

^۱ بەن دىبە كو نىگاركىش فەرىن جوودا ژى تەڭل ۋى نىشانى كرنە.

بكم، دكارە ژ مەرا گەلەك تشتان بېيژە. فرا تاوسى د دۆرى د نەفەش كربووبىه. دۆر د
ئىزدىياتىن دە، وەك گەلەك دينىن دە ژى ھەيە، سەمبولىكە. ئەو سەمبولا ھانى پر
كەفنه، كو عەدەت بووپى و ئالىم ئىزباتە.

ئىزدى رۆزى وەك كانيا ژىن و حوزورىا بەرجاڭ ئا خودى ئى دە دەحەبىن، لى ئاگر؛
دەرسوشتى دە ل سەر ئەردى وەك ئەيانبوونا رۆزى ئى دىتن. ژ بۇ ۋى يەكى ژى، ژ بۇ
ئىزدىيان جارنا دگۇتن "رۆزپەرسىت" يان ژى "ئاگرپەرسىت".



دەقى سەمبولى دە ئەم ھېقى (مەھ) دېبىن، كو
ئىزدى ئى دەحەبىن. خودانى ژىن و زارۇك -
خاتۇونا فەخرا- ب شىكى ھېقى ئى نىشانىن.
فەخرەدىن ژى ب شىكى ھېقى ئى نىشانىن.
فرا تاوسى ل سەر سەمبولى رۆزى - خاچ- كو د
دۆرى د هاتىيە نەفسكىنى، دسەكىنە. خاچ، وەك
نىشانا رۆزى د سوورەتىن جوورە جوورە دە: ژ
ئاناكۈرياخ (ئاناكۈريسىنۈر) ھەتا گامماتىك د
سەمبولىزمى دىنى يى گەلەك ملەتان دە تى
دىتن؛ كو ژ گەلەك سەدسالىن بەرى يېن ھاتنا دىنى ئىسازە سەمبولا خاچ ھەيە.

خاچ، كىزان ژى نىبە، ئەول - فيتىشى (سەنەمى) ئاگر بۇو، ژ بەر كو بۇنا ستانىدا ئاگر دو
شىغىدار ب ھەۋرا حەسكاندىن. خاچ نوتلا دۆر و ئۆرتى، ھى د زمانى گەلەك قەدىم د وەك
شكى موقەدەس دەتە ھەباندىن، كويەكىبۇونا ئەرد و ئەزمان و ھەر وسا ژى ئاقانى دنىايىن
نىشان ددا.

پارفەكىناب خاچى ب چار قىسمەتىن دكارە نىشان بىكە: چار ئالىي ئالىملىقى "باکور"،
"باشۇور"، رۆزھلات، رۆزئافا، وسا ژى چار ئىلىملىقىن (ئاڭ، ئاگر، ئەرد و با)، وسا ژى چار
فەسىلىن سالىن (ھافىن، پاپىز، زېستان و بەhar)، جار دەورىن ھېقى. لەمما ئەڭ رەقەم د گەلەك
دىن و كولتوران د سەمبولىكە. رەقەما چار بۇنا مەرفىن قەدىم وەك سەمبولا قەوهەتى، بى
قوسۇورىا روحى و تەمامى دەتات گومانكىنى.

بن فی نیشانی ده، تی ئەيانکرن، هاتیه نفیساندن "تاووس". ئەو ب سی نیشانین خهتا میخی هاتیه نفیساندن، کو ئەم دكارن بخوینن چاوا: ت-وانائ.

ژ وى ب ئالىي راستى خهتا میخى سو-ون (sinu-) هاتیه نفیسینى، کو مانهيا وى "ھيف"د. ب زمانى ئاككادى سينه و ب زمانى ئاككادى بى كەفن سووپنه.

دگۇشەيى راستى ژيرى - نیشانى خهتا میخى م "با".

بن فی نیشانى دراست گۆشەيى سېپى ده هاتیه نفیساندن ئەزى-دى "ئىزدى". ژ ئالىي راستى د قسمەتا ژيرى ئەم زيارەتا ھەموو ئىزدىان دېيىن - لالش، کول شىخانه. ئەو نەقش گەلەك بالكىشە - فكرا خويانى يى بنياتا ئىزدىياتى يە، کو ب ھونھرىي ب ساياسەفتا تاووسى مەلەك هاتیه كەشكەن.

علمدارى سېمیونوف تاووسى مەلەك ب دېميورگ بەرامبەرى ھەۋى دىكىر، ژ بەر كو يەك ژ كتىبىن موقىدەس ئىن ئىزدىا "مسەقا رەش" دە خوددى ژيرە دېيىزه: "من ھەموو ھەشىا كە دەستى تەددە، خolasە، تاووسى مەلەك دې خودىي قودرەتا زەحف مەزن، کو د ۋى سەمبۇلى دە هاتیه نیشانكەن.

قسمەتا نەقش (سفەتى) ژورىن، شكلنى دىلا ۋەكىرى يا تاووس نىقى دۇرا ب ۱۲ قسمەت دىكە. چاوا ژى نىقى دۇرى يى ژيرىن، کو ب ھيف قابكىرىه (قاش كىرىه). دوانزدەھ قسمەت ژورى رۆز (زىسى ھەتا ئىشلارى) نیشان ددىن. دوانزدەھ قسمەتىن نىقى دۇرى يى ژيرىن ئىن ب ھيف، شەقى نیشان ددىن. خolasە، ئەو تەھە ۲۴ سائەت، يانى شەق رۆزە. ئەو نەقش، ئەلامەتىن دىنى يىن كەفن يىن ئىزدىيان و فكىرىن كۆسمۆگۈنىك نیشان دده. ئىزدى دېيىن: "يا خوددى، تو خودانى شەق و رۆزى".


ناڭ سەفتى دىلا تاووس دە (ئەو د قسمەتا ژورى يە) ئەم پارەفە كرنا دن ژى دېيىن، کو ناها ژى ب ۷ قسمەت هاتیه تەقسىم كرنا. جارەكى دنى ژى ئەو رەقەما سەمبۇلىكە سەمبۇلا ئەساس و كانييەن كۆسمىك يىن تەورەبلەندىن. رەقەما ھەفت رەقەما خودىيى يە، کو گەلەك جاران د دىنى ۋېدىك دە و زەردەشتىي دە تى كەشكەن، زاڭ جاران ژى رەقەما ھەفت د تىنجىلى دە ژى دەرباس دە.

د ئىزدىياتىي دە بەرى ئافراندىن دىنابى خوددى ھەفت ملىاكمەت ئافراندىن و سەرۆكى وان تاووسى مەلەك كەشكەن كرنا. ئەو فكرا ژى د ۋى نەقشى دە هاتیه نیشانكەن. ل سەرەت تاووس دە توونجىك (قۇقۇل) وەك تاجە، کو خووت (گەندى) د ئۆرتا وان ھەفت قسمەتە. ھەتا ب چاپ (بلنداهى) ژى ئەو قسمەت ژ ھەموو قسمەتىن دن مەزنترە. تاج ب خوھ ژ سى ھاجەتا (قسمەتا) چىپپووې. و ئەو سى قىسمەت يەك ژ ئەساسىيئ ئەسلى يىن ئىزدىياتىي يە. د ئۆرتا سەفتى دە ئەم نیشانىن خەترا میخى دېيىن، ئەيانە كو خەتا میخى يا سوومەرى يە. ژ ئالىي چاپ ئەم نیشانى خەتا میخى (سېپى و مەزن) دېن، کو تى خوندنى وەك دنگر و مانهيا في گۇتنى "خوددى" يە.

ژ وى ب ئالىي راستى - نیشانى خەتا میخى ب سوومەرى تى خوندن وەك ئۆتو (= ب ئاككادى سامسو). مانهيا وى "رۆز"د.



ج جفاك و نهتهوه مینا مه ئىزدى – كوردان پەيقا خودى بكارنائينه



كەمال تۈلان / ئەلانيا

گەلەك خوندەفين بەريز ژى دزانن كو من د گۇتارا خوه يا ب نافى "باورىا ئىزدىيا يا ب خودى" ده ژى دايە خوياكرن و فيگا هيئى د علمى مه ئىزدىيان ده تى گۆتن، خوددا يىن مە هەموو گياندارىن ل سەرانسەر ئىيەكە. هەموو جفاك، ئۆل و نهتهوهىين كول سەر روبي فى دنيايى ھەنە، ل گۇرى چاندە و باورىا خوه ھەبۇونا خودى ناس دكىن و ھەر يەكى ژى ب زاراھە ئان ژى زمانى خوه ژ خودى را دېبىزە ئان ژى گۆتنە: ھورمز، ئاتون، ماردوک، شاماش، بال، ئىيل، هاداد، خودا، پادشا، خودى، رەب، تەمۇز، دوموزى، ئادۇنس، يەزدان، يازاد، خالق، تانرى، الله، گوت، خوداھە و ...ھەندى. لى ئەز باور ناكم كو تو جفاك ئان ژى نهتهوه بكاربە مینا باورى و چاندە مه ئىزدى (كورد – ئەزدەھى) يان پەيقا خودى د ناھ زارگۇتنا خوه د بكاربىين. ژ بۇنا ميناكان، ئەزىز نە ديسا گورىيىا دەرفەتىن كەسايەتىيىا

خوه ھەنك ھەڤۆك (جوملەيىن) كو پەيقا خودى تىيەدە تىيەن ئان ژى ھاتنە بكارئانىن ژ وە رېزداران را ب رېز بكم.

بەلى، ژ بۇ فاھمەرن و خواندى ڈېن ھوون ژى د دەوسا نوختان (...) دە نافەكى بكاربىين، ھەر وەها ھەر كەس ل گورىيىا بكارئانىندا خوه، ڈېن د داويا ھەڤۆكى ده ژى نيشانان رېزگرتەن (!)، فەرمان، پرسى و ...ھەندى. دەينە، ميناك:

... ژ خودى نە دترسيما ...
... ھەز ژ خودى نە دترسيما ما!
... ژ خودى نە دترسيما ...
... بەرخى خودى يە
... بەلا خوه ژ خودى بقىنى
... ب وى خوددا يى ب شرىك كم
... ژ خودايى دلۇقان دخوازم
... خوه ژ خودايى خوه ناكى
... ژ خودى ترسم
... ب قەدرى خودى بکى
... ئى چەوا ھەرە ھوزۇرا خودى
باورىيا ... ب خودى ھەنبە
بىن قەھەدتا خودى
بىن حوكىمى خودى پەل ژى ل سەر دارى نا ھەزە
ب دەستورا خودى
ب حەلالىا خودى
ب ئىزىزنا خودى
ب نافى خودى
ب نافى خودى سوند دخوم
ب سايىا خودى
ب خاترى خودى ك ...
ب خودى
بىدە خاترى خودى
بلا نورا خودى ل سەر ... بە
بلا خودى رەحما خوه پاشىزە دلى ...
دان و ستابىندا خودى خوهشە
دەرھوين دۈزمنى خودى يە
دەستىن خوه ژ خودى نەكىن
دەولەت سەرى خودى و سەرى ...

ژ فر و ههتا با مala خوددى
 ژ خوددى دلوڤان هييى دكم
 ژ خوددى ناترس ...
 ژ خوددى تەعالا بترس ...
 كى بۇ خوددى بە، خوددى ژى بۇ وانه
 كىزىان خىير بە بلا خوددى وي بکە
 كو خوددى بېرى ئەرى
 كولا خوددى بکەفە مala پاشقەروويا
 ل ژۆر خوددى ھەيە
 ل رىپا خوددى نەبن خەرفى
 مala خوددى ئافا
 مەرڭ كەركە ياخوددى بېرى
 مېچان مېچانى خوددى يە
 ملياکەت فروارا خوددى ب جە تىنن
 ملياکەت ژ نوررا خوددى هاتنه ئەفراندىن
 مرادى خود ژ خوددى بخوازە
 موبەكتا خوددى گەلەكى شرينى
 ناب خوددى ئەز ...
 نوررا خوددى ل وە ببارە
 پەپوكا خوددى
 پەسىنى خوددى بدن
 قەنجى و خرافى ھەردۇو ژى ژ دەرگى خوددى تىن
 قەنجىا خوددى ئىنكار نەكە
 قەولى خوددى
 قرار قرارا خوددى يە
 رەحما خوددى ل دى و باشى ... بە
 راستى مala خوددى يە
 رەبەنى خوددى
 رەبەنى خوددى ...
 رزقى ... ل خوددى يە
 رۆز نوررا خوددى يە
 رۆزا خوددى دايىنا ... پىرۆز بە
 رۆزىن خوددى گەلەكەن
 شەكر ژ خوددى رە
 شەكرىا خود ژ خوددى بکە
 سلافا خوددى ل ... بە

د رىيا خوددى دە ب ...
 دلوڤانيا خوددى
 دنيا ژ پىغەمبەرین خوددى رە نەما
 دېنى خوددى ل ھەۋ بىنە
 دیوانا خوددى
 دوعا بۇ خوددى
 ئەگەر خوددى يار بە، بلا شور دار بە
 ئەم د كىمن، خوددى يى تەمامە
 عەمرى خوددى خوشە
 عەمرى خوددى يە
 عەقدا ئى خوددى
 ئەز راستىا خوددى مە
 ئىزىدى ب خوددى را ب كورى د پەيىن
 ئىزى ژى نافەكى خوددى يە
 ئىزىدى خوددى پەرسەن
 فەرمائى خوددى
 گازى ب خوددى ب ...
 گازىيا ژ خوددى نەك ...
 گازىيا خود بگەھىنە خوددى
 ھاوارا خوددى
 حەباندى خوددى
 حەق نافى خوددى يە
 ھەر ژ خوددى و چقاس خاسىئن خوددى ھەنە باودر بىن
 ھەر تەنلى خوددى ھەيە
 ھەر تەنلى خوددى ل بىرا خوه بىين
 ھەر تشت ژ خوددى قە عەيانە
 ھەر خوددى تەنلى زانە
 ھەرى خوددى ... ھشتۇ
 ھەى خوددى ... كشتۇ
 ھەى خوددى مالك ئافاکر...
 ھەى خوددى مالك خەرافاکر ...
 حەيایا خوددى
 ھەزار و يەك نافىئن خوددى ھەنە
 ژ بۇ مەزناھيا خوددى
 ژ بۇ نافى خوددى
 ژ عەقدا تى فەشارتن، لى ژ خوددى نايى ۋەشارتن

سtanدنا خوددی يه
 ستارا خوددی ل سهر ... به
 تاوسی مهلهك ئاهینى خوددی يه
 تهسلیمی خوددی د ب ...
 تیرا خوددی ل كەت
 توپا خوددی ل ... كەفه
 تو ب خاتری خوددی كى
 تو عەفدى خوددی نه دىتى يه
 كەس نكاره ڙ قرارا خوددی بىرده
 وئى خوددی چيکە
 ودللهه ناشى خوددی يه
 ودى خوددی روحى ... بستينه
 ودى خوددی يو
 خاس و قەلەندىرىن بو خوددی
 خاسىن خوددی گەلەك
 خىرا خوددی ل ... به
 خەزەخا خوددی ل ... به
 خوددا دزانه
 خوددابى خوه ناس ناك
 خوددابى دلوقان
 خوددی خودانى شەڭ و رۆزى يه
 خوددی ... بى ئاقلى ... نەكە
 خوددی ... روو سې بىكە
 خوددی ... بھىلە
 خوددی ... بپارىزە
 خوددی ... شاش نەكە
 خوددی خودبىكە
 خوددی ... بى شريك و هەفالە
 خوددی بەلا خوه بده ...
 خوددی بەخت بده ...
 خوددی ب ... رە يە
 خوددی ب ئۇغرا ... را به
 خوددی ب تەنى دكاره
 خوددی ب حەبىنى
 خوددی بکە تو گەلەكى ساخ بى

خوددی بکە تو هازار سالى بى
 خوددی برايى ... بھىلە
 خوددی چاقىن ... خودبىكە
 خوددی چىٽ دزانه
 خوددی جىهان سىوراند
 خوددی دا و ستاند
 خوددی دايە تە ...
 خوددی درىيەكى دگە، هەزارى فەدكە
 خوددی عەمرى ... درېز بکە
 خوددی عەمرى ... درېز نەكە
 خوددی ھەقى ... ژ ... نەھىلە
 خوددی حازركىنما مە زىدە بکە
 خوددی هيشتى
 خوددی هيشتۇ
 خوددی حورمەتى بده
 خوددی ئىمانى بده
 خوددی ئىمانى ژ ... بستينه
 خوددی ئىشى ... راست بکە
 خوددی ژ ... رازى به
 خوددی ژ ... ستاندييە
 خوددی ژ ... نا ترسە
 خوددی ژ ... خوش به
 خوددی ژ كەسى نەستىنە
 خوددی ژ نەھەقان را نەھىلە
 خوددی كەردمكە
 خوددی كورەكى بده ...
 خوددی ل ... بخە
 خوددی ل ... شەقا بکە
 خوددی ل ... وەرە رەحەمەن
 خوددی ل بىرا خوه بىنە ...
 خوددی ل ھەفتى و دوو ملەت بىيە رەحەمەن و مە ژى
 خوددی ل ھەۋ ئانى
 خوددی ل ھەۋ نە ئانى
 خوددی ل پشتا ... يە
 خوددی ل راسەرى ... يە
 خوددی مالا ... خراب بکە

خوده‌ی مala ... ئافا بکه
خوده‌ی مala باقی ... ئافا بکه
خوده‌ی مala خراب بکه
خوده‌ی مala نه زان خراب بکه
خوده‌ی مرازی ... بکه
خوده‌ی مه‌زنه ... بکه
خوده‌ی مرادی ... بکه
خوده‌ی مزگینا خیری بده ...
خوده‌ی مزگینی بده
خوده‌ی ناسینا مه ئىزدیان ژ قەدیم هەتا ئیرو ھەیه
خوده‌ی نه ھیشتى
خوده‌ی نه ھیشتۇ
خوده‌ی نه ناس ...
خوده‌ی نەکە گى
خوده‌ی نەکى
خوده‌ی نوره
خوده‌ی پەسنى خوه نه دا
خوده‌ی قەھرا خوه ل ... بکه
خوده‌ی قەبۇل ناكە
خوده‌ی قەبۇل نەکە
خوده‌ی رەحەتىي بده ... د
خوده‌ی رۆزا ... رەشكە
خوده‌ی روحا د د و دستينە
خوده‌ی رووپىي ... سې بکه
خوده‌ی شاده يه
خوده‌ی شاده يه
خوده‌ی سەرى ... نەخىنە بەلايى
خوده‌ی شکرپى بده
خوده‌ی تەممەنلى ... درېز بکه
خوده‌ی تەنلى پى دزانە
خوده‌ی توو بى خاترى ئاۋى خوه
خوده‌ی تو دەردان نەدە ...
خوده‌ی تو ئىشى نەدە ...
خوده‌ی تو روھى ... بستىنى
خوده‌ی وارى ... كۈر بکە

خوددی و که دل ... بکه
خوددی خیرا ... بنشیشه
خوددی خیرا ... قهبوول بکه
خوددی خیرا بکه
خوددی خیری بده ...
خوددی خیرکه
خوددی خراب بکه دهسته‌نگیا دنیایی
خوددی خزمتاتا ... قهبوول بکه
خوددی خودا یه!
خوددی خودانی ظئینس و جنسه
خوددی خودیبین خیران بی پار ناهیله
خوددی یه که
خوددی یه که و ل سه‌رانسری هه‌موو خوددانی یه
خوددی یه کی جهباره
خوددی زانی به
خوددی زارؤکین ... بهیله
خوددی زیده بکه
خوددی یو
خودزلا خیرا مala خوددی را
یا خوددی
یا خوددی بیژن
یا خوددی ههر تو یی و ههر تو یی هه‌یی و ههر دن
یا خوددی ریا ته راستی یه
یا خوددی تو ده‌ری خیرا فهکه، ده‌ری شهرا و درگهمر

ب دیتنا من، د ڦان ههڙوکان ده ڙی خوانی دبه کو ئولپه رستیا مه یا خوهزایی و دلپاچر قههت جوودهٽی ناخه نافا تو جفاک، نژاد و ئولین ل سهر رویی جیهانی هنه و ل سهر فی بنگاهی یه ڦیگا هئری د سه به قههکه قههولی مه ده تی گوتون کو:

سلطان نیزی ب خود په دشایه
همزار و یه ک نافل خود دانایه
نافی مهزن هم ر خود دایه

دناشەرا ئىزدىياتىي و مىتائىي دا

زۆربىي داب ونهريتىن مىتائىي دناش ئولا ئىزدىياندا ماينه و بەھرا پت ژ وان بەر ونيگار ونهخشىن ئىنائىنە دەر ژ دەفەرا (حمدەر) ل خواريا بازارى موسىل، زۆربىي هەر زۆر شۇنوارىن مىتائىيانە و نىزىكى باوەريبا ئىزدىيانە، ژ وان بەلگىن نەگۈر ئەون کو ئىزدى (ش) ناپەرىسن وچەندىن شۇنوارىن وان دناشەرا رۆبارى دىجلە و زنجىرە چىايىن زاگرۇس دا هەنە و دچەسپىنن کو ئەوبۇ ئولا كەفەنە و دبىت بەرى مىتائىي پەيدابوبىت کو ئەوبۇ ئولا كوردان بەرى پەيدابونا بولىمانىي وچەندىن فەكۇلەر هەتا نۆكە ژى هەول د دن کو بنىاتى لكاندىن پەرسىن ئىزدىيان بۇ (ش) ب دروستى بزانىن، بەلى نكارىنە و بۇ خوه نەكرىنە خەم هەما ئىكسەر هاتىنە وئەش نافە پېقە نوسانىدine بى بەلگە و هىچ راستىيەك بەرچاڭ نەكرىنە و هندەك ژ وان وەسا بۇ دچن کو (ش) (ئەھرىيمەن) ئىكىن، ئەفە ژى ززادەشتىي و ھېرۋە دياربوييە، و هندەك وەسا هزر دكەن کو لكاندىن قى پەرسىنلى سەر دەمى ئىسلامى و ھېرۋە پەيدابوييە، بەلى وەک ديار (ئەھرىيمەن) بەرى ززادەشتىي ل ئيرانى هاتىيە پەرسىن و ئولا وان ياسەرەكى بۇوەتە هاتى ئىسلامى بۇ دەفەرى.



فەھمى بابى رۇزانى

ئىدى، ئەز ھە دازىم کا ئەپەيىشا خودىيە ھى د كودەرن دن دە و ب كىزان رەنگى تى بكارئانىن. ھېقىدارم كو قەولبىز، كۆچەك، مجىور، باڭ، علمدار، رەوشەنپىر، زانە، بەرسىيارىن تى، رۆزنانام، كۇفاران، دەزگەھ، ئىنىستىتىوت، مالپەر و رېخستنېن كوردى/ ئىزدىياتىي ژى بكارىن يېن ل جەم خوه ھەنە ژى ب سەر قى خزنا فەرەنگا كوردى فە زىدە بىن. ئەم تەفەدە ھېزى گەلەكى زاحمەت دېنە خوه قان سەددەمەن ناكۆكى، كىماسى، نەزانى، بەلەنگازى و پرسگەرىكىن کو د ناشا جەفاك و ئۆلەن كوردى دە ھەنە، ژ مە ھەمەلاتى و نشىمانپەروەرىن كوردىستانى را زەلال بىن.

ھەر وەھا ھەر يەكى ژ مە ل گۇرپا دەرفەتىن خوه ژ قان كىماسىيەن کو خوهفرۇش و داگىر كەرىن كوردىستانى ب ھەمد و ب زىلا ئاسىملەكىندا خوه، خستنە ناش جەفاك، چاندە، پەرەردە، رامان، نىرین و باوەريا كوردان رە خودى دەركەفن.

ئىدەر:

*¹ Kemal Tolan - <http://www.pen-kurd.org/kurdi/kemal-tolan/baweriya-ezdiyan-bi-xweda.html>
*² Kemal Tolan -Nasandina Kevneşopêن Èzdiyatîyê، Weşanên Perî- Çileyêpêşin ٢٠٠٦ Stenbol، rûpel : ١٥-٣٨.

: ئەفگۇتارە ب پېتىن لاتىنىي هاتىيە نېسىن، سەرنقىسىكار فەگوهاستىيە تېبىنى

هەفبەندى دنافىبەر ئىزىدىاتىي و مىتارائىي دا

ل دەمىن فۇاد سەفەر فەكۆلەر ئىشۇنوارا ل (حەدەر) دوو وىنىن كەفن ل وى دەرى دىتىن وەسا دەھاتە زانىن كو ئىك ژ وان وىنى خوداوهندى (ميتارا) خوداوهندى رۆزى. (وەكى دىيار رۆز قىبىلگەها ئىزىدىانە و وەك جەفەنگى ئىرانى و ھېمابىن رۇناھىي خىر و خوشىي دئىتە ناسىن ل جەم وان، و ژبلى رۇناھىي گەرمى دەدت و زىيدەر ئىرانا ھەمى گيانوھەركى يە و ئىزىدى ل دەمىن پەرسىانا خود دەكەن بۇ خودى بەرى خود دەنە رۆزى وب نور و رۇناھىا خودى دناسن و خاسەكى وان ھەمە بناقى (شىشمس) و جارنان ئەۋزى دې نافەك ژ نافىن خودى، نۆكە ژى ھېمابىن رۆزى و مىتارائىي ل پەرسىگەلا لالش ماينە و رى و رەسمىن گايى كۆزى بۇ خوداوهندى رۆزى دئىنە گۈران و گایى دېنە بەر شىشمس و گۇشتى وى دەكەنە سمات و ھەر ئىزىدىك دەپەت ژى بخوت) ئەقە سەبارەت وىنى ئىكى يى ھاتىيە دىتن ل (حەدەر) و وەكھەفيا وى و رۆزى و ئىزىدىاتىي، بەل وىنى دوو ئەزىز دەتكەن وىنى (ئەزىز دەتكەن) يە وەكى ھاتىيە كۆلان و دىتن ژلەي فارسان ۋە داشاھناما وان يَا كەفتدا دىاركىينە كو ئەو ھەردوو نىشانىن مىتارائىانە كەفنه ئۆلا خەلکى (حەدەر) و ئۆلا (مەر) ل وىدەر ئەتىيە پەيرەوكىن و ھەندەك بىنەمايىن وى ھەتا نەدا ئىزىدىاندا ماينە (لىپ گۆتنە ھەندەك برا دەرىن چۈپىنە وىدەر ئىشانىن دى يېن كەفن يېن مللەتى كەفن بىنى وى وەلاتى ئەنەنە و ھەندەك بۇچۇن وەسا دېيىن كو ئىلا خەتاريان دېنیاتدا خەلکى وى دەقەرى نە و ژ بەر شەر و فەرمانان ھاتىيە جەن خود يې نۆكە.

مىتارا كى يە؟

خوداوهنى مەزن مىتارا ژ مەزنە خوداوهندىن دەھاتىنە پەرسىن ژلەي مللەتىن (ھندۇئىرانى) فە ل وەلاتى خود يېن رسەن و ئەو بۇ خوداوهندى وان يى دەكەل خود ھەلدەرتىن ل ھات وچۇن و باركىنى و بەحسى وى دەھاتە كەفنتىن پېرۇزىرىن پەرتوكا كو (ويڭىدا) بو و بناقى (مىتارا) ھاتىيە دېرتوكا (ئاقيستا) دا وەك خوداوهندى رۇناھىي و پارىزەر ئاستىي و دۆمنى دەرەوى وشاشىي. و (ئىزىدى دېيىن دەرەوين دۆمنى خودى يە و شىرى ئاستىي لبەر رۇي برايى ئاخىرەتى بلندكە). و دئاقيستادا ھاتىيە ل دۆر پېرۇزىيا مىتارا كو

تېبىنى: مقا ژپەرتوكا: الیزىدەيە بقايا المترائىي، يا مامۆستا - توفيق وهبى - ھاتىيە وەرگەرن.



جاوا مىتارائى پەيداپۇو ؟

ژ نەنجامى گەھشتىنە چىبا ئۆلدارىن (فورسا) دەكەل ئۆلدارىن باپلىيان پشتى ئىرىيشا (كۆرши) مەزن بۇ سەر بابل ل سالا (٥٣٩) بەرى زايىن ئەو بۇ (فورسا) باودرييا (الزروانىيە) (الزمن) ژ باپلىيان گىرت (وزروان) كىن باب بۇ ھەردوو جىمكىن برا (كتاس) يان (سېپىنتا ماينى) يان گىانى پاكى نەمر و برايى دى (ئەنكر ماينى) ئانكۇ گىانى شهر خواز و كافلەكەر و (سېپىنتا مانى) هاتەنناسىن وەك (ئورمزد) و ژبىر ۋى چەندى خوداوهندى ھەردوو تىپان وەك يەك بۇون دەكەل پەرسىانا سامىييان بۇ ستىران دەكەل ئەفسانەيە سروشتى يان ئىرانى و بى چەندى ھەردوو ئۆللىن (الشماس) و (مىتارا) بونە خوداوهنى دادوھرى و راستى ورۇناھىيَا ناسمانى و ئەون سەركەفتىن و پىشىكەفتىن د دەنە جەنگاوهەران و چەكداران و پادشاھيان دپارىزىن، پشتى ھنگى (مەجوسا) كو ئاگەر دېرسن رابۇون ئۆلا خود بەلافكەن (ئۆلا زەرۋانىي) و د وەلاتى دنافىبەر ھەردوو رۇباران دا (بلا د النھرين) يان مىسىۋپۇتامىا و دناف كوردىن چىايىان دا ئەھۋىن بەرى ل سەر ئۆلا (ھندۇئىرانى) يان بەرى و پشتى ھنگى بەرى خود دان رۆزئىفا و پەرسىگەھىن خود ل نافەراستا چەرخى پېنچى بەرى زايىنى ئاڭاكرن ل ئاسىيا بچۇك و ئۆلا خود تىدا پەيرەو و بەلاڭ دەرن.

ئىزدى و نه ئىزدى لى دېزىن بەھىن چىكىن، ژ بەر كۆ هژمارەكە مەزن يا مەزار و نىشانگەھە شۇنوارىن ئۆلى يېن ئىزدىيان ل گوندىن بولىمانان و ھەر وسا مەسىحيان ژى ھەنە و ئىزدى لى نازىن، ئانکو بەرئ گوندىن وان بۇونە، ل ۋەر يا گرنگ نېيسىكارىن مە دەرھەقا خاسىن خوه بنېسىن و ل دەستپېيکى ژ ئىزدىيان را دىيار بىن و پاشى ژ خەلکەكى ژى را كول فلان جەھى، فلان خاسى ئىزدىيان ھەيە و ھۆسا، ھېفيدارم كەسانىن تايىھەتمەند ل سەر ۋى باھەتى كار بىن و ئەڭ گۇتار ژى بېتە دەستپېيکەكە گەلەك كارىن دن يېن ژ فى جۆرى.

جوگرافىيەتا مەزارى مەحەما رەشان

مەزارى مەحەما رەشان دكەفتە كوردىستان ئيراقى، پارىزگەھا موسىل، قەزا شىخان، قونتارا چىايى مەقلوبى شىخا، دكەفتە رەخى دنابىھرا باشدور و رۆزئافا يالا قەزا شىخان دا، ھەتتا مرۆڤ ژ قەزا شىخان دكەھتە جەم مەزارى ئىزىكى ۲۰ دەقىقانە ب ترومېلى، چەند گوندك دەردۈرىن فى مەزارى ھەنە و ئەڭ گوند ژى ئىزدى و بولىمان لى دېزىن، ژ وان دەفەرەن ئىزدىيان ژى وەك (مەھەت، بىت نار، جەرowan، مام رەشان، موقبلى و ... ھەتىد)، ل جەم مەزارى ب خوه ژى دوو مال ھەنە كۆ يېن پېرىن مەحەما رەشانن و مەجىورىن مەزارىن.



قوبا مەحەما رەشان:

قوبەكە مەزىنە و ل سەر ئافاھىيەكى مەزن ھاتىيە ئافاکىن و خودى حەوشەكە مەزىنە، بەرئ مەزارى بەر ب باكور و رۆز ئافايم، دنالا ئافاھىيەن قوبى دا سندروكا مەحەما رەشان ھەيە و ل ويىرى ھاتىيە فەشارتن، ل سەر سندروكا وى وەكە يا زۆرىبەيا قوبىن خاس و چاكىن ئىزدىيان تىزى بەرينە كۆ خەلک گىرىدىن و فەدەن (رى و رەسمىن خوهىستنا مرازايە)، دىسان دنافى ئافاھى دا چەندىن زۆرىن بچۈوك ھەنە و ھەموو ل سەر ئەندازەكە كەفن و ب كەفرا ھاتىنە ئافاکىن، بەن ژ سەرفە ب رەنگەكى نۇو ھاتىيە نۇزەنكرن، ئانکو دەمما مرۆڤ ژ دۈرۈفە دېينت وەكە ئافاھىيەك و

مەزارى خودانى بارانى ل قونتارا چىايى مەقلوبى شىخا

"چەند زانىيارىيەك دەرھەق مەزارى مەحەما رەشان"



كۇفان خانكى / زانكۇيا دەھۆك

پېشگۈن:

ئەز داخوازا لى بۇرىنى ژ خودنەۋانان دكم، ژ بەر كۆ ئەڭ بابەتى نەا ل سەر دەنفيسم نە تايىھەتمەندىيىما منه، لى ژ بەر كۆ ئەز دېبىن مەزارىن ئىزدىيان گەلەك دىن گرنگىدان و ژ بال نېيسىكارىن ئىزدى و ھەرسا نە ئىزدى ۋە ژى گەلەك كېم ل سەر ھاتىيە نېيسىن، ژ بەر ھندى ئەز فى لېكۈلینا كورت دەنفيسم.

دەما كۆ د گەشتەكى دا مە سەرەدانا قونتارا چىايى مەقلوبى شىخان كرى و مە قوبا خاسەكى خوه يى گرنگ دىتى و كېم ل سەر ھاتىيە نېيسىن؛ من ئەڭ گۇتارا "وەسفى يا سادە" نېيسى، ھېفيدارم ئەڭ كار "ئانکو نېيسىن دەرھەق مەزارىن ئىزدىيان ل ھەر جەھەكى كۆ

(رهشی، رهشان) هاتییه ناسکرن. نیشانگه‌ها وی دکه‌فته رهخی دنافبه‌را باشورو و روزنایایی مهزاری مه‌حاما رهشان ده ب دوراتیبا نیزیکی (۵۰-۴۰)م، ئانکو نیشانگه‌ها بابی مه‌حاما پت یه نیزیکی مهزاری مه‌حاما رهشانه ژیا دایکا وی، و دکه‌فته پشتا گرده‌کی کچک، ل جمه نیشانگه‌ها بابی رهشی ژی وکه هنهك کیلگان خویا دکر ب من ودره تربن، ئگه‌ر ترب بن گله‌ک دکه‌فن، چونکی ب عمردی فه راست بوبونه، تمنی کیلک دیار مانه.

۳. نیشانگه‌ها شیخادی: نیشانگه‌ها شیخادی ژی ل جمه مهزاری مه‌حاما رهشان ههیه، ئهـ نیشانگه‌ه ب رهخ نیشانگه‌ها دایکا چاک فهیه ب دوراتیبا (۱۰)م، کچترین نیشانگه‌هه ل جمه فی مهزاری، دنافا قی نیشانگه‌ها کچک ده جهی هلکرنا ئاگر ههیه.

۴. نیشانگه‌ها پیری جهرو: ئهـ نیشانگه‌هه ب رهخ نیشانگه‌ها شیخادی فهیه ب (۴-۲)م، ئانکو ئهـ ژی ل بهر مهزاری دایکا چاکه. ئهـ نیشانگه‌ه ژی نیشانگه‌ها دایکا چاک کچکتر بوبو، لی ژ نیشانگه‌ها شیخادی مهزنتر بوبو، دنافا قی نیشانگه‌هی ژی دا وکه تهـ نیشانگه‌هین ئیزدیان جهی هلکرنا ئاگر لی ههیه. وک تی زانین کو پیری جهروا بنهماله‌که پیره ژ وان ههـ چل بنهمالین جینا پیران دنافا ئیزدیان ده.

۵. نیشانگه‌ها کتکا (خودافنه‌ندی کتکا): ئهـ نیشانگه‌ه ب رهخ نیشانگه‌ها بابی رهشی فهیه ب دوراتیبا (۵-۴)م، ول سهـ گرده‌کی کچکه، ل بهر قی نیشانگه‌هی هزماره‌کا تربین کهـفاره خویا دکت (ئانکو ههـ تربین ل بهر نیشانگه‌ها بابی رهشی نه).

۶. نیشانگه‌ها شیخوبه‌کری قاتانی: ئهـ نیشانگه‌هه دکه‌فته پیشیما مهزاری مه‌حاما رهشان، ئانکو دکه‌فته ئالیبی باکوری مهزاری ب دوراتیبا نیزیکی (۵۰-۳۰)م، و نهـ ماله‌کا مهـزن ل وپری هاتییه ئافاکرـن و نیشانگه‌ها شیخوبه‌کر دکهـفته دنیـقـهـ کا حـوـشـاـ وـانـ دـاـ، وـكـ تـيـ زـانـينـ شـیـخـوبـهـ کـرـ خـاـسـهـ کـیـ ئـیـزـدـیـاتـیـیـ بـوـ وـ نـاـ وـ دـنـگـیـ وـ دـئـیـزـدـیـاتـیـیـ دـاـ گـهـلـهـ کـیـ دـیـارـهـ وـ هـهـرـوـسـاـ قـهـوـلـیـنـ پـیـرـۆـزـ ژـیـ بـ نـاـفـیـ وـیـ هـهـنـهـ.

۷. کانییا ئافی: ئهـ کـانـیـیـهـ کـهـ پـیـرـۆـزـ وـ دـنـاـفـ ژـوـرـدـکـاـ ئـاـفـاهـیـیـ مـهـزارـیـ مـهـحـاماـ رـهـشـانـ دـهـیـهـ، وـ گـوـتـنـنـیـنـ مـجـیـوـرـ بـهـرـیـ ئـهـ کـانـیـیـهـ کـهـلـهـ کـیـ پـیـرـۆـزـ ژـیـ بـ نـاـفـیـ وـیـ هـهـنـهـ. یـهـ کـیـمـ بـوـ وـ ئـهـگـهـ نـهـ بـ مـاـتـؤـرـیـ کـارـبـیـ بـتـ ئـاـفـ ژـیـ نـاـهـیـتـهـ دـهـ.

مـهـزارـهـکـیـ نـوـ خـوـیـاـ دـکـتـ، لـ چـاخـیـ مـرـوـفـ دـجـتـهـ دـنـاـفـ دـاـ کـهـفـنـارـیـ وـ سـهـهـوـاـ مـهـزارـیـنـ ئـیـزـدـیـانـ دـتـ. هـهـرـوـسـاـ دـنـاـفـ ژـوـرـانـ دـاـ جـهـیـ هـلـکـرـنـاـ جـرـایـانـ هـهـیـهـ کـوـ هـهـرـ یـهـکـ یـاـ خـاسـ وـ چـاـکـهـکـیـ ئـیـزـدـیـانـهـ.

نیشانگه‌هین ل دهـدـوـرـ وـ نـاـفـ قـوـبـاـ مـهـحـاماـ رـهـشـانـ: بـهـرـیـ کـوـ مـرـوـفـ بـکـهـفـتـهـ دـنـاـفـاـ حـوـشـاـ قـوـبـاـ مـهـحـاماـ رـهـشـانـ دـهـ، لـ دـهـدـوـرـ چـهـنـدـنـیـنـ نـیـشـانـگـهـهـینـ دـنـ یـیـنـ خـاسـ وـ چـاـکـیـنـ ئـیـزـدـیـانـ هـهـنـهـ، ژـ وـانـ:

۱. نیشانگه‌ها دایکا چاک: لـ دـهـسـتـپـیـکـیـ پـیـلـفـیـ یـهـ بـدـنـ زـانـینـ کـوـ (دـایـکـاـ چـاـکـ) نـافـیـ دـایـکـاـ مـهـحـاماـ رـهـشـانـهـ، دـایـکـهـکـاـ باـشـ وـ دـیـنـدار~ و~ ل~ رـبـیـا~ دـیـنـی~ خـوـه~ بـوـو~، دـایـکـا~ چـاـک~ ژـی~ نـاسـنـافـه~، ژـ بـوـ فـی~ ژـنـکـا~ بـ روـومـهـت~ یـا~ ئـیـزـدـی~ هـاتـیـیـه~ گـوـتـن~ کـو~ ئـهـو~ ب~ خـوـه~ نـاـفـی~ وـی~ یـی~ دـورـسـت~ (گـولـبـوـهـارـ)، ئـهـ نـاسـنـافـه~ ژـی~ ئـانـکـو~ (دـایـکـا~ چـاـک~) شـیـخـادـی~ لـنـ کـرـیـیـه~، ژـ بـهـر~ کـو~ دـهـم~ شـیـخـادـی~ ژـ شـامـی~ هـاتـی~، گـولـبـوـهـار~ پـیـحـسـیـیـا~ کـو~ خـوـدـان~ کـهـرـمـهـکـی~ ئـیـزـدـیـان~ وـی~ بـرـیـقـهـی~ و~ وـی~ دـهـیـت~، لـهـوـم~ تـرـاـهـکـی~ ئـافـی~ دـانـا~ سـهـ دـهـسـتـی~ خـوـه~ و~ چـو~ پـیـشـیـیـا~ شـیـخـادـی~ و~ ئـاـفـ ژـیـرـه~ بـر~، لـهـوـم~ شـیـخـادـی~ ژـی~ گـوـتـی~: وـدـلـلـه~ تو~ دـایـکـه~کـا~ چـاـک~، لـهـوـم~ ژـی~ هـتـا~ نـهـا~ کـمـس~ نـابـیـزـت~ گـولـبـوـهـار~، بـهـلـکـو~ هـمـو~ دـبـیـزـن~ دـایـکـا~ چـاـک~، و~ نـزـانـم~ ژـی~ حـهـتـا~ ج~ حـهـد~ خـهـلـک~ فـی~ نـاـفـی~ دـزـانـت~؟~ چـهـنـکـو~ دـهـم~ مـجـیـوـر~ ژ~ مـن~ رـه~ دـنـاـخـقـی~ و~ بـاـسـی~ مـهـحـاما~ رـهـشـان~ دـکـر~، دـهـم~ گـهـهـشـتـه~ فـی~ زـانـیـارـیـی~، گـوـتـه~ مـن~: "تـهـسـجـیـلـی~ بـتـهـمـرـیـنـهـ"~ و~ پـاشـی~ ژ~ نـوـ گـوـت~ نـاـفـی~ دـایـکـا~ چـاـک~، گـوـل~ بـوـهـار~ بـوـو~.

نیشانگه‌ها دایکا چاک دکهـفـتـهـ رـهـخـیـ باـشـوـرـیـ مـهـزارـیـ مـهـحـاما~ رـهـشـان~ ب~ دورـاتـیـبا~ ئـیـزـیـکـی~ (۲۰۰)م، ئـانـکـو~ کـیـمـت~ ژ~ پـیـنـج~ دـهـقـیـقـاـن~ مـرـوـف~ دـکـارـت~ ب~ لـنـگـان~ ژ~ جـمـه~ مـهـزارـی~ مـهـحـاما~ رـهـشـان~ بـگـهـهـتـه~ جـمـه~ نـیـشـانـگـهـهـ دـایـکـا~ چـاـک~، ئـهـ نـیـشـانـگـهـهـ وـکـه~ ژـوـرـهـ کـچـک~ خـوـیـا~ دـکـت~ و~ ل~ دـوـرـا~ وـی~ شـورـهـهـ کـچـک~ یـا~ کـهـفـرـان~ هـهـیـه~، ل~ سـمـر~ نـیـشـانـگـهـهـ دـایـکـا~ چـاـک~ قـوـبـهـکـه~ کـچـک~ ژـی~ هـهـیـه~ کـو~ یـه~ ب~ هـهـلـیـل~ و~ پـهـرـی~ یـه~، پـشـتـی~ مـن~ بـهـرـی~ خـوـه~ دـایـه~ هـوـنـدـورـی~ فـی~ نـیـشـانـگـهـهـی~ مـن~ ج~ تـیـدا~ نـهـدـیـت~، تـمـنـی~ ل~ دـهـدـوـر~ نـیـشـانـگـهـهـی~ هـنـهـک~ کـهـلـهـ کـهـفـنـارـه~ و~ هـهـرـوـسـا~ یـیـن~ نـوـ ژـی~ خـوـیـا~ دـکـرـنـ.

۲. نیشانگه‌ها بـابـیـ رـهـشـیـ: بـابـیـ رـهـشـیـ بـابـیـ مـهـحـاما~ یـه~، وـ ئـهـم~ نـزـانـنـ رـهـشـیـ ب~ دـورـسـتـی~ نـاـفـی~ وـی~ بـوـوـیـه~، یـان~ ژ~ی~ نـاسـنـافـه~، لـ وـسـا~ هـاتـیـیـه~ نـاـفـکـرـن~ و~ کـورـی~ وـی~ مـهـحـاما~ ژ~ی~ ب~ بـابـی~ خـوـه~

ج. سه‌ردهانین جفاکی: رۆزانه ب دهان خیزانین ئىزدى و بوسلمان ژی دهیتە بەر مەزارى مەحا رەشان و دوعایان ژ خورە ل بەر دکن و هيقى و مرازان دخوازن، ئەف سه‌ردهانین جفاکی يېن خەلکى ژ بۇ چەند مەبەستەكانه و ژ وان:

١. ب مەرەما باران بارىنى: خەلکەكى زۆر ب فى مەرەمى قەستا بەر فى مەزارى دکن ب تابىتە سالا كو باران كىم باران يان ژى هەما نەباران، لو چاخى خەلک دەھىت و هيقى و دوعایان دکن و خود د ھافىزەنە مەحاما رەشان دا كو ژ كەرەما خودى بارانى بارىنت، وەكە تى زانىن كو مەحاما رەشان د ناڭ ئىزدىيان دا ب خودانى بارانى دەھىتە ناسكىن.
٢. ب مەرەما چارەسەرىپى: گەلەك مروقان ئىشىن جۇرا و جۇرەبوونە و هندى سه‌ردهانا دكتۇران كرنە و چارەسەرىپى ژ ئىشىن وان رە نەھاتىيە دىتن، لەوما ژى گەلەك ژ فى خەلکى سه‌ردهانا بەر فى مەزارى دکن و داخوازى ژ خودى و مەحاما رەشان دکن كو رەحمەكى ب وان بىن و چارەسەرىپەكى ژ ئىشىن وان رە بېبىت.
٣. ب مەرەما زارۆكان: ئەگەر كور و كەچەك زەوجى بن و بۇ ماۋەيى چەند سالەكان زارۆك نەبن، قەستا بەر فى مەزارى دکن و هيقىيان ژ خودى و مەحاما رەشان دخوازن كو زارۆك ژ وان رە پەيدا بىن.
٤. ب مەرەما زەواجى: گەلەك جاران كەچك قەستا فى مەزارى دکن دا كو رزقى وان فە دېت و ژ خود رە بزەوجن و خیزانەكى پىك بىنن، و جەھكى تابىت ژ بۇ فى مەبەستى ھەيدە بېزنى؛ دەرگەھى مرازان.

ئەو كەسىن ژ بۇ ۋان مەرەما قەستا بەر فى مەزارى دکن نە تەنلى ئىزدىينە، بەلكو ب رېزىيەكە مەزن بوسلمان ژى دەھىتە بەر و هيقى و دوعایان ل بەر فى مەزارى ئىزدىيان دکن و خىرا خود دئىنە بەر، و دەمما ئەز چۆيمە بەر فى مەزارى و من ل سەر دنفىسى، خیزانەكا كوردىن بوسلمان ژى ھاتبو و كىلوپەكى چىلىتائىنى بۇو و گۆتە مەجيورى مەزارى ئەھقە خىرا مە يە ژ بۇ مەزارى مەحاما رەشان، پاشى كو من پرسىيارا مەجيور كرى كا ئايا بوسلمان ژى دەھىتە بەر؟ گۆت: ب رېزىيەكە گەلەك مەزن بوسلمان دەھىن و باۋەرىي ژى بىن دەھىن و وەكە ئىزدىيان ئەو ژى خىرا خود تىنن و هەر وسا پى سوند ژى دخون، و بارا پتر يا وان ژى كوردن ژ ئىلا گۆرانا، وەكە مەجيورى ئى مەزارى دىار كرى كو وان ژى ب ئەشكەردىي هەنر و كەرامەتا فى خاسى ئىزدىيان دىتى يە.

رى و رسميىن ل بەر فى مەزارى دەھىنە گىران:

بى گومان ل بەر هەر قوبەكى ئىزدىيان يان هەر جەھەكى ئىزدىيان بى ئۆلى رى و رسم و هەلکەفتىن جۇرا و جۇر دەھىنە گىران و هەنەك ژ وان ژى د وەكە ھەفن، لى دگەل ھندى ژى هەر يەكى هەنەك تشتىن جودا ژى ل بەر دەھىنە كىران، مەزارى مەحاما رەشان ژى يەك ژ وان كۆمەكى رى و رسمان ل بەر دەھىنە ئەنجمادان و ئەفە ژى هەنەك ژ وان:

- أ. سەقەرا ماستا: د وەرزى بوهارى دا ئىزدى ز زۇربەيا گۈندىن ئىزدىيان نان و ماستى خود دئىنە بەر مەزارى مەحاما رەشان، وەك تى زانىن ئەف رى و رسمما سەقەرا ماستا، رى و رسمەكە گىنگە كول پەرسىگەها پېرۇز يالاش دەھىتە گىران كو ھەممۇ ئىزدى نان و ماستى خود سالانە دېنە بەر لالشا نورانى، قايدە تىنن بەر مەحاما رەشان ژى.
- ب. ھلکرنا چراپان (فتىلان): وەكە گشت خاس و مەزار و نىشانگەھىن پېرۇزىن ئىزدىيان، ل بەر مەحاما رەشان ژى ھەزمارەكى نىشانگەھىن خاسىن پېرۇز يېن ئىزدىيان ھەنە و مەجيور ل هيشارىن چارشم و ئىنپىيان چرا ل بەر ۋان نىشانگەھان ھەنە دەكت، و بۇ زانىن (٤٤) نىشانگەھ ل بەر فى مەزارى ھەنە و ژ وان (٤٤) نىشانگەھان مەجيور تەنلى ئەنلى ھەنەكان دزانت:

١. مەحاما رەشان
٢. شىخادى
٣. مەلک فەخرەددىن
٤. خەرالىپاس و خدر نەبى
٥. ناسىرىدىن
٦. شىيخ و بەگر
٧. بابى رەش
٨. دايىكا چاك
٩. پېرى جەرۇوا
١٠. خاتۇنا فەخران
١١. بەردى فەقىرا
١٢. كىتا

مخابىن يېن دن ناھىئە زانىن. ھەرسا چاخى مەجيور فتىلان ل بەر نىشانگەھىن ۋان خاس و چاڭان ھلەكت، تاوا بخورى د پېشىيى دايە وەكە رى و رسميىن ھلکرنا فتىلان ل پەرسىگەھا پېرۇزا لالش.

مەھمەد رەشا وى ل بنە
کەرەما شىخ حەسەنە

قۇبا دىيارى كافى
خەبىر بن ل وى ناڤى
خاسا مير ناسىن سەرى رابى

قۇبا دىيارى پېرى
خەبىر بن ل وى سورى
خاسا مير ناسىن ل سەرى دورى

من دىت ب چاقانە
و تە دىت ب چاقانە
لەشكەرى شىخ گرانە
سەردار مەھمەد رەشانە

من ب چاقا دىيە
و تە ب چاقان دىيە
لىشکەرى شىخى عەدىيە

ھەممەدى يالا ھەمىدى
بازىپۇ مەكەن كى دى
شىخادىيە مە ل خەولى دى

پىرەكى نورىنە
راستارى سلتىنە
مەھمەد رەشان كە پېرى مەلك سجادىنە

ئىندرە:

۱. دىداردەك دەگەل مەجىورى مەزارى، ھافپىنا .۲۰۱۰

۲. بەمدەن فەقىر حەجى: مىتۈلۆزى و باوەرييا ئىزىدیان، دەھوك .۲۰۰۲

۳. د. خەليل جندى: پەرن ژ شەھدىپى دينى ئىزىدیان، بەرگى ئىتكى، دەزگەھا سېرىيىز، بـ ۲۹، ژ ھەولى شىخادىيە و مىرا.

ئەڭ مەبەستىن مە دىياركىن، چەندەكىن ژ وان مەبەستان يىن خەلک ب مەردەما وان قەستا
بەر ۋى مەزارى دكىن.

رۇنى مە حەما رەشان دنافا تەكستىن بېرۇز يىن ئىزىدیان دا:

وەك تى زانىن مە حەما رەشان خاسەكى گرنگ يى ئىزىدیاتىيى يە و وەكە خوداھەندى بارانى
دنافا ئىزىدیان دا دەھىتە ناسكىن، لەوران ژى نىشانگەھىن وى ل چەندىن جەھىن ئىزىدیان ھەنە
و چەند سەرھاتى يىن وى ژى دنافا ئىزىدیان دا بەلاغبۇونە، ھەر وسا جەھەكى تايىبەت ل جەم
شىخادى ھەبوبىيە، لەورا ژى ناڤى وى دنافا گەلەك تەكستان ژى دا ھاتىيە و ب تايىبەتى قەولى
(شىخادى و مىرا) كۆچەندىن جاران ناڤى وى دەھىت كۆ مرىدەكى گرنگ يى شىخادى بوبوبى
كۆ د سەبەقەكە فە قەولى ناڤىرى دا ھاتىيە:

ئەز مەھمەدى رەشى مە

سوارى بەرى مە

مرىدە شىخى ئادى مە

دەقى سەبەقا قەولى دا دىيار دېت كۆ مە حەما رەشان ژى خودان ھېز و كەرامەت بوبو و تشتىن
كىم وىنە ئەنجامدايىنە، ب تايىبەتى ژى ل بەر چاقىن ھەندەك زانىيەن سەرەتەم خود يىن نە
ئىزىدى كۆ ھاتىنە جەنگى شىخادى ب كەرامەتى، لەوما قەولقان (پىسى جەمى) د قەولى
(شىخادى و مىرا) دا دېئىت:

مېر ژ مەھمەد رەشا خورجلەن
رابۇون تىلەك زەنزاڭلىن
دەرى مغارى فە وەسلەن

قەسىدەكە تايىبەت ژى ب ناڤى مە حەما رەشان ھاتىيە گۇتن، لى ئەم نزانن كى پى گۇتى يە:

ئەو بايى پېر ئەبوبى
ھەشىرۇپۇ يى ژ مەقلوبى
حۆكمى تە وى ل تخوبى

مەقلوبى عىلەيە
وى ل بن دا بەحرە سېبىيە
رەشە شىخادىيە

مەقلوبى مەزنە

هەلبەت دەمى سلتان ئىزى نىزىارا خەرقە كرى ژ دورى پەيدا كر و هنارتە عەردى سپاردا
خاسىن خودى، هەر وەكى دوو سەبەقىن قەمۇنى شىخوبەكى دا هاتى:

دۇر ژ كەلەما پەدشى يە
خەرقە دەركەفتى ژى يە
دایم میرا سلاقتى يە

ژ دورى دەركەفت خەرقە

پې زەينى شامە هەتا ب شەرقە

شىخادى دەنك ل شىخوبەكى كر، گۆت، ھلۇ خەرقە ل بەركە^۱

خەرقە ئەلو لېسى (كراستى پىروز) ل جەم ئىزىدىان، لېسى خودى يە، دەقى سەبەقا قەمۇنى دا ژ
قەمۇنى خەرقە هاتىيە:

بەرئى دنیا نەبو

ۋى رۈزى خەرقە ھەمبۇ

خەرقە لېسى خودى ب خۇمبۇ^۲

دېسان دەسەبەقەكا قەمۇنى ناشى موحىبەتى دېبىز:

ھەي كورو يى كورە

ما تو نزانى زەركۈز مۇرە

دەرجا خەرقە كە دەرچەكە ل ژۇرە

ئەلو لېسى ئىزى يى منى سورە

يان ھندەك ۋى سەبەقى ب ۋى رەنگى ل خوارى دېبىز:

ھەي كورو يى كورە

دەرجا خەرقەنى سلتان شىخادى وا ل دەرچەكە ژۇرە

ئەلو لېسانى ئىزى يى منى سورە

د مىتىلوجيا ئىزىدىاندا ئىزى نافەكە ژ نافى خودى و دەقى سەبەقا قەولىدا خويما دېت:

سلتان ئىزى ب خوه پەدشايە

ھەزار ئىتىك ناڭل خوه دانايە

ناڭى مەزن ھەر خودايە

خەرقە ئەلو لېسى كو نابت ئىزىدى دەست بىكەنلى و ل دەمى لى تواف دىن تەنلى سەر دەتەوين

لېھر و زيارەتى دىن، دېسان دئىزدىياتىيەدا سى تشت گەلەك د گونەن كەسى ئىزىدى سەر

^۱ ژ قەمۇنى شىخوبەكى، د. خليل جندى: پەرن ژ ئەددەپىن دىنى ئىزىدىان، دەھۆك، ۲۰۰۰، بەرگى، ۱، بـ ۹۳۹.

^۲ ژ قەمۇنى خەرقە، بەدل فەقىر حەجج، باورى و مىتىلوجيا ئىزىدىان، دەھۆك، ۲۰۰۰، بـ ۳۲۲، بـ ۳۲۳.

ژ قەمۇنى ناشى موحىبەت، عزىز الدین سليم باقەسرى، مەركەھ، دەھۆك، ۲۰۰۲، بـ ۳۷۵.

ئىزىدىاتى، وانه بۇ قوتاپىتىن ئىزىدىان، پولا نىيكتى سەرەتتايى.

خەرقە پىرۆزى، سوند و باوهرى دئىزدىياتىي دا



مەروان شىخ حسن روشكانى

مرۆقى خەرقە پۇش ژ شىيخ، پира و مريدان دەقىيت يى دەرۋىش بت و خوه ژ خوهشى و
لەقزەتا دىنلەپى دور بىت، هەر وەكى دەقى سەبەقا قەمۇنى سەبەيەكە ژ بىن عەددەپى دا هاتى:

لەقزە دەرۋىش د حوربىن دېوکر

د روسبى بن بناڭ و دكىر

دەرۋىش عەول خەرقە سپارتە شىخوبەكى^۱

ھەر دېسان دەقەمۇنى ئاخىرتى دا تەكەزى ل سەر ۋى چەندى دكت:

فەقىرا ئىتكە چېكىر

خوه ژ خوهشى و لەقزەتىن دەن كر

ئەم دىنلەپى هىللان و بەر ب ئاخىرتى كر^۲

^۱ ژ قەمۇنى سەبەيەكە ژ بىت عەددەپى، د. خليل جندى: پەرن ژ ئەددەپىن دىنى ئىزىدىان، دەھۆك، ۲۰۰۰، بەرگى، ۲، بـ ۵۷۷.

^۲ ژ قەمۇنى ئاخىرتى، كۇفان خانلىكى: كارتىكىن ئىزىدىاتىي ل سەر ھەلبەستا جەگەرخوبىن، خوندەنەكە ژ بۇ تەڭ دىوانىن وى،

دەھۆك، ۲۰۰۹، بـ ۱۰۰.

پشتی وئی هریئ پاش دشون و پاقز و بژون دبت و پاشان ئهوى هریئ د دنه دهستى قىزەكا بوكر (نهزهوجى) و ئەگەر قىزەكا نه زهوجى د وئى مالىدا نەبەت؛ دى دنه قىزەكا جىناران يان گوندىيان ژ بىنەمالەكا قەنچ و ئەو قىز ئهوى هریئ ب تەشىيى درىست هەتا تىرا خەرقە درىست و دېيت ئەو قىز ياب رۆزى بت، هەتا هەريا خەرقە تەواو كت و رۆزىيا وئى ژى بۇ خودانى خەرقەيە، و دەمى تەواو كر دى وئى رىسى ل دارى (تارى) موخەلى كت و دكەنە سلېل ئانکو گولوك و دى دەته خودانى خەرقە، ئەو ژى دى دوعايى ل خلمەتا وئى قىزى كت و داخوازى ژ خودى و خودانى خەرقە كت كو خلمەتا وئى قىزى ب خىر قەبۈل كت.

خودانى خەرقە ئەوى سلىلا (گلوكا) رىسى دەته (جولە) ئەوى خەرقە دراچىنت دېيرىنى؛ جولە و دەست ب دورستكىرنا خەرقە دكت و دېيت جولە هەرو يى ب رۆزى بت هەتا خەرقە تەواو دكت ئەگەر رۆزەك بت و ئەگەر پتىت و پاشان خودانى خەرقە، خەرقە دئىنت مالا خوه و خوه بەرھەڭ دكت ژ بۇ رەشكىرنا خەرقە، يان دى بەته گەلەيى لالشى، يان دى بەته گەلەيى كەرسى ژبۇ موركىنى، ژ بەر جەھەك تايىبەت ھەيە دېيرىنى؛ جەھى كەلا خەرقە و ب پەلىن دارا زەركۆزى خەرقە رەش دكىن ژبەر زەركۆز مورا خەرقەيە، شەفەكى يان پت خەرقە دى دنائى ئافا كەلاندى و پەلىن دارا زەركۆزىدا بت و هەتا رەش دبت^١، ھەلبەت د قەبۈل قەرە فەرقاندا ئەڭ چەندە خويما دكت.

پەدشى من زەركۆز تەفسىل دكەر
نازلى عمردا دكەر

تەسلىمى مەلک فەخرەدين دكەر
مەلک فەخرەدين تەسلىمى خاسىت شىخادى دكەر

خاسىت شىخادى تەسلىمى فەقىرا دكەر
فەقىرا خەرقىت خود بى رەش دكەر
سونەتخانە پى هات بۇ شەھەدە و باوەرە^٢
و ھەلبەت ئافا خەرقە نافدا دكەلەين ژى دېيت ژ ۋىدەرلىكى پىرۆزبەت ئەگەر ل لالشا نورانى بت ئافا دى ياكانىا سې بت و كەلا خەرقە دى ل گاكو ژى بت ئەگەر ل كەرسى بت ئافا دى ياكانىا پىر خايى بت و كەلا خەرقە ل سەرى ياكانىا پىر خايى و ل گەلەن ھارونىي ھەيە.

^١ چاپتەكەفتەنەك دكەل بەریز فەقىر حەسەن فەقىر حسین، ل كۆمەلگەها زۇرئاھىي، خىزاناندا ۲۰۱۰. ژ قەبۈل لاوى بەران، ژ بەلاقەكىرنا شىخ عەلەن خەلەف، كۆفارا لالش، ۋەزارەت، دەھۆك ۲۰۰۶.

پىچى لسەر بكت (تەريقەت، شەرعمەت، دربا خەرقە) نابت كەسى ئىزىدى دەستى خود ل سەر كەسى خەرقە ھلگە راكت و نەو ژى دەمى ئىزىدىكە سەر پىچىيەكى د ئولىدا دكت دېيرىنى؛ هەيى تە دربا خەرقە دايى، ئانكوتە درب ل خەرقە دايى و ئەڭ سەبەقا قەبۈل ژ قەبۈل خەرقە تەكەزى لسەر في چەندى دكت:

خەرقە لبىسى جەبارە
هنجى ھەلېتە سەر خەرقە شىخادى دار
ل ئاخىرتى لېھر شىخادى و مەلک شىخ سن يى كافر و گونەھ كارە^٣
يان ژى دەمى دېت سەبەقا قەبۈل دا ژ قەبۈل لاوى پېرىانو ژ خەرقە خەبەر د دت:
خەرقە لبىسى نورىنە
هنجىي دەستى خود ل بەر فەۋوشىنە
رۆزى ئاخىرتى شەفات و مەھدەر ل وى روحى نىنە^٤

خەرقە ژ ج و چاوا دەھىتە چىتكىن:
ھەلبەت خەرقە ژ هەريا پەزى (مېيىن ، مەھى) دەھىتە چىتكىن ئەڭ سەبەقىن قەبۈل ژ قەل قەرە
فەرقان تەكەزى ل سەر في چەندى دكن:

وھ دېيىزت پەدشايى منى نورانى يە
مېشە و زەركۆزە و مى يە
ھېقىتى ھەرسى كا ژ ياكانىا سېپى يە

پەدشا دېيىزت فەخرو نافا مەن و زەركۆزى دى چىكەم خەرقەمە
فەقىر دى كەنە بەر خۇمە
سونەتخانە دى پى ئىنەت باورى و شەھەدە^٥

يان ھەندەك ۋان سەبەقان ب فى رەنگى ل خوارى دېيىزت:
وھ دېيىزت پەدشايى منى نورانى يە
دە خوقىقىنە سى تىشىن قىيمەتى يە
مېشە و زەركۆزە و مى يە
ھېقىتى ھەرسى كا ژ ياكانىا سېپى يە^٦

^٣ ژ قەبۈل خەرقە، بەدل فەقىر حەجى، ۋىزەدرى بەرلى.
^٤ ژ قەبۈل لاوى بەران، ژ بەلاقەكىرنا شىخ عەلەن خەلەف، كۆفارا لالش، ۋەزارەت، دەھۆك ۲۰۰۶.
^٥ ژ قەبۈل خەرقان، خەليل جىنى، بەرگى ۱، ۋىزەدرى بەرلى، ب ۲۰۴، ب ۲۰۵.
^٦ ژ قەبۈل خەرقان، عزالدىن سىليم، ۋىزەدرى بەرلى، ب ۲۰۶.

"جوانکرن"، ول دهمى خهرقه خلمهت دبت (کەفن دبت) دڤيٽ بکەنه دخەزينا خهرقا دا ل گەلەي لالشى يان ل گەلەي كەرسى و ئەم خزنة سلاڭگەھك ژىرا ھەيد و ئەم كەسى خهرقە ھلگر نابت پشتى رۆزئافا خهرقە ژ خود بكت، و دڤيٽ يى ب رە و سمبىل بٽ و دهمى خهرقە دشۇن ئاڭا خهرقە پى هاتى شوشتى درېئن جەھەكى پاقز يان ل نيشانگەها خاسەكى ل نىزىك گوند يال مالا وي خهرقى زىدە ب مالله دالقاندىنە و گوپالەك ب رەخقە دارقەيە، دڤيٽ ل ئىشارىن چارشەمبۇ و ئىنیا چرايى خهرقە ل مالا خهرقە ھلگر بھيٽە ھلکرن و فەقيرى ب خهرقە بى پشت گۈرۈن ئانكوبى مەك سى گافا ناھافىزەت و فەقيرى ب خهرقە دڤيٽ يى مفتول و كولك و مەك بٽ ژ بەر مفتول ل شونا گريغانى يە ئانكوتۈك و كولك خەلاتى ھەسن مەمايە، ئانكوتانجە ژ بۇ فەقيرەتايىھە. ول دهمى كەسەكى خهرقە ھلگر ئەمرى خودى دكت و دچتە بەر دلۇفانيا خودى، پشتى شىيخ و پىر و برايى ئاخىرتى دشۇن، خهرقى وي ل بەر دكىن و كفن لى ناكن تەمنى ب شال دېيچەن. خهرقە لبسى شىخادى و شىخو و ئومەر خالايىھ ئەوان ملىاكمەت و خاسا خهرقە بەر خود كرييە كو لبسى ئىمانىيە و ئىزىدى سوندى بى دخون و رېز و بەھايەك مەزن دەنە خهرقە و جەن وي دئىزىدىاتىيىدا يى بەرز و بلندە، ول دهمى فەقيرەكى ب خهرقە دھيٽە دىوانى يان ھەر جەھەكى ئىزىدى لى درونشتى بن و ژ بەر پېرۋۇزيا خهرقە و ژ بەر گرانىيا بارى خهرقە و ئەگەر ئەۋى رونشتى مىرى شىخا بٽ يان ژى ئىختىيارى مەركەھى (بابى شىيخ) و جوقەتا وي (پېشىمام، بابى شىيخ، پېشىمامى بەحزانى، بابى گاڭان) دڤيٽ ژ پېشىبر خهرقە قە رابن ول خهرقە زىارتى بن و هەتا خهرقە ھلگر نە رونت خوارى نابت ئەم كەسىن راوستاى رونن خوارى ھەر وەك دڤى سەبەقا قەولىدا ژ قەولى ناشى موحبەتى هاتى:

ھەي كورو بىي چاڭ سېي يە
تەھاي ژ مەعنىا خهرقى شىخادى ئى يە
تو چما دېيىرى: خهرقە چەنكەك زەركۈزە و لەپەك ھەرى يە^۱

پشتى خهرقە دھيٽە موركىن خهرقە دئينىت مالا خود و هەتا خودانى خهرقە خود بەرھەف دكت و كارى خود دكت دى رابت جلانان رادئىخت و خهرقە دانىتە سەر وى جلى و خودانى خهرقە ب خود خەرەقە نزىار دكت، ئانكۇ د دروت و نابت ژ جەن خود رابت ئەگەر ج ب قەمومت و روبدەت و دڤيٽ نەزادى بخوت و نە ژى ئاڭى ۋە خوت هەتا خهرقە د دروت.^۲

كى خهرقە لبەر خود دكەت؟

ژ چىنا شىخا شىخىن شىيخ حەسەن و شىخىن شىخو بەكەن دكەن بەر خود بەلكۇ نە ھەمى تەنى يىن بقىٽ بکەتە بەر، خود يانزى يىن بەنەملا وان خهرقە كرنە بەر خود ئەم د خهرقە بۇش بون ژبەر بارى خهرقە يى گرانە و يى خەرەقە ھلگرت و بکەتە بەرخود دڤيٽ يى پېكىرىت و ھەمى ياسايان خهرقە ب جە بىنت وەك و يى خېرخوازىت، يى راست گۆبت، قەدر و قىيمەتى خهرقە بزانت، د ئايىنى ئىزىدىاتىيىدا يى شارەزابت.

ژ چىنا پیران پېرى نۇمەر خالا دكارن خهرقە ھلگر ئۇمەر خالا ئىكە ژ باب جاڭىن ئىزىدىيان يى خهرقە بۇش بو. چىنا مەريدا فەقير كو جىينىكە ژ مەريدا دكارن خهرقە لبەر خود كەن ھەلبەت نە ھەمى يىن كو بەنەملا وان لبەر خود كرین ئەم ژى دكارن لبەر خود كەن وەك فەقيرەن بەنەملا كەسۋ و بەنەملا زەرو، بەنەملا حەمو و بەنەملا جندۇ دىسان سەردەرىنى مالا شىخادى يان تى زانىن (مەتبەخچىي مالا شىخادى) كو دەرىدىن ئەم ژى خهرقە بۇش و بەنەملا كا ناڭدارە ل ئىزىدىخانى كو مالا فەقير حەجى يە.

ئەم كەسى خهرقە ھلگرت.

دڤيٽ ژىي وى ژ چىل سالان كىمەت نەبەت و خود دوركەت ژ رەھۋەتىن خراب و خود نىزىكى دەرەوى و نەبوىي و زنایي و حىلى و بى بەختىيى نەكت، و دهمى خهرقە بۇ جارا ئىكە دكەتە بەر خود دڤيٽ قەمۇلى قەھرەرقان و چەندىن قەمۇل و دوعايان كو بەحسى خهرقە و بېرۋۇزيا وى دكەت بھيٽە گۆتن و كەسى خهرقە بۇش نابتىن مالىا وى (زنا) وى خەرقى وي بشۇت، تەنى كەچا وى يان بوكا وى دكارت بشۇت، بەل نابېئىنى شوشتىن، بەلكۇ دېيىنى:

^۱ ھەر دىدارا فەقير حەسەن.

^۲ ژ قەمۇلى ناشى موحبەتى، خەلەيل جندى، بەزگى، ۱، ژىنەرى بەرئى، ۲۵۱.

رئ و رسمن ل بەرگرنا خەرقە:

ئەو كەسى ژ نو خەرقە دكەتە بەر خوە دفیت بىزىتە شىخە كى شىخوبە كرا يان شىخە كى
شىخ حەسەنا ئەزى خەرقە هەلگرم و ل بەر خوە بکەم و دفیت ئەو شىخ ژى يى خەرقە^١
پوش بت و دى بتە برايى وي يى ئاخىرتى.

ئەو شىخى ب خەرقە و داخوازكە رەلگىندا
خەرقە دى بۇ ماوى سى رۇۋازان ب روْزى بن ب
ھەڤرە بۇ خودى و خودانى خەرقە.
ول روْزا يَا سىيى و پشتى نىشرە خودانى
خەرقە دى بەرانەكى ب خىرا خەرقە سەرەزى
كت، ل دەمى فتارى گازى جىنار و ھەڤال و
كەس و كارىئ خوە كت و ھەڤرا زادى خېرى
دخون و پاشى دى جلانكا نان (جل نان) رائىخت و برايى ئاخىرتى دى خەرقە دانىتە سەر و
ئەو ھەمى مروقىن د ئامادەبويى دى ئىلك ب ئىلك ل خەرقە زيارەتى بن و ھەتوبى خوە دانىتە
سەر و دېزىنى: بىدەرا خەرقە و ئەو فتوْز بۇ برايى ئاخىرتى يە دوعا و دروزى خەرقە ل
ھندەك جەھان ھوسا دھىتە گۆتن:



دوعا دامانا خەرقە:

ستار، خفار، جبار، لبسى دنى كەنى ئاخىرتى،
دەستى من ل دامانا شىخادى و ياروبىاي ئاخىرتى
مەلک شىخ سن قازىنى لسمر پرا سلاتى
مە نەھىلى ل كش و ماتى
ئىرو دنيا باڭلۇ باڭنى ئاخىرتى
دەستى من ل دامانا مەلک شىخ سن و ياروبىاي ئاخىرتى

و ئەف دوعا سى جارا دھىتە گۆتن دەمى يى رونشتى و پاشان خەرقە سى جارا را دكت و
دانىتە سەر سەرە خوە .

و لېيى دوعا دامانى خەرقە دوعا سورمى (سورما خەرقە) دېبىزت و ئەو ژى ب سى جارا
(ستار، خفار، جبار)، و ل دوْفدا دوعا وجكى ملى راستى دېبىزت ئەۋۇزى سى جارا (صبور،
صكور، سكر) و پاشان دوعا وجكى ملى چەپى سى جارا (عزيز، ساتر، ستار) دېبىزت و پاشان
دوعا (مەفتول) ئى دېبىزت:

مەفتولە، يامقىبولە
ل نىغا تىينج و رسولە
مە ب سەرى خوە قىبولە
شىشىس نورە، شىخادى غەفورە
مە تاوسى مەلك ب ئىمانە خوە قىبولە^٢

دوعا مەحكى:
يا واحد، ياعزيم
دايم وهابى، سەرپىا بى

سەد جوت سلافىت مە ل زم زمىن ول قوبىلت البدور والكاف و مغارى
ول كانيا سېپ قاپىيا رەش و قاپىيا مارازا
روزى سى جارا ل مەحكى و خەرقەبى^٣

و هەتا مەحكى گىرىدىن سى جارا. دوعا يام مەحكى دېبىزىن. ل ھندەك جەھان ل ناف ئىزدىيان رئ
و رسم و دوعا ب فى رەنگى ل خوارى دھىتە گۆتن، ل دەمى خەرقە بۇ جارا ئىكى ھاگرت
برايى وي يى ئاخىرتى كو يى خەرقە پوشە ل گەل ئىك چەنە دېر پەردىدا برايى ئاخىرتى
دى ب ستوبى وي گەرە وي بىزە:

تعال عب النار
نار ژ نور
نور ژ الله
خاف و لاتخاف
هذا موت الفقير

بەرى خەرقە ل بەر كت، دوعا خەرقە يام دوعا دامانا خەرقە سى جارا دھىتە گۆتن:
ستار، جبار، خفار، احـد، واحد، فرد و حمد صلدى، صمدى، بيت الرحمن
تاوسى مەلك ئىمانا منه لبسى وەليا وە كرسىي سنىا
شاپا شىخادى و مەلك شىخ سنى ئادىا
لبسى دنى كەنى ئاخىرتى
دەستى مە ل دامانا شىخادى و مەلك شىخ سن

و داودى بن درمان، ياروبىاي ئاخىرتى
ھەتا روْزا قىامتى
ل مە بىتك شفاتى

^١ ديدارا فەقىر حەسەن.
٢ زار دەقىقەقىرى جىردى سنجارى، كۈزىلا شەرقىيە خەلکى گوندى ملکە ل گەلىي كەرسى، و ب رىكا ھەڤال عومەر
ئۇسان خەلکى پرا خراب ب سوپاسىفە كەھشە دەستى من ٢٠١٠.

- | | |
|-----|---------------------------------|
| .۸ | قهولی ئاخىرەتى |
| .۹ | قهولى لاوى پېران |
| .۱۰ | قهولى سېبەكى ژىيەت عەدەدۇيا |
| .۱۱ | قهولى ئومەرخالا |
| .۱۲ | قهولى دسەرىمە (خوش مالى بابانە) |
| .۱۳ | دوعايانا باودرىيى |
| .۱۴ | دوعايانا هەيقى |
| .۱۵ | دوعايانا زىارت بونى |
| .۱۶ | بەيتا جىندى |
| .۱۷ | بەيتا مىر مەن |

وگەلەك دوعا و دروزىن دن ھەنە ژ پېروزىيا خەرقە خەبەر دەدەن دىسان ھەلبەستىغان و شاعيرىن كوردان خەرقە و دەكۆ سومبۇلەك و تىشەك مەزن و پېروز زانىيە و ل قەلەم دايە و ھەلبەست و شعرييەن خەۋە پى ۋەھاندىنە و خەملاندىنە و شاعيرىن گەورەيى كوردان مىنى: ھەممەدى خانى، جەگەرخوين، تىرىئىر ... و گەلەكىن دن، ژ بەر قەشەنگىا ھەلبەستا جەگەرخوين كۆ پېروزىيا خەرقە دەلبەستا خەۋە دە ئانى يە زمان مە دخوھەست قان چارمالكىن ھەلبەستا وي ل گەل فى نشيسينى بىنە خوارى:



فى زالى كاور كرم
ب جارەك ژ دىن ئەز دەركرم
گەد روش كرم گەد زەر كرم
بىچارە پۇشىم خەرقەيە

خەرقە لەن كر نە بىزۇر
ئىزىدىا شىڭال و تۇر
كازى مەكر ئەم بىرەن ژۇر
زانى مە لاش كابېيە

ھەلبەت فاكلىرى ئىكەنلىرى كوردى ژى پېروزىيا

خەرقەيى ھەمبىز كريە و دىستانىن شەرى ئازادى و بەرخودانى دا ژى مىرخاسىن ئىزىدىان ب سوندەك مەزن خەرقە زانىيە دەملى سترانا ئىزىدى مىرزا تى گوتن (منى سوندەك خوارى ب خەرقە و كولكى فەقىر)، ب جىلى شىخان و پېرا، ب دىوانى مىر ئەز ژپى عەسكەرە خانى خان قىزلى پاش قەنەنە گەرم، ما ئەز داگرم سى سەد و شىيىت و شەش خەرارىيد سەرا). ھەر دىسان مە قەولىن تمام ژى ب خەرقەيى ھەنە و ئەفە ژى دەقى وى يە:

دەرىوش خەرقە گىريشانە
قەدرىي وى قەدرەكى گرانە
مە پى تى شادە و باومرى و ئىمانە

و بەردەوامىي دەدەتە دوعاى و بەرى خەۋە دەدەتە و جىكى (ھوجىكى) ملى راستى و چەپى و دعوا
وجك دېيىت:

شبور، شكور، شكر،
احد، واحد، اطيف،
عزيز، ساتر، ستار
صلدى، صىدى بىت رەحمان
طاوس ملک ئىمانە

و لېھى وى دعوا (مەفتول) ئى دەھىتە گۆتن:

مەفتولە، يامقىبۇلە
نېۋە تېنج و رسۇلە
مە ب سەرى خەۋە قىبۇلە

و لېھى دعوا (مەفتول) ئى دعوا (مەحكى) رىستك دەھىتە رىزكىن:

دایم وەھابى
ھەردىم ل سەر پىا بى
سەد جار سلافي مە ل مەحكى و خەرقا بى

مەحكە نورانى يە
ھاتى ژ عەرسىي بانى يە
مە پەشتا خەۋە پى شەداندى يە
ب دەستورا سلطان شىخادى يە^١

ژ بەر پېروزىيا خەرقە و گۈنگىيَا وى دىناش باودرىيا ئىزىدىاتى دا، چەندىن قەمول و بەيت و قەسىدە و دعوا و دروزە مەدح و سەنەن ژ بۇ خەرقە دەدەن ئەفە نافىن ھندەك ژ وان تەكستانە:

١. قەولى خەرقە
٢. قەولى سەرەمەرگى
٣. قەولى ئىمانى
٤. قەولى قەنديلا
٥. قەولى ناسىدىن
٦. قەولى شېخو بەكىر
٧. قەولى قەرە فەرقان

^١ دىدارەك دەكل ئازايىي دينى ئىزىدىان، فەقىر خەر فەقىر بەركات كەسۋ، تەباخا ٢٠١٠.

جەگەرخوين، ناگر و پروسک، بـ٦٥.

هنجي ب سور ما خمرقه بگره
و بخه زهب تى ده ب فكره
ئمو بى شك دى كافر ب موه

خمرقه لباسى نوراني
ژ خهزينا قودرهتى دهراني
دەن مىغان خاترى خمرقى شيخادى بزانى

خمرقه لباسى ميرى ئاخە
ھەجيى دېن بارى خمرقىدە كولۇ عەمەلى وي نە ساخە
رۇزا ئاخىرتى يى تازىيە يى چىپلاقە

خمرقه لباسى خاسە
چونە بەحرى خواسە
لال و دور ئانىن بى قىاسە

چىزىن بەحرى بون
ھەر چىل يى هورى بون
ھەر چىل نەدرىن كانىا سې بون

يەكە دن ل وئى مابو
پىر سىنى بەحرى ژى پەيدابو
ئەۋىزى نەدرا پەدشابو

ژ قەمول لاوگى پېرىھ
دا ئەم بىن مەددەتىن میرە
خەلاتى سلطان شيخادى خمرقىمە
دانان بوسەر ملى فەقىرە

(ئەم دكىيەن خودى يى تەمامە)

قەمول خمرقه^۱

بەرى دنیا نەبو
وئى رۇزى خمرقه ھەبو
خمرقه لباسى خودى ب خەبو

دنیا نەبو نە دسىۋاراند
محبەت ھەبو مىران نە د عنکراند
وئى رۇزى سلطان شيخادى خمرقه دەھراند

دىن من ب فى يەكى محتاجە
جە درويشەكى رەھوانجە
بەركىن سلطان شيخادى دەلق و تانجە

تانج دبىزە خمرقىمە
روزى سەد گونەھكار تىنە بەر دەستى تەپە
ھەقىيا شيخادى دەستەكى مە ل سەر تەپە

وئى د كەلين گريفانە
خمرقه لبسى پەدشايەكى من بىن گرانە
خمرقه قوبىلتا خاسانە

خمرقه لبسى خودى ب خۇمۇھى
ئىورىيە سەر قالبەكى بەپىتە شەمە
وان خىتىر نەدكىن گونەھ ل خودكىنە زېدەيە

خمرقه لباسى جەبارە
ھنجى هليتە سەر خمرقى شيخادى وارە دارە
ل ئاخىرتى ل بەر شيخادى و مەلمەك شىخ حەسەن يى كافرو گونەھكارە

^۱ بەدلەن فقىر حەجى، زېدەرى بەرى، بـ ۲۳۱.

ژ مىزۇويا ئىزدىيان يا نىزىك

ب. فرياد

چاخى من ھەولا خواندنا لابەرىن مىزۇويا ئىزدىيان يا نىزىك كرى، دەوروبەرىن وان پەيونىدى، ۋىيان، داب و نەرىت، زۆر و سىتمەم و زاڭ يىين ل سەر ملىئىن وان ب سەركەفتىن و كەھاين پلە و پايىن بەرز - ھەلبەت، بۇ من زۆر نەمەنى و تاشتىن مېشىكى مرۇقى ھەز نەكەت دىيار و خۇيا بۇون. وەرن ب ھەفرا ئەقى روودانا راستىنى ژ مىزۇويا نىزىك - زۆر نىزىك - يَا لابەرىن وى ۋەددگەرن نافەراتى سەدى بىستى، چەرخى بۇرى - دا ب خۇندىن و پەند و مفایان ژ خودرا ژى و درېگىرىن.

وەكى مە ل پىشىپى ئامازە پېكىرى ئەق بويەر - قەومىيىنا وى ۋەددگەرە نافەراتى چەرخى بۇرى (چەرخى بىستى) و چاخى جەھوين تەقايىال جىهانى د بەلاڭ بىنە كۆتكەخ - ئەردى چاھەرى و پېرۋاز - جىھىيان .

ل نافەندا قەزا شىخان و گۈندىن دەرددۇر ڙىمارەيەك - نە كىيم - ڙىمالىن ئايىن جەھو بۇون، ھەلبەت باب و باپىر ب خەلکانى وان دەفەران را د ئاكنجى بۇون، پەيونىدىيىن باش و موكم ب تەقايىا خەلکى را ھەبۇون، ئىك ژ جەھوين مال ل ئىيىشقىنى د گۆتنى (مام موشى)، ئان ژى مالا مام جەھوئى، وەكى باپىرى من ل زارۋەكىنەيىما من بۇ من باسلىكى، ھەر چەند وى چاخى من ھەز دىك ئەفسانەيە ئەو بۇ من باس دكەت، بەلى پا نەها دەمى گۆتنىن رەحىمەتلى بىرا من دەھىن و ئەز وان گۆتنان د گەل رووداپىن بەراوەرد دكەم و ب سەرەت جەھو وان هاتىن ل نافەراتى سەدى بۇرى مينا پەرتۈك و دەكۆمەنت، ھەلبەت سەد ژ سەدى دەك ھەقىن. ھەر چاوا بىت، گۆتنىن باپىرى ل سالا (1973) بۇ من باسلىكىن ئەز دى ژ خۇندەفانىن

ب روومەت را رىز بكم وەكى چەوا وى گۆتنىن، تىنى ل قىر ئەز دى رەحم و دلۇقانىيا ژ تەھىز مەرىيەن وە را دخوازم و ب وان را ژ باپىرى را بىن ل سالا (1974) وەغەركى.

مام موشى ب دوو سى سالان ژ من مەزنەر بولۇشىنى د گىرەت بەر و ژ بىرسەتكى ب لىگان بۇ دكانا (مام موشى پىنيدۇز) د چۈم، جارەتكى - بەرى وەغەركىنەن وانى ب ئىكجارى ب چەند رۇزەكان، ئەز ل بەر دكانا دائىيختى راوهستام و من ھەز كىر ۋى جوامىيەت خىرە ئەقەپەنەن وى نىنە، مام موشى بىت و ھېز دەم پىشتى نىقىرۇيەكە زۇۋىيە و دەرگەھى رەسىقى وى بىن داخستى.

پىنەدەقىيا پەرسىيار كەم ئەو مەددەھەك بىن و تەقايىا خەلکى بىھىتى جەھو وان وەغەرەك ب ئىكجارى ل پىشىيا وانە، ب راستى چۇنما ئىقىجارتى تايىبەت بۇ ئەز ژ وى جوامىيەت عەسەنە يَا وان پەيام و دەنگۇيان بىزانم ئەگەر راستە ب مەرازا فەگەر يانىنە بۇ جەھىن باش و كالانىن خۇ و ئەردى خەون و داخواز و مەرازىن وان تىنە جى، ھەلبەت وى چاخى ئەم دەنگ پرۇپاگەندەكە بەلاڭ بۇو.

من رىيَا خۇ گىرت و بەر ب مالا وان چۈم، چاخى دەرگەھى دەرەقەيى مالى بۇ من ھاتى ۋەتكەن، كەھاىل وى چاخى چاھى من دىتى و بەر دەۋامە لېھر چاھىن من، كر و بىن دەنگ مام موشى ئى رونشىتى و زارۋۇك د مەت ل دۆرماندۇر د جەھىياتى و ل دەرا ھە كابانىا وى ھەر دەۋو دەست ل بن چەنى و د خەيالەكا كۈور و دەور دا، من سلاڭ كر و ئەز ب ژۆر كەفتەم و ھېز وى ئاگەھ ژ خۇ نەي، مام موشى بلەز و بەز رابىو و پېش منىھە راوهستا و گۆت: " تۇو گەلەك ب خىر هاتى مامى لىاس، كەرەمكە وەرە ژۆر" ، من قىيا بۇ وان خەم و پەزارا خۇ دىيار كەم ژ بەركو باركەن و خاتىر خواتىن ژ ھەھاىل و ھۆگرگان زاڭ قورس و زەممەتە و ب تايىبەت بۇ يىين مينا من دل نازك و ھەست سەفك، وەل مامى ئاخقەن بىر و كىشا كنارەك دن (يادا وى ب خىر كا ئەو نەل كۈورە زېنديوو ئان وەغەر كىرىھ ئەو گۆت: " باوهەر كە مام لىاس، ئىزىزدانى تاڭ و دلۇقان سەر زمانى بابچاڭ و پېيەم بەران و دنالا رىزىن پېرۋاز يىين - تەورات و زەبورى - دا فەرمۇویە - ئۇنى سالانىن دەور و درىز ژ بەرەلايى و نەخۆشى و سىتمەم و زۇرى بىشىن، لى بەلى ھەر گاڭ و ل ھەر جە و ھەر رىز دا گۆتىيە و دووبارە كىرىھ - ئىيىمانەت ئۆل و باوهەر وە، ئىيىمانەت ھەفگەرنىن و ھەفگارىا وە، ھەۋ و دن ژىبرىنەكىن، ژىبرى كۆتى ئۇنى پېش و پەنە بۇ ھەۋ و دن ل رۇزىن گرەن و تەنگ، و ئەم پېش راست كەنە خۇشتىنى و ھەفانى دلسۆز - ئەمەن ب ھانىا وە بىن و وى ژۆر و سەتمەن، وان سالانىن دەرىز وە ھەدار و ئەينەتا وە تاقىبىكەين،

...؟! مامو ئىزدانى دلۇقان هارىكىارى وە بە وە سەخبىر و ب پارىزە.. ئەز چۈووپى دن نا
بېزىم ..

مام ئەلیاس ھەست ب شەرم و فھیتىي كر فيا وي تىبگەھىنت كو ئەگەر و ئەنجامى في
بەرەلايى و دەستوودارى پر شەپۈزە ۋەگەرىنت بۇ بى سەر و بى پشت و بەلگازىيا نېزدىيان،
بەللى پا نە دزانى چاوا و بى رۇوبۇي بۇ فەگىرت.

مام موشی دووباره دهست ب تهواویا گوتنا دیار بو ب دوماهی نه هات ببو - کر:
مام ئەلیاس .. ئیمانهت ئەز دمزم و تۈۋىسى ساغ، بکەبىي گوھار و دگۇھى خۇ بکە، ئیمانهت
ز بىر نەكە، بۇ مال و زارۇ و دۆست و ھەفالىن خۇ ژى بېئىزى، نەتنى و خالىن لازى يېنى
مللهتى خۇ نە بېئۇنە ج كەسان بلا چەند دىنيزىك و ھەفالىن وە بن، كىماسىيەن مال و دمزم و
جىرانىن خۇ نە دىرى چاخى توو بېزار و تەنگاڭ دېبى، ئەو مالە و ئەو دمزم و جىرانە بۇ تە
پېشت و پەنانە، ئەگەر هات و وان تۈۋ كوشتى ژى، ھەر ئەو بۇ تە دى غەمبارىن و تە
ۋەشىرەن، دەقىگىتى بىن، بلا نەيار دەرزى دنابېرە وە را نە بىنت، ھاركاريا ھەۋ بکەن،
دراستىگەن، خۇ داقۇتن ژ قىزىز و گونھىن گران، پىستە پىست و گۆتكۈتكەن بەتال كەن، فان
جۈرە تەھن و داب و نەرىتىن چوو سوود و مفا نەين، ب خۇندىن .. بلا زارۋىتىن وە ب
خۇندىن، تىكەلە ھەر جەڭ و مللەت و نەتهوھ بکەن، و ب وان را خۇ ب گونجىنن.. سوودى
بخۇ ژ وان بکەن و دېمى خۇ يى جوان نىشا وان بىدەن و چەند كريتى و نە رىكۆپىكى وە
ھەين ژ رەھ و رنجال ۋە دەربىنن و پاپىئىز .. نە بت تىنى ژ بەر چاقين خەلکى ۋەشىرەن و
ھەن، ب ئىكەجارى - خۇ ژ وان قۇرتال كەن، باڭ و كالىن وە سەرەت وان دچۇ و دەرە و
بېبەختى و بوهتان نەد كرن، ئى باوەر كە مامۇ ھەر بۇ بايى و بىي چوو بەرامبەر و قازانچ
ئۇن د كارن وى بېئۇن نەج جاران چىببوي و نە كەسى ژى گوھ لىببى، ئى مامۇ بۇچى؟ ما
نە خودى ژوھ قەبۈل ناكە .. ئىزىدىاتى شرينە، و ئايىننى وە پر پاڭز و ھىزايە وەكۈ بېبىكا
چاقين خۇ ب پارىزىن، ئىزىدانى تاك و تااووسى مەلەكى ناڭ شرين بلا ھەر دم و گاڭ ل بىرا وە
بن، مراز و داخوازىن وە بن.. ژ بىر نەكەن - د پر ھىيى و باوەر بن - ھەر مللەت و
نەتهوئى ب سەر وە دائىنا فەرمان و نەمان، باوەر كەن - ھەر دم و گاڭ - تااووسى مەلەك
ئامادىدە و وى ب هنا وە (ئىزىدىي ب دل و جان ئى ئىزىدى) بى و دى ل وان كەتە ئاخىر
زەمان.

راهینین و ل داوی ڙی کاروانی ههڻ گرتی و ڙ ههڻ نه راتهقيا، وئي ب مراز و داخوازين وان گههينين. چاڦين وان ب ئه ردی خهونان (قودسا پيرۆز) شاد ڪهين و مينا ههـ ميللهـت و نـهـهـوهـ بـوـ ٿـارـماـنجـ وـ پـاـشـهـ رـوـڙـڪـاـ گـهـشـ وـ ئـاسـوـيـهـ ڪـاـ سـهـرـهـهـ رـازـ بـوـ مـرـؤـفـاتـيـيـ دـايـينـ گـهـينـ،ـ هـهـلـبـهـتـ بـ هـهـفـڪـاريـ وـ هـهـمـاهـهـنـگـيـ بـ مـيـلـلـهـتـ وـ ئـايـينـ وـ چـيـنـيـنـ خـيـرـخـواـزـ وـ باـوـهـرـىـ بـ هـهـفـپـهـيـمانـ وـ ئـيـكـ وـ دـنـ رـيـزـدـگـرـنـ،ـ نـهـ وـانـيـنـ تـنـيـ وـ تـنـيـ خـوـهـ دـهـيـنـ وـ تـنـيـ نـهـ بـنـ خـلـاكـانـيـنـ دـنـ هـهـمـوـوـ گـاـورـنـ وـ بـ هـهـرـ رـئـيـ بـ دـهـيـ ڙـ نـاـڻـ بـچـنـ ...

چاخی باپیری دهرفهتا خو دیتی - مام موشی کر و بی دهنگ بوي - بلهز پرس و ئاخفتتین
د دل و میشکى دا د پەنگىيائين ۋىيا ب جارەكى بىنتە دەر و گۆتى:
ئانکو (مامى ھىزرا) بەرى سالانىن دوور و درېئىز دېھرپەرەزىن تەهورات و زېبۈرئى دا و سەر
زارى موسا پېغەمبەر هات بwoo، ئۇنى ستەم و زۆرەك زاۋى و سالانىن درېئىز ژ نەخۆشىيان بىين
و ئۇن ھاتىنە ئاگەداركىن، ئىمماڭتى ئۇل و باواهردا خو بن، ھەڭگىرتى و دلسوز بن و مزگىينىا
شاد بۇونا وە ب جىيى باب و باپيران، ئەردى چافەرئى و پېرۋىز - كريه، مام موشى تو ب
خودى كەيى ناڭى مە ئىزدىيان، پاشەرۋۇزا مە دەوروبەرەزىن مە د ناڭا وان لەپەر و
رەشىبەلەكان دا ھاتىيە، نە ھاتىيە؟ تو ب سەرە كورى خو - حستقىل - ئى كەيى، ئەز دزانم
سەرە وى چەند لەھر تەبى عەزىزە .. ھەكە تىشەك دەربارا مە ئىزدىيان و چارەنۇوسى مە
تۇو دىغان ئان تە خوند بىت، تۇو دى بۇ من باسکەبى ...

مام موشی هرزنکه ک کوور راهیلا و پاشی دهست ب ئاخفتنا خۇ کر: مامى ئەلیاس، وەکو
ئەز تىيگەھشتىم .. شۇلا وە پر زەممەتە و دۆزا وە پر ئالۇزە، يَا بەرى نەها بۇ وە دەقتىي،
ھەو بۇ وە دەقتىي و ناچە سەران، ھەتا نەھەردۇو پېچك - لىنگىن سىتم و زۇرى - ئىك
ڙى ل سەر ملى مە بو و يى دن ل سەر ملى وە بو، ژ نەھەر پېدا ئەم رىزگاربۇن، ئىدى
ھەردوو پېچك وى كەفن سەر ملىتىن وە، من دەقى ئۇن خۇ شاش نەكەن و باش بىزان ئەگەر
چاھىن خاس و بابچاکىن وە نە ل وە بانە و مەفھەرە و شىيەمىسى تەورىزى و تاۋوسى
مەلەكى ناڭ شرین نە با نە، ھەر مانا وە وى پر زەممەت و گرمان با ، ھە .. ھە .. مامى ئەلیاس
ئۇن پر نە باش و ب كىر نە ھاتىنە، وە خىرا ھەف و دن نافى، ئۇن ژ ھەف و دن را خۇشمەر و
عەگىدىن و ژ نەيار و دوزەمنىن خۇرا پەرن - دسەر جان و لەشىن وە را دەرباز دىن - ئۇن ژ
بۇ نە حەزىن خۇ دەست كىسنى، ئى جما ..! ژىهر جى..؟ ئۇن نە دەمەجۈرى ۋى يەكتىنە

آراء و مقتراحات
لتشريع قانون الاحوال
الشخصية الازيدية



() () () () ()

)

()

()
()
()

)

(

() ()

()

**جبل سنگال في العصور الجيولوجية الأولى
و علم المتحجرات فيها**

()

()

(Kersê)

/

()

() /

/ /

()

()

()

()

()

()

()

()

/

حوار هادئ

مع اعلاميين في الشأن الاعلامي

(guhbel)







* * * * *

www.arsivakurd.org



*
*
*
*





الغرابة والموت و تأثيرها على المجتمع

/



()

"

"

()

اللشيات



(١) اهمال مناطق سكنى الهويرية




أقدمت في عام ١٩٧٥ على ترحيل سكان ١٣ قرية إيزيدية تابعة لقضاء زاخو عائدة

تسكن عشيرة الهويرية في الجنوب الغربي لقضاء زاخو وبمحاذاة الحدود السورية، حيث هذه العشيرة الكبيرة المعروفة بشجاعتها وخلاصها قدمت تضحيات كبيرة ولعبت دوراً مهماً في الثورات الكوردية ومع ذلك فهي تعاني الاهمال وعدم الاهتمام الحكومي لها من اعمار فراهم وخاصة اذ عرفنا بان الحكومة العراقية

٢ المحل: اول مشروع ايزيدي للاعلام المطبوع الحر في اقليم كوردستان

كون المجلة لاتتبع لاي مؤسسة ثقافية او جهة رسمية وانما هي من بنات افكار القائمين عليها وتعتمد على التمويل الذاتي لذا اعتبرها "مجلة المحل" اول مشروع ايزيدي



وفي الشهر السابع من العام الجاري بمدينة دهوك صدرت العدد الأول من مجلة المحل للدراسات الايزيدية التراثية والحضارية، وهي مجلة محكمة فصلية ذات طابع علمي، تتألف هيئة تحريرها من الاستاذ ريسان حسن كصاحب للامتياز والكاتب المبدع الشاب كوفان خانكي - رئيساً للتحرير والاستاذ حجي مغنو - سكرتيراً للتحرير وتتميز مجلة المحل بغزاره موضوعاتها من جهة، وشموليتها لجوانب التراثية والدينية المتعددة من جهة أخرى والمجلة تقدم موضوعات مهمتها توظيف التراث لتتوير الراهن

للهويرين، منها (ديربون، فيشخابور، قرغولا، كورينبي، بيبزنبي، باجدا ميري، باجدا كندا، باجدا برافي، كانى عربي، قرودا و ...) ودمرت تلك القرى ومساحتها مع الأرض وصادرت أراضي سكانها الأصليين، وأسكنت العرب في قرى نموذجية بنيت خصيصاً لهم، ولكن بعد مرور ١٩ عاماً من الانقاضة لازالت هذه المنطقة تعاني من مشاكل خدمية ومعيشية ولكن في المقابل يلاحظ الاهتمام وبناء وتعمير القرى العائدة للاخوة المسيحيين، المجاورة والقريبة من القرى الهوية؟

نحن كوفد من الاعلاميين من بلجيكا و هولندا والمكون من كل (يان بيكن نائب رئيس برلمان بروكسل السابق ومسؤول ملف الكرد ، والكاتب درويش فrho رئيس المعهد الكردي في بروكسل ، والدكتور احسان نبي زاده من بلجيكا ، الصحافية الفوتوغرافية الس فاندر مارش من بلجيكا ، الصحافية فرزدان يالديريم من اذاعة هولندا العالمية ، الصحفي حسو هورمي من هولندا ، الصحفي حسين كويجوكلو من تركيا ، وانضم اليهم الاستاذ فتح تيمار رئيس جمعية الصدقة في المانيا ، والشاعر والإعلامي حسون جهور من المانيا) ، بتاريخ ٢٣/٠٧/٢٠١٠ ، قمنا بزيارة تفقدية لقرى الهوية والتقطت عدسة الصحافية الس فاندر مارش الكثير من الصور لتلك القرى وطريقة معيشة الايزيدية هناك وتم تدوين اهم معاناتهم .

كما زرنا القرى المسيحية والكنيسة الموجودة في فيشخابور بمعية المهندس بشار معاوية الهوياري والاستاذ دخيل نايف وقضينا فترة (قصيرة) جميلة في احدى الكازينوهات المقامة على مجرى الماء المتذوق من عين ديربون وهنا سأل احد الضيوف لماذا لا تهتم حكومة كوردستان بتطوير منطقة ديربون من الناحية السياحية ؟ حيث سيدر بالمنفعة الكبيرة على اهالي المنطقة وسينعش الاقتصاد (الاقليمي) المنطقة.

هنا اقول بأنه سيقام بالمستقبل في العاصمة السياسية لاوربا بروكسل معرض فوتوغرافي للصحفية الس عن الايزيدية في كوردستان ، قراهم ، معبدهم لالش المقدس ، مركز الامارة ، معيشتهم ، ... الخ.

مختصرات من المتن

في البدء و ضمن الافتتاحية (باللغة الكوردية) يتطرق صاحب الامتياز الى اهمية اختيار اسم المجلة المستوحة من الادب الدينى الايزيدى ويدعو الكتاب الى المشاركة بدراستهم في الاعداد القادمة والمساهمة بارائهم في اغناء المجلة.

القسم الكوردي:

يضم ثلاثة دراسات وقصيدة من الادب الدينى الايزيدى ، وفي بحث بعنوان(حملة فريق باش) يسلط الكاتب مروان شيخ حسن الرشکاني الضوء على فترة ولاية الفريق عمر وهبي باشا منذ وصوله الى موصول في ٥ تموز ١٨٩٢ لحين تحيته عن السلطة في ٢٥ نيسان ١٨٩٣ والمحازر الى ارتكابها بحق الايزيدية ، كما يثمن دور الاغنية الفلكلورية بجبل شنکال في توثيق وارشفة تلك الحملة.

ويطرح الكاتب الشاب والمبدع كوفان خانكي من جامعة دهوك موضوع (تطليل القافية في قول خلق الكون) من خلال دراسة حالة الشعر واسقاط النظريات الادبية المتعلقة بالقافية على هذه القصيدة الدينية و ذكر عدد من انواع القافية وكيفية استقادة منظم القصيدة منها بصورة علمية.

اما الكاتب ريزان شفان من جامعة دهوك فيقدم (مدخل الى حياة ونتاج بير رش حيران) حيث يستعرض مجموعة الحقائق التاريخية المتاحة حول هذا الموضوع من ناحية اللغة، التحليل، الدراسة والنقل، كما يحاول جاهدا التوصل الى تحديد عصر بير رش حيران ومعرفة معاصرية، كما يذكر عناوين واسماء بعض اقواله الدينية مبينا اهم الجوانب الموجزة في تلك القصائد منها (الوحданية، الخلق والتكون، الانسانية والاصلاح الاجتماعي والتربية الخ). اما الشيخ دشتى شيخ زيندين ينشر قول اليمان فهو من جهة يوثق ويورشف هذه القصيدة الدينية التي تنشر لأول مرة، ويبين عمق المعانى الموجودة في متن هذا القول من جهة اخرى

القسم العربي:

يتناول الكاتب حجي مغسو حسو موضوع (المرأة وحقوق ميراث المرأة الايزيدية في قول شيخ سري) حيث يلقي الضوء " من خلال تأريخ بعض الحضارات والديانات" على وضع المرأة فيها من اغلب الجوانب ويفارن مع وضع المرأة الايزيدية

ويأخذ قول شيخ سري نموذجا ويبين من خلال النصوص مستوى الاحترام والميراث والحقوق والواجبات (ل وتجاه وعلى) المرأة الايزيدية.

وباستخدام أسلوب التحليل القانوني يعود المحامي حسن الجوتiar إلى عمق واهمية الحقوق للتنوع الديني والعرقي الموجود في اقليم كورستان وكيفية مراعاة الحقوق المدنية للجميع ويخلص اهم مطالib الايزيدية المنصوص عليها الدستور، ضمن موضوعه (حقوق الايزيديين في الدستور العراقي ومسودة دستور اقليم كورستان).

ومن زاوية إعلامية يدعو الصحفى مصطفى بنانى / شنکال، من خلال قراءة (المرأة الايزيدية والعراق الجديد) في توفير الفرص للمرأة الايزيدية لكي تتمكن ان تتفاعل اكثر من المعطيات الحاضرة ولديها القدرة في ان تتبوأ اعلى المناصب، كما يلقي الضوء على مكانتها في المجتمع الايزيدى من الناحية الاجتماعية والحقوقية . في حين يتناول الكاتب شكر خضر مراد/شنکال موضوع "ناحية الشمال في شنکال - الترحيل والتعريب" حيث تستمد هذه الدراسة أهميتها من خلال التأكيد على ضرورة دراسة الماضي ووقعه التاريخية، مع سرد اسماء القرى الـ ٤٨ التابع لناحية الشمال والتي هدمتها الحكومة العراقية في صيف عام ١٩٧٥ وتحديد جغرافيتها وعدد ساكنيها بالإضافة الى ذكر اسماء مدبروا الناحية من عام ١٩٦٠ ولحد الان . وفي بحث بعنوان: "عالم المسكوكات القديمة" يسلط الباحث قاسم عطا اوصمان الضوء على أهمية وجود هيكل من القيم الاقتصادية او اثمان للمبيعات في اية دولة ما ويبحث في اهم المسكوكات التي استخدمت قبل ظهور الاسلام ويبين تاريخ وشكل ومعدن والنقوش والكتابات في المسكوكات الليدية والاغريقية والسلوقية والرومانية والaramatic الفريثية والبيزنطية.

الايزيدية وبعض اماكنهم المقدس في عفرين موضوع اعده الكاتب شيرزاد الخيرافى وبعد مقدمة تمهيدية عن جذور الديانة الايزيدية الموجلة في القدم يوضح الموقف الجغرافي لمدينة عفرين واسمها، من ثم يتعرج على اهم الملامح الدينية هناك وبيان بصمات واثار الاديان الظاهرة في عفرين مع ذكر اسماء بعض المزارات والطقوس التي تجري فيها

القسم الكوردي - الاحرف اللاتينية

يشرح الكاتب ريسان حسن موضوع " الدولة الكوردية في فكر الشيخ حسن " من خلال دراسة الاسباب الموضوعية والذاتية وصراعه مع بدر الدين لؤلؤة، ثم يسرد اهم المعوقات والاسباب التي ادت الى فشل مسعاه ويقول الكاتب بن الشيخ حسن ابن الشيخ عدي الثاني ولد- ١١٩٤ م في لالش وقتل ١٢٤٦ م في قلعة موصل.

اما الكاتب كمال تولان /المانيا يتناول "اهمية تاريخ واثار الايزيدية في منطقة حسن كيف "ويبين كيف ان الكثير من القرى الايزيدية تضررت بسب بناء سد للماء والتي ستغمر الكثير من الاثار والاراضي ويقوم الكاتب بشرح اسماء وتاريخ وجغرافية بعض العشائر والقرى الايزيدية في منطقة حسن كيف بتركيا.

ايزيدي جبل الكورمناج (عفرين) عنوان مقالة اعدها الكاتب كوني رش /قامشلو ويطرق اماكن تواجد الايزيدية في منطقة غربي مدينة حلب ويدرك كيف ان الايوبيين في القرن ١٣ الميلادي اقاموا علاقة متينة مع الشيخ مند الايزيدي، ثم يوثق الكاتب اسماء واحاديث الكثير من المزارات الدينية وبيوب اسماء القرى الايزيدية في منطقة شاكان وجومي وشيراو، بالإضافة الى معلومات اخرى.

الناقد والكاتب حيدر عمر /المانيا يتناول النقد من خلال موضوعه (شاعرية جكر خوين، قاعدة للشعر) ويتسائل ما هو النقد الادبي (عندهنا)؟ وain الكرد من عملية النقد؟ يجاهد الكاتب في البحث بشكل علمي عن اجاية الاسنلة المذكورة اعلاه، ويتجلو بين اشعار الخالد جكرخوين بغية تبيان عمق افكاره وقوه معاني قصائده وسعة قاموسه الفكري والشاعري. يقدم الشاعر خبات شاكر / المانيا رؤيته لـ (الادب الكوردي قبل الاسلام) ويبعد من سقوط الامبراطورية البيدية وصولا الى الغزوat الإسلامية لبلاد الكورد، من ثم يعطي نماذج " قسم الكاتانا من كتاب الايفستا - اشعار وجدت في كهف جيشان بالقرب من السليمانية- قصيدة مكتوبة على قطعة اثرية بسم بورا بوز تعود لـ ٣٣٠ قبل الميلاد " ثم يمنحنا معلومات قليلة عن الموسيقا الكوردية قبل الاسلام ويعطي مثلاً" الموسيقي الكوردي بايرد والذي كان معروفا ايام خسرو برويز -٥٩٠ -٦٢٧ قبل الميلاد". وفي الختام ينشر رئيس التحرير قول ديني باسم (پشت پهدا/ qewlê pişt perda) اي ماراء الحجاب ويقوله الناشر (لقد نقلت هذا القول من كاسيت سجل بصوت داي خمي شيخ زيدين الشمساني)... أخيراً لابد من القول أن مجلة المحفل بالرغم من الامكانيات الفردية المتواضعة قياسا بالمجلات الأخرى في المنطقة، الا انها تمثل قناة معرفية جيدة تعبر عن عطاءات وإبداعات الفرد الكوردي الايزيدي، وتسمهم في تفعيل حركة البحث والنشر العلمي وتشترك في ارشفة التراث الايزيدي. مع الاسف لايمكنا في الوقت الراهن تصفح النسخة الالكترونية من المجلة على النت وكلنا امل بان ذلك سيحدث في المستقبل القريب.

عقروا الحب..... أثبوا الحب !!

...!
!
(...)
(...)
()

ماذا تعرف عن منطقة

بن کند؟



())

()

()

()

()

()

()

()

()

:

()

) ()

()

(

()

()

)

(

()

()

()

()

:_____

١. مقالة/ خدر دولى (جريدة الصباح العدد ٨٦٥).
٢. كتاب/ القوش عبر التاريخ.
٣. عدد من شيوخ المنطقة.
٤. مقالات للكاتب.

BERXWEDANA ÊLA XALTA

MÎRZIKÊ ZAZA



Dr. Eskerê BOYÎK \ Elmaniya

Lêkolîna me derheqa berxwedaneke eşirêne Kurdên êzdi ya mîrgeha Xalta ye. Wextê da mîrgeha Xalta li nav Kurdistanê da mîrgeheke Ezdiyan ya mezin û bi hêz bûye.

Xaltî fêdérasyoneke eşirêne êzdy ne: Heta niha jî eşirêne Qizilî, Niqîbî, Xendeqî, Berekî, Anqosî û hinekên din xwe Xaltî nav dikin.

Di nav Ezdiyêne Soveta berê da jî hinek qebîl xwe Xaltî dibînin (Bela û hinekên din).

Niha Xaltî, usan jî li der-dorê Wêranseherê, Şengalê û Şêxan jî hene.

Ezdiyêne xaltî dibêjin ku peyya *xaltî* navê eşirê, yan qebîlê nîne, Xaltî navê war e, cîye... Eger navê war e, usane navê herema wan, welatê wan Xalta bûye.

Eyane, ku dor 1300 sal ji berî zayînê, li der dorê golên Wanê, Ûrmiyayê û çiyayê Araratê hukumdarîke mezin bi navê Xaldî (Ûrartû) hebûye û heta dewya sedsala şesan (berî zayînê) dom kirîye. (1) Gelo di navbera navê wê dewletê û navê van eşirêne Kurdên êzdi da girêdanek nîne? Gelo Ezdiyêne Xalta paşmayê wê şaristaniyê nînin? Ji bo dest me da delîlên anegor nînin, û ew babet lêkolîna meva girêdayî nîne, em vê pirsê bihêlin dîrokzanan û paşwextîyê ra.

Di dewr-zemana bi seda hezara Xatîyê êzdi welgeriyane bûne musulman. Gelo cîma Kurdên êzdi navê koka xwe xweyî kirine, lê musulmana jibîr kirine? Bi texmîna min di bin piropaganda musulmantiyê da, ci ku êzdiyê û koka wan va girêdayî bûye wan heram û încar kirine. Di dîrokê da mînak pirin, ku ji pey qulibandinê ra kurd bêtir koka xwe dibin malbetên ereba yê navdar va girê didin.

Di gor çevkaniyê nivîskî, zargotinî û bîranînê mezinan, vê mîrgeha Ezdiyan heta nîvê sedsala 19 an jî heyîtya xwe xweyî kirîye. Salê 1820-1850-î, li vê mîrgehê eşirêne Xalta yên mezin: Qizilî, Niqîbî, Xendeqî, Anqosî, Berekî bi kom, jîyane. Mîrzikê Zaza, mîrê quesra Ridiwanê, serokê Qizila mezinayî li wê heremê kirîye. Pêra jî lêkolînê dîrokî derdixine holê ku êl mezin bûye û herem li nav axa- beg û serekeşîren fêodal da parevekirî bûye. Hevgirtin û tifaqa navxuyî ya xurt jî tune bûye. Malmezina Bereka: mala Çelikê, Niqîban: mala Zoro bûne, malmezina Anqosyan mala Salihê Sehdo axa, lê navdarê wan Şêx Mîrza bûye. Xendeqa eşireke xurt bûye. Demêna cuda da malen zengîn e xurt xwe dane pêş, lê malmezin yan maleke deshilatdar, ya eyan e usa, ku navê wê bê bîranîn, nî ne.

Li heremê xêncî Ezdiyan usa jî hesavekî ne kêm Ermenî, Kildanî hebûne, kîjana hukumdariya Mîrzikê Zaza pejirandine û roleke mezin di bûyarêne wan sala da lîstine..(2)

Wan salan geleb bûyarêne girîng heremêda pêk hatine, wek qetiliyama herd gundêne Ezdiyan: Delana jorin û ya jîrîn, şerî Erenza Şêxa, êrişen Reşît paşa û Hefiz paşa li ser heremê, qetiliyama Anqosyan û hivd.

Ji pey wan bûyaran dewî li hukumdariya Xaltan û mîrgehê tê. Esîrên êzdiyan, hinek ci û warêne xwe dihêlin direvin nava Ezdiyêne Şêxan-Şengal û Serhedê, yên mayîn jî heyîtya xwe der-dorêne bajarêne Sertê, Batmanê, qeza Qurtelanê, Erûhê, Bişêriyê didomînin.

Li bin zor û zulm, helandinê da çiqas diçû hesavê Ezdiyan li heremê kêm dibe, govek li wan teng dibe. Salê hefteyî, yanê ji vir 35-40 sal berê, Ezdiyêne mayî jî, bi mecbûrî, ci û warê kal-bavêne xwe berdidin, derbazî Ewropayê, xazma Almaniyayê dibin.

Di derheqa bûyarêne salêne jorgotî da gelek belge, salîxi, çîrok mane:

-Nemê mîrê quesra Ridiwanê Mîrzikê Zaza ji serlekêre dewleta Rûs, gênerâl-feldmarşal, Koms İ.F. Paskêvîç ra.(3)

-Salixî û bîranînê arxivolog û diplomatê İnglis Aûstîn Hêny Layard.(4)

-Salixyên nivîskarê Ermenî wê demê, kordzan, Xaçatûr Abovyan. (5)

-Çiroka folklorî ku zarnivîsê Ermenya yê sedsala 19 a Garêgîn Sirvanzyan ji zarê çirokbêjan nivîsyê û paşê berevoka xwe ya zargotinî "Hinos yêv noros"(kevin û nu) da weşandye.

-Kilam û çîrokên folklorî yên kurdîye gelêri. (6)

-Bîranînê mezinan. (7)

Di dor nemêne jorgotî û bûyarêne wê demê gelek belge hatine weşendin, nivîsskar û zanyaran berhemêne xwe da ew bûyar kêm-zêde nirxandine û lêkolînê zanestî hatine kirin.

- Li nîveka sedsalya 19 an, amadekerên berevoka dokûmêntan, ya pircild e bi navê "AKTÎ" da, (cilda 7 a) nema Mîrza axa bi zimanê rûsî çap kirine.(8)
 - Zanyarê Rûs, P.Î. Avêryanov, sala 1900 î, ew neme di pirtûka xwe ya bi navê "Kurd di dema şerên Rûsyayê, yên dijî Îranê û Tûrkyayê, sedsalîya XIX pêkhatine" çap kirye. (9)
 - Zargotinvanê Kurd Hecîyê Cîndî lêkolîna xwe ya bi navê "Pismamtya gelên Ermenî û Kurd di nava zargotinê da" (Hecîyê Cîndî,) Pismamtya gelên Ermenî û Kurd di nava zargotinê da", bi zimanê ermenî, Yêrêvan-1965, ru. 31-32. û romana "Hewarî"(10)
 - Dr. Prf. Celîlê Celîl "Rûpelek ji peywendiyêñ Ermeniya û Kurda yên dîrokî-çandî", bi zimanê ermenî, berevoka "Welat û gelên Rohilata Nêzik û Navîn", cilda 13, Kurdnasî, Yêrêvan, 1985, r. 93-108. Rojnema Hêvî, Nr. Nr. 120; 121. Di Pirtûka Prf.Celîlê Celîl " 13 rûpelên balkêş ji dîroka gelê Kurd" "Rûpelek ji peywendiyêñ ermenya û kurda yên dîrokî çandî.", bi zimanê kurdî, Wiên 2002, r.5-17. (11)
 - Di lêkolîn û nivîsên xwe da Hecîyê Cîndî, Casimê Celîl, Xalit Çetoeyv, Ordixanê Celîl, Karlênenê Çaçanî, Wezîre Eşo, Kemal Tolan, Pîr Dîma û gelekên din kêm yan zêde besa vê bûyarê kîrinê. (12)
- Di nava wanda lêkolîna Celîlê Celîl, di warê zanyarî, kûrayî û goveka ronîkirna pirsgirêkava pirr giranbiha û hêjaye.
- Lê qelsaya lêkolîn û nivîsarên wan teva jî ewe, ku bi dengekî gişka kesayaty Mîrza axayê Êzdî Şêx Mîrza, Şêx Mîrzayê şêxê êla Anqosiyava girê dane.
- Lêkolînên meye vê dewyê li nava Êzdîyên Kurdistana Bakûe da, girtugoha vekirî (rojnema HÊVÎ da) bi Prof. Celîlê Celîl ra derxistin holê, ku xweyê wan nemên dîrokî, xweyê kela Ridiwanê Şêx Mîrza nîne. Bi ïzbatyan û melûmetya em hatine ser wê zanebûnê, ku Mîrza axayê Êzdî, Mîrê kela bajarê Ridiwanê, xweyê nema Mîrzikê Zaza ye. (12) Eger xwendevan dixwezin derheqa wan bûyatên dîrokî û Mîrzikê Zaza da berfire zanibin karin berevoka xudanê vê gotarê "Êzîdiyatî, Mîrzikê Zaza û Fermanên reş" bixûnin.(13)

Mîrzikê Zaza

Wî wextî serokeşîrê Qizila Mîrzikê Zaza xweyî û hukumdarê wê herêma bûye. Mîrzikê Zaza evdekî dema xweyî zane û têgihîşî bûye. Melûmetî û salixyên di dor wan bûyaran, ku gîhiştine me, hîmlî navê wî hukumdarî va girêdayî ne.

Malbeta Mîrzikê Zaza malbeteke kurdên Êzdî, ya kevne. Dîroka vê malbeta desthilatdar ji kî wextî dest pê kirye tu belge, ïzbatî yan bîranîn nînin. Tek eyane, ku berî Mîrzik, apê wî Zaza axa serekeşîrê heremê bûye. Mîrzik lawê Zaza nîne, lawê birayê wîye. Navê bavê Mîrzik Hesen bûye. Ji pey mirina birê ra Zaza axa gelek neheqya li zarê birayê xwe

dike. Mîrzik, birayê xwe Bedo, tev dayka xwe idara xwe bi rîncberyê dîkin. (14)

Dema Zaza axa dimire, axayê wê heremê yê cînar: mala Zoro axa, mala Çelîkê, mala Ferhoyê Hîzîr axa û hinek serekeşîrên kurda yê din (Êzdî û Musulman) li hev dicivin, ebakî axatiyê hildidin, têne Ridiwanê, dîwana axê, ku dewsa axê mirî eba li lawekî wî kin û wek axayê nû elamkin. Wê demê çar lawê Zaza axê hebûne. Tê xanê ew ewqas jêhatî û zîrek nî bûne. Wê demê Mîrzik 19-20 salî bûye, xortekî serwextî, jêhatî. Dema dibîhî axayêñ cînar, malmezinêñ Qizila û eşîrên êzîdiyan hatine li dîwana apê wî da hev civiyane, dayka xwe ra dibêje: "Ezê jî herim dîwana apê xwe." Dê dibêje: "Herî-neçî, yeke. Kê guh bide te. Tê dîsa ew Mîrzikê golikvan bî." Mîrzik radibe diçe dîwanê, lê dinhîre axa û mîvanê hazir rûniştine, ebayê axatiyê danîne wê navê, kes li ber nîne, kes ser ebê da jî naçe. Silavê dide hazira, radhîje eba û xwe dike, dibê: "Ez axa me !" Hazir tev çevê hev dinhîerin, dibêjin: "Axatî hema bira vî ra be, evî jêhatîye û jî vî çêtir nîne. Ev jî bira bive serokê Ridiwanê."(15)

Mîrzik navê apê xwe jî xwe ra dike paşnav û usa dest bi desthilatdarya Mîrzikê Zaza dibe. Nav-dengê wî heremê da bela dibe. Dest bi çêkirina qesra xwe dike. Xelqê wê heremê mecbûr dike, ku bi torba xwelyê bînin, li cîyê çêkirina qesrê rokin, wekî cî bilind be. Gilî dîkin, ku tiştekî ecêb hatîb çêkirin. Rêyê dizîva hebûn, ku diçûn digîhîştine ber çêm, ku dema dijmin dor wan bigirin, karîbin avê jî çêm hîldin, rê hebûn, ku karîbin dizîva ji qesrê derên birevin. Li bin qesrê da zêrzeme (hebs)hebûye. Usane pirs û pirsgirêkên xelqê mîrgehê bi destê wî hatine safikirin. Xerc û xerac ewî daye hev. Girtin, cezakirna xelqê jî destê wî bûye. Çawa melûmetî nîşan didin, dema wî da li nava binelyê mîrgehê, yê Kurd, Ermenî û Aşûrî da tifaq, edlayî û aramî bûye, qedirê hev zanibûne, neheqî kesî li kesî nekiriye û tev di gura Mîr da bûne.(16) Di bîranîna da tê gotin, ku navbera wî û serokeşîrên Kurdên musulman yê wê heremê jî xirav nî bûye, heta ew û mala Dewrêş Nebî jî kirîvê heve xûnê bûne.

Di nema, ku wî serleskerê dewleta Rûs Pasêvîçra şandîye dimivise, ku dikare 1500 sîyar û 5000 peya derxe meydana şer. Her mîrxwesekî wî jî kare dijî sisya şerke. "... Bi saya Xwedê sed sîyarê min dikarin dijî sêsid sîyarê Osmaniya derkevin."Bi gîlkî dema wî da ew mîrgeheke Kurdên Êzdî ya here hevgirtî,serbixwe û xurt bûye. (17)

Heyîtiya mîrgeheke Êzdîyan, ya bi hêz e usa, ne dewleta Osmaniye xweş hatye ne jî deshilatdar û serokoldarêñ Kurdên musulman, yên fanatîk.

Li ser hîmê lêkolînên dûr û dirêj (salixyên nivîskî, zargotinî, kilam, bîranîn) ku gîhiştine me em hatine wê zanebûnê, ku bûyatên njara gotinê destpêka sedsala 19 - an li deşta Bişêriyê qewimîne. Naveroka bûyaran bi kurtî wa bûye:

Komkujiya Dela

Dela du gundê nêzîkî hev bûne. Gundekî ra gotine Dela Paşo, ya din ra Dela Qaso. Êzdî bûne, feqîr ji qebîla Niqîba. Malmezina Niqîba berê da jî mala Zoro ye. Wê demê ew gundana di bin bandora wê malê da bûne yan ne, eyan nîne. Mala Zoro li gondê Zivingê da mane, ew jî weke 5-6 km ji Dela dûre. Ciyê Dela berçem e. Çemê Xerza (Ridiwanê) li ber wan ra dikşê, diçe digihîje milê Diclê. Çemekî pirav e. Alîkî çêm Dela bûne, aliyê din zîyareta Şêx Evinda.* Dela û Qubîn weke 3 km ji hevdu dûrin. Eyane, ku dema komkujiya herd gundên Dela, eşîrên êzdiyan yên li wê heremê: ne mala Zoro, ne mala Çelikê, ne jî Mîrzikê Zaza neçûne hewara Dela. Kilamê da wa tê gotin:

Sîno digo:

*Emo lawo de Delan e, Qasim lawo de Delan e,
Lê, lê Rewşê mala bavê şewitîyê Delan e,
Delana Paşo bişewite li serî dûman e,
Ezê hewar dikim, hewar nayê, wê
Li jorê hewara me Xweda ye, wê
Li erdê tu kes bi hewara me nayê,
Minê hewar kiriye mala Mehmûdê Çelikê, wê
Ewê hatine li ser girê Merê, xwe dane li ser darê rima ne, wê
Minê hewar kiryê mala Mîrzayê Zoro axa,
Ewê hatin li ser girê Qereçîlê, xwe dane li ber berojka ne, wê,
Ecêba mezin di diniyayê da ew ecêbe,
Eskerê mala Derêş begê eskerekî girane, wê
De dayê rebenê, lawo minra xweyîne, wê
Çawa xwerzî hewara xala nayên, lawo, lawo...*

Şêx Qasimê ji mala Dewrêş Nebî komeke mezin musulmanên fanatîk, talançî li xwe dicivîne, têñ davêjin li ser wan herd gundên Êzdiyan, jin, zar, kal, pîr, zilam teva qir dikin, talan dikin, dişewîtinin, diçin.

Mala Dewrêş Nebî ji Şêxên Qediriya bûne, şêxên musulmaniyê. Navê gundê wan Têlan bûye. Ew ji Dela wek 20-25 km dûre.

*Hey lê dayê Delane, hey lo bavo Delane,
Pêsiya malê me şere, paşa malê me ferman û talane, lawo,
Dewrêşê mala Dewrêş Begê serê Êzdiyan jê kirine, laşen wana
Di ava çemê Ridiwanê da berdane.
Ezê ne ketime ber heyfa kuştina mîran, ezê dikevme ber wê yekê, wê
Ta, bala xwe bidê, xorîn Êzdiyan serê xwe rihîna dînê Êzdi da dane,
wê...*

Ew komkujiya seva ci bûye, sebeb yan nakokî di navbera herdu aliya da hebûne yan na, îzbatî negiliştine me. Kilama û melûmetiyê nivîskî da jî wê derheqa tu menî nayê gotin. Min jî çiqas ew bûyar kolan û pirsî tu

sebebekî usayî girîng nedît. Rû va eyane, ku sebebê komkujiyê dîndijminatîye yanê hev qebûlnekirin, temûlnekirin e, şerê dijîtiya bawariyê û fanatîzma olê bûye.

Bi texmîna min bingeha komkuji û fermanen dijî Êzdiyan da menî û sebebên kûre bingehîn hebûne. Neyarêن gelê Kurd ew komkujiyên Kurdan bi destê Kurdan dane çê kirin, ku neyartê bikine nav kurdan, nehêlin tifaq û yekîtya wan çêbe. Gelo ew oldarêne kurde gewre yên fitwe ji bo fermanen Êzdiyan nivîsîne, ew fikira dagerkiran tê derxistine? Ez bawar nakim ewqas nezan bûne. Wan bi zanebûn kara gelê xwe qurbana ola xwe kirine.

Melûmetiyê nivîskî didine kivşê ku sebebekî komkujiyên Êzdiyan (ya here sereke) talankirin û bi milk û malê Êzdiyan zengînbûna hukumdarên dewletê û dîndarêne musulmaniyêye deshilatdar bûye.(18)

Berê jî min got, ji êlên Êzdiyan tu yek neçûne hewara Dela. Gelo ji bêtifaqya Êzdiyan ya navxweyî bûye? Pê nehisiyane? Tirsyane? Yan sebebne din hebûne?

Bi texmîna min Êzdiyan bawar nekirine, ku cînarêne wan, tev kîjana dost û kirîv bûne, çûyîn-hatin, kirîn-firotana wan tev hebûye, kurrê bavê hev bûne, ça gel dibêje.“Eşîr bavê eşîrê ye“ wê usa bê sebeb rabin, komkujike wî teherî pêk bînin.

Ya duda, komkuji dizîva û nişkêva hatiye amadekirin, ne bineliyê Dela, ne jî eşîrên Êzdiyan ji bo xweparastinê hazir nîbûne. Yan na, usan rehet qelandina Dela ji wan ra lihev nedihat.

Ya sisya nexwesitine pevçûna navbera hinek evdan yan gundan welgere, bive şerê dijîtiya olê. Zanibûne, eger bive şerê dîn, Kurdê musulman, Ereb, Tirk, Ecem, dewletê ra wê dijî Êzdiyan bivine qewatekê û bajone ser wan.

Dibêjin, niha dewsa wan herd gunda qet nayê xanê. Mirov texmîn jî nake, ku wextekê li wur şen hebûne. Dewsa wan zevî ne, cot dikin, pembû diçînin. Lê komkujiya Dela ji bîra ewleda naçê, ew bûye birîneke êş, ya bêtifaqiyê, birakujîyê, hovîtiyê û ketiye rûpelê dîroka gelê Kurd. Heta niha jî Êzdî bi keder navê Dela dibêjin, neletê birakujîyê, bêtifaqiyâ Kurda tînin.

Şerê Erenza Şêxan

Heyîtya mîrgeheke Êzdiyan, ya usaye bi hêze, ne dewleta Osmaniye xweş hatye ne jî serokeşîr û oldarêne fanatîk yên Kurden musulman. Dema gundên Dela diqelinin, dibînin Êzdiyan dest ji ber xwe hilnedan, pişta hev negirtin, wan jî bi rehetî him *cihadâ* xwe, ya îslâmî pêk anîn, him jî talanekî xurt birine malê xwe, vê carê berê xwe didne Ridiwanê, êla Mîrzikê Zaza, ya wê demê here bi xurt û heremê da desthiletdar. Rind zanibûn şikînandina Ridiwanê, şikînandina temamya êzdiyên Xaltî ye. Ji bo êrişa li ser Ridiwanê menî çê dibe, (yanê meniyê ew bi xwe, ji xwera çê dikin).

Çendekî ji pey komkujiya Dela ra, mala Dewrêş Nebî çend qantira didine ber du yan sê feqeyên xwe, dişinîn cem Mîrzikê Zaza, ku bi deynî çend bar arwan wan ra bişîne. Anegorî bîranîna (êzdiyan) Mîrzik, meremê şandina feqeyan tê derdixe, mirovên xwe wan ra datîne, dişîne gundê Cimsarîyê, ku barê wan dagrin û feqa bêqeziya paşda verêkin. Lê feqe nagîhîjne cî, li dema vegerê hersêk jî têne kuştin. Kê wan dikuje ne eyane. Bîranîna da çirokek hatfîye xweyîkirin, serecema çîrokê eve: cem feqeyan kitêba dînê musulmanyê ya pîroz Quran hebûye. Giva dema Êzdî dixwezin wan feqeyan bikujin, ew wê kitêbê da dinivîsin.”Êzdî yê me bikujn.”. Êzdiya jî, ku xwendin nizanbûne, bi nezanî wê Quraê dibin li bajarê Sîrtê difroşin. Yê, ku Quranê dikirin, wê nvîsara feqeyan dixûnin, cawê didine mala Dewrêş Nebî, ku kujarê fwqeyen wan Êzdîne.

(19)

Dijwar nîne mirov tê derxe, ku kuştina feqeyan da girêfûtûk û pirsên teri hene. Ji bo evdê here sade jî femdariye, eger Êzdiya feqe bikuştana wan Quran usa zû nedibirin bajarê musulmanyê bo frotanê, we bifikiriyana: “Dibe Quranê naskin û sura wan bihesin.”

Dibe Êzdiya jî feqe kuştibin. Ji aliyê êzdiyan va kuştin, nekuştin feqeyan meselê da tu tişti naguhere, xeta xar li bin mala Dewrêş Nebî dane. Wan rind zanibûye, ku ji komkujiya herd gundê Êzdiya-Dela, hela çendek derbaz nebûye, xûna evdên bê sûc û gune hê zîha nebûye, neyartî ketiye navbera wan û Êzdiyan, agirê kîn û neyartîyê gure. Vî halîda eger fikira wan qelpî nîbûye çawa feqeyê destevala, usa bi hêsanî dişînîne li nav Êzdiyan? Yan çîma feqe şandîne? Ji kîjana,çawa oldarên musulmanyê, yê here cahil e fanatîk, Êzdî a'cizin.

Bi texmîna min hema bi wî meremî jî feqe şandîne, ku Êzdî wan bikujin û menî ji bo fermanê, hucûmkirna li ser Êzdiyan çêbe.

Usa jî dûrî bawariyê nîne ew fikir, ku feqe ji aliyê mala Dewrêş Nebî yan dewletêva bi zanebûn hatibin kuştin, ku qetilkirina wan bavêjin li ser Êzdiyan. Dibe tu kuştin jî tunebiye, çiroka kuştina feqa û firotina Quranê çê kiribin? Dibe mala Dewrêş Nebî dewletê va girêdayî bûne, ku ji bo fermaña Êzdiyan konfiliktê çêbikin?

Çiroka kuştina feqa, ku usa hûr, dûr û dirêj hatiye hûnandin û bîranînada hatiye xweyîkirin, li bir rexnê here sade teyxak nake...

Çi jî hebe konfiliktê çê dîkin, agirê “dîn dijminatîyê” “gur dîkin û Dewrêşê (Qesim) mala Dewrêş Nebî dikeve li nav “mirîdên” xwe, ordîke giran (devedevî 30-36 hezarî) dicivîne û têna dora Erenza Şêxan (nêzîkî Ridiwanê) digrin.

Stiranê da wa tê gotin:

*Rindê digo: Edlayê,
Erenza Şêxan bişewite bi darê tere,
Erenza xopan bişewite bi darê tere,
Hesabê Cibo hatye ji kela Rimêlê, bi teví şêxên Ereban û eskeran,*

*Eynikê, Eyndwarê, Eynkafê, Eynbaranê,
Çiqas hecî, sofîyên Xerzan, Xiya û Bekiran hemû anye bi xwe ra. (20)*

Ji naveroka stiranê dijwar nîne bê têderxistin, ku ev sera ji aliyê dewletê û merkeza dîndarêne musulmaniyê va hatfîye organîzekirin û rêvabirin. Di nava êrîşkarê li ser Erenza Şêxan “Şêxê Ereban û esker” hebûne. Piranî jî dîndarêne fanatîk bûne: “Çiqas hecî, sofî, feqe...hemû anîne bi xwe ra.” Usane gelê musulmanî sade yan teví wî şerî nebûne, yan jî pirr bi kêm li nava wê ordîya zalim da cî girtine.

Di bîranîna da, usa jî tê gotine hinek axa-begêne Kurdêne musulman yên wê heremê, navbera kîjana û Mîrzikê xweş bûye, bê alî mane, neketine li nav wî şerê birakujiye.(21)

Mêrxwes û serokê êrîşkaran Hesabê Cibo bûye. Hesab evdekî sade, yan egîtekî gelêrî nîne, ew serlekerekî dewletê yan jî çekdarekî eyan bûye. Evdêne sade, yan mîrxwesê gelêrî nikarin cîle zirîkirî xwekin û şerkin. Hesabî zirîkirî bûye. Çirokbêjên Êzdî dibêjin Hesab bi eslê xwe Erebe. Zargotina Ermeniya da jî dewsa navê Hesâb, navekî din.”Hakimê Bota Mîr Mehmûd” tê gotin û tê zêdekin, ku ew mîzne eşîreke Cizîra Bota bûye.(22) Kilamê da wa tê gotin:

*Edlayê digot: Nûre, xweya minê, Esabo Ronî,
Min go were meke,
Tu bi xebera sofî û, feqe û, melayê ber ava Bota meke,
Neçe şerê Erenza Şêxan, Ridiwana bavê Temo, Mîrzikê Zaza,
Şerîn giregirê Êzdiyan, yê Mîrzikê Zaza,
Keleşê Çilo, Gersemê Giro, Éganê Meyro, Miçoyê mala Şêx Îsayê ne
heneke...*

Ev stirana li ser zarê herd jînên Hesabê Cibo hatye gotin. Cûrê sitiranê jî hewaskare. Di nav zargotina kurdaye gelêrî da sitiranêne bi vî teherî degme rast tê. Sitiran bi zarê pîrekên Hesâb tê gotin. Êzdî bi devê êrîşkara neheqya wan, heqî û altindariya xwe distirêne. Sitiranê da axîn û keser heye, poşmanî heye ji bo wî şerê birakujiyeyî bê fikir û bê merem. “Hesabo Ronî min go were meke, tu bi xebera sofî, feqe û melayêne ber ava Bota meke, şerê giregirê Êzdiyan ne heneke.” Ji van rîza va jî tê xanê, ku rêvabirê êrîşê hîmlî oldar û leşker bûne.

Pirsa kesayetya Hesabê Cibo, ew Ereb bûye, yan kurdekî ji Bota bûye di vê nuxtê da ne pirsgirêka sereke nîne, ya sereke ewe, ku ew leşker bûye, leşkerekî perwardekirîyî payebilind. Usane ev sera pevçûneke gelêrî, yan êrîşa komeke fanatîk, bi je'ra olê korbûyî nîne, ew ji aliyê hukumdara va hatiye hazirkirin, leşkerê dewletê li nav wan da hebûne u ji aliyê leşkera va hatye serkaeîkirin, rêvabirin.

Em bêne li ser hesavê êrîşkaran. Gelo,ew gotina “Eskerê giran”, ku bîranîna da tê gotin, raste?

Çevkaniya Ermeniya da we hatiye nivîsar: „Dewrêşekî mar (yanê kurd, E.B) bi navê Nebî li Baxışê (Bitlîsê, E.B.) (li şenlika Ûsîl-Giranê) dima, wî xelqê xwe karoz (şîret) dikir ku bi zorê xelkê ne musulman bînin ser ayîna dînê îslamê. Û, awa, sala 1820-î, ew bi serkariya hakimê Bhotanê Mîr-Mehmed, bi 36 hezar eskerava êrîşê teşkîl dike dijî Êzdiyên Sixîrdê (Sérte, E.B.) , Ridiwanê û Ermeniyan.”(24)

Sitirana gelêrî da derheqa hesavê êrîşkara da hevoka wa tê kêranîn.“Eskerê Dewrêşê mala Dewrêş Nebî girane.”

Rastîya pirrbûna êrîşkaran ew şikêrên (quçen) keviran e, ku heta niha jî, çawa heykelê reş, şedê wê bûyara birakujiyê li cîyê şêr dimînin.

Hemzoyê Xalit bîranîna xwe da wa dibêje:”Ne min tenê, geleka dîfîye. Tawîsî Melek me tava ew şikêrê kevira dîtine. Du şikêrin. Yek ji vê odê bilindtire, ya din quçeve biçûke. Gava (êrîşkar) hatine li ser Êzdiyân, her yekî kevirek bi xwe ra anîye, avîtye tanga cîyê şêr. Kevirê mezin jî nînin. Gotine em van kevira bîvin, cîkî quçkin, çîka em çiqasîn, gotine me şer qedand, bira yê sax mayî, her yek dîsa rahîje kevirekî, emê bizanbin ji me çiqas hatine kuştin.” (24)

Xêncî Hemzo jî, yênu ku ew şêkêrê kevira dîtine dibêjin, ku quçek pirr mezine, yek jî biçûke. Ya mezin kevirê wanin yêş da hatine kuştin, ya biçûk jî hesavê wane yêş sax mane û revîne.

Ev mesela kevira carke din jî dide ïzbatkirin, ku bi rasti jî ev êrîşa ya gelê sade, yan fanatîkên dîndar nîbûye. Di dîroka şera da, ku hesavê undayêن xwe bizanbin, serleşkeran pirr caran ev çurê kevira pêk anîne. Usane serokê vê êrîşê zanekî şêr bûye.

Ew “ordiya” giran, li bin ala musulmâniyê da tê dora gundê Êzdiyâ: Erenzê digre. Binelyê gund hîmlû şêx bûye, loma gundra gotine Erenza Şêxa. Ew nêzîkî Ridiwanê ye. Dema li Erenzê sîlih teqandine, Ridiwanê dabihîstine.

Êzdî tê derdixin, ku ew şera yê mirin-jîyanê ye. Eger qewatên Dewrêş Nebî serkevin, ji wan kesekî sax nahêlin, wê wana jî wek Ezdiyîn Delana teva devê şûr ra derbazbikin. Nakokî, dijminaiya di nav xwe didin alîkî, mîna merivekî radibin himber êrîşkaran. Êzdiyâra tevayî usa jî xelqêن xaçparêz radibin. Dest bi berxwedaneke mezin dibe. Weke 10 hezar evdêne ne ewqas pak sîlihîrî, derdikevin dijî 30-36 hezar leşkerên şêr ra hazır.

Him stirana, him jî bîranîna da bi navê Mîrzikê Zazara tevayî usa jî navê gelek mîrxasên Êzdî hatine xweyîkirin. Kilamên kurdaye mîranyê vî teherî da himlî navê mîrxwesekî, ew jî bêtir navê axa, beg yan oldarê navdar tê gotin. Lî vê kilamê da ji nave Mîrzik bêtir derheqa mîraniya egîten êlyê din: Keleşê Çilo, Êganê Meyro, Kesîş Polo, Geşhemê Giro, Miçoyê mala Şêx Îsayê, Erfanê Qizilî tê gotin. Hela li ser mîrxwesya hineka sitiranêna başqe hene.(26)

Di derheqa vî şerî, gelek çîrokên hewaskar di bîra ewleda da mane.

Êrîşkara dora Erenzê girtin e .Mîrzik li Ridiwanê, qesra xwe da bêsebir, nizane ci bike. Keşîşê Ermenî yê remildar Êncîl vekiriye, dixûne û dibêje : “ Sebirkin, niha dest bi şêr nekin. Berê qulbê ber bi dijmin e. Hema we dest bi şêr kir dijminê we biqeline. Hîviyê bin heta roj vedigere. Dîna we lê be, eger teyreekî sipî hat li serê qubê goristana mala mîr danî, serbest lêxin, serketin ya we ye.”

Bi gotina gotiya, di pey demekêra, teyrê sipî tê li serê qubê datîne. Keşîş dibê, de îcar rabin, lêxin, serketin yameye !

Wê demê çek hîmlî rim, şûr û mortal bûn. Tiving pirr kêm bûne.

Çawa kilamê da tê gotin serokê êrîşkaran Hesabê Cibo bûye. Hesab xweşmîrekî pir xurt, şerkarekî cêribandî û zirîkirî bûye, çek-sîlihê wê demye sade zirîyê wî da neçûne. Hespê wî jî, go, ecêb bû, meydana şêr da kê dikete ber, siyar bûya, peya bûya, dixeniqand, di bin lingê xwe da pêpez dikir, dukuş. Go Hesêb gava meydanek li nav şêr da dida, laşê meriva li ser rîya xwe redixist.

Xweşmîrê ezdiyân bas zanin ku berxwedaneke pirr dijwar hîviya wane. Avê berî li ser erdê dora Erenzê û Ridiwanê didin. Dixwezin Hesab hespê wîva bikşînine nava erdê avdayî hezek û di navda bi cûrekî qelskin. Êganê Meyro zilamekî pirr gewdeyî giran, pêra jî siyarekî bi hêz û jêhatî bûye.

Hespa Êganê Meyro mihîn bûye, mihîn jî bi fel bûye. Dema Şêr Êgan bi zanebûn mihîna xwe nîzîkî erdê avdayî ra dajo. Hespê Hesêb xwe mihîna Êgan ya fel digrê. Hesab hespê zevt nake û hespêva dikeve hezekê. Êgan jî bi zanebûn mihîna xwe dajo nêzîkî Hesêb, para va banz dide li ser pişta hespê wî, wî qepeçe dike, ji hespê tîne xar, qelşa ziryê ra bi rimê lê dixe, Hesêb dikuje.

Çevkaniya Ermeniya da di derheq şêr wa hatiye gotin: „Û rûyê hevketina herdu aliya û ji agirkirina sîlihê bê hed û hesab rûyê royê hate girtin...“

„Gele sehetê dirêj wa derbaz bûn û ne aliyê altbûyî dihat kivşê, ji bo mîrxwesiya alîkî û pirbûna aliyê dinê beramberî hev derdiketin. „Û vê dema here giran sereskerê ordiya Bohtanê Mîr Mehîmûdê mîr, wî mîrê zorî, zorbe, hespa xweye kihêl rikêf kir, ji sîrî heta pîya reşxana hesinî (zirî) wergirtî, rim dêst da, pêşda sefer kir û rast û çep gelek ji aliya Ermenî li erdê raxistin û bi xwe jî silamet gîhîste wê tangê, li kîderê Mîrzik bû....“

„Têr-Poxos li pey xwe nihêri û çaxê dît, wekî şuxulê Mar (Mîr Mehîmûd) ewqas açixe û ew ewqas pêşda çûye, evê te ajot, xwe lez pêra gîhand û parava ji hespê xwe banzda ser pişta hespê sereskerê Mara, parava bi destekî ew qepeçe kir, destê wî sîng va guvaştin, bi dstê dinê soranî (qeme) ji ber pişta xwe kişand û patka wî ra kir, xûna wî rêt û evê te ji ser pişta hespê jorda şiqitî erdê. Bi xwe jî (Têr Poxos) rima kuştî hilda, hespê wîyî bozî stukurdîrêş sîyar bû, zengü kir, mîna birûskê çû hewara Mîrzik, yê ku bi mîrxwesiya xwe, êdî digîhîste altindariyê. Ewê mayîn jî

aliyê Têr-Poxos va hatin qirkirin. Yê ket, hemin ket, yê revî, hemin revî...” (27)

Stiiran û bîranînê Êzdiya da xêncî keşîşê remildar, derheqa tevbûnya Ermeniya û mérwxesiya wan da tu gilî nayê gotin. Rastî ewe û çevkanî jî ïzbat dikan, ku wê demê jîyana vê mîrgeha Êzdiyan da Ermeniya rola girîng lîstine. Dibe bi zanebûn, Êzdiyan navê Ermeniyan bela nekirie, ku zyanê nedine wan, yan sebebê din hebûye?

Navbera Mîrzik û Ermeniya pir xweş bûye. Tê texmînkarin şêwrdarê wî hîmlî ermenî bûne.

Raste, çiroka Ermeniya ya jorgotî da jî mérwxesiya Têr-Poxos pîrr hatiye mezinkirin. Ew jî tiştekî xisûsi ye, ku bûyar bi cûrê çiroka gelêri (hikyat) hûnandin. Çirokbêj, ku çiroka wî hewaskar bê bîhîstin û hukumî li ser guhdara bike tim jî méranya agitê çiroka xwe mezin dikan. Ya din jî ewe, ku her krs dixweze kirina civaka wî mezin bê xanê.

Gelo Hesab ji aliyê Êganê Meyro yan aliyê Têr-Poxos va hatiye kuştin? Bi texmîna min ew ne mihûm e...Dibe Êgan jî bi eslê xwe Ermenî be. (Çirokbêjê Êzdî dibêjin ew pîre, pîrê êzdiya). Navê Meyro navê Ermeniya ne. Navê Yêgan jî li nav ermeniya da heye. Raste, jî vê fikira min ra çirokbêj û stiranbêjê vê bûyarê qayîl nînin, lê ew jî nikarin dijî vê fikirê şedetîke bingehîn jî bînin.

Stiranekê da jî tê gotin, ku Miçoyê mala Şêx Îsa Hesab kuştîye:

*Ezê bi Erenza Şêxa dketim bi tereye,
Eskerê Hesabê Cibo girane, girtîye dora Erenza Şêxa çar ewleye,
Sede-sûdê Miçoyê mala Şêx Îsa gelek hene li diniyayê,
Dibêje."Min serê Hesabê Cibo, apê lawika, jê kirye bi destê
xweye..."(Kilama Hemzo)*

Êrîşkar dema kuştina peşîkêşê xwe yê “nealtbûyî) dibînin, tirs, saw û xof dikeve ser wan, xwe şaş dikan, çarçev dibin, rev li wan dikeve, direvin. Ridiwanîya ji her alya va hicûmî li ser wan dikan. Ji wî sîh hezarî teka-tûka xilaz dibin.

Kilamê da wa tê gotin:

*Edlayê digo: Hesabo hane, sedû bîst car bi min hane,
Bala xwe bidê xortê Qizilan, peyayê Niqîban şerê dizgînê reşboza
berdane,
Ajotine qûçika Ridiwana bavê Temo,
Derbekê lêdane li Hesabê Cibo, li apê lawika, li Cihê, li Mihê
Hevitê û pênc mîr ji konê bavê min, qelandine tovê xalan û xwerzî,
Belê apan û birazî, lo wî, lo, lo wî lo...*

Dibêjin ji xûna kuştîya ava çenê Ridiwanî sor bûbû, ewqas laşê kuştîya ketibûne çêm, ku berê çêm hatibû girtin. Li meyidana şer ewqas xûn rijya

bû, ku heft sala lê tişt şîn nebûye. Çevkaniya Ermeniya dîsa derheqa dewiya şer da, wenê bûyareke pir bi dilêş li ber me radixe: ”...ê revîn, li nava kijana da bûn tivingçiyê peya, xwe li gomê Sixêrdêra gîhandin, li wura sitar bûn, eskerê Mîrzik û Têr-Poxos dane dû wan, ew di goma da kirin nav hevsarê, dixwestin wana dîl bigirin...Lê ew teslim nebûn. Mîrzik emir kir agir bidine goman û yê staribûyî zêndî-zêndî li wur da şewitîn û bezê wan mîna rûn heliya û mîna cewa dikişya nava çêmê nêzîk û merivê hizûrê ev gişk dîtin...”(28)

Altindariya dijwar nav û dengê Mîrzikê Zaza, egîtiya Xaltîya û bineliyê Ridiwanê qezayêñ der- dor da bela dike. Hukumdariya Mîrzik, mîrê quesra Ridiwanê xurttir dibe.

Lêkolîna salixyên dîrokî em anîn wê bawariyê ku bûyarên jorgotî navbera salên 1920-1928 a pêk hatine

Nemê Mîrzikê Zaza serleskerê Rûs ra

Êzdî dijî êrîşkaran li wê fermana şerê birakujîyê da ser ketin, weke herd gundêñ Dela neqeliyan, lê dora wan, roj bi roj xeleqa neyartiyê teng dibe. Mîrê Ridiwanê texmîn dikir ku halê wan ewqas jî baş nîne. Ne hêza wan heye dijî qewatêñ mezin xwe biparêzin, ne jî karin ji kesî hevkarî û alîkarya mezin hêvîkin. Baweriya wî ji cînarêñ gewre: Mîrê Soran û hukumdarê Botan jî nedihat, ji bo wan jî bi çavê dîndijminatiyê Êzdiyan dînhêrin.

Şerê Tirk-Rûsa yê salên 1828 - 1829 - an, û wî şerî da serketina Rûsa çira gumana xilazbûnî li dilê Mîrzik da vê dixe. Di vê pîrsê da, bi texmîna me rola Ermeniya ya mezin hebûye. Bajarê Ridiwanê da jî gelek Ermenî hebûne. Navbera wan û Mîrzik jî pir xweş bûye. Ermenî jî bi aktîvî tevî şerê Erenzê bûbûn. Bêguman pevgirêdanêñ ermeniyêñ wur tev Ermeniyêñ herema şer hebûne, guhê wan li ser bûyaran bûye. Ýane, ku temamiya gelê Ermenî hêvîyê azaya xwe bi Rûsayêva girê didan.

Di navbera salên 1828 – 1830 û Mîrê Ridiwanê, dizîva, bi destê Ermeniya sê nema serleskerê ordîya dewlîta Rûs, ya Kavkasê gînêral – fîldmarşal, Koms Paskêvîç ra dişîne û dêwa hevkariyê lê dike. Lê bi sedemîn cûrbicûr her tişt bê encam dimînîn..

.Arşîva Gurcistanê ya dewletê, ya dîrokî da belgeyek (N 11 66) tê xweyîkirin, naveroka kijanê wa ye: “ Daxweza mamostayê Ridiwanê Pêtrôs Xazarov – di navê da nema Mîrza axayê Êzdi, ji bo şandina dermanê çeva”. Li ser wê belgeyî nîvîsare:

Destpêk: 2 ê meha Çileyê Paşin ya sala 1831 ê; dewî: 30 ê meha çileyê paşin sala 1831 ê. Di wan da çar belge hene.

-Daxweza mamostayê bajarê Ridiwanê Pêtrôs Xazarov ji serleskerê leşkerê Kavkasê yê sereke, gînêral-fîldmarşal, Koms Paskyêvîç ra, bi zimanê Rûsî, 22 ê meha çileyê pêşin, sala 1830.

-Nema Mîrza axê Koms Paskêvîç ra, bi zimanê Ermenî. 22 ê meha gulanê, sala 1830 î.

-Tercema nemê bi zimanê Rûsî.

-Şedenema Pêtros Xazarov, ku danê, wekî ew bê rewastandin li wê herema Rûsiyayê bikaribe aza bigere. Bi zimanê Rûsî..

Arşîva Rûsyayê da usan jî doklada gênêral-mayor Pankratiyêv derheqa cawa nema Mîrza axayê Êzdî ya duda û têksta nema Axêye sisiya têne xweyîkirin.(29)

Nema Mîrzikê Zaza bi zaravê êrmeniyê wê heremê hatye nivîsar, mora Mîr him destpêkê, him ji dewiyê heye. Wargera nemê bi zimanê Kurdi (kurmancî) eve: “Ji alyê qûlê Xwedê, Mîrza axayê Ridiwanê, gelek silav û kilavên dostaniyê ji leşkerê Îsayî altindar û xweşmîr, birêz Paskêviç ra. Wextê daxwez û nema min bigîhîje destê wî ji minra dema dilxwesiyê û bextewariyê ye,amîn!

Piştî, ji alyê evdekî ji te nenas û ne dîhar da dîharkirina silav û hizkirina, Paskiyêvîcê maqûl, serbilindî û hizkirîyê min, ez evdekî Êzdî me û gelê min jî biçûke:1500 sîyar û 5000 leşkerê mine peya hene. Agahdar be, disa iro, gava min besa hatina te li Patnosê bihîst, heta niha min nemek bi qasidekî tera şandibû. Lê te bersîv min nestandîye. Wê salê, dema leşkarê te ketine Patnosê, ez, weletê xwe va û henû xelqê Êzdî, Xaçparêz bi tevayî bi hatina te pir şâ bûn. Eva cara sisyan e ez nemê bi qasidê xwe ra dişnim hizûra te. Qasidê ewlin negihîstine cem te, xuyaye tirka rê da ew kuştine. Ez nizanim ci hatye serê wan. Gava min derheqa kuştina wan da bihîst, cara duda min ev meriv, navê kîjanî Kîrakos e, şand. (Dîsa wî dişnim) Ew jî hate Bazîdê cem Gênêral û ji wur jî tevî leşkerê vegerya Qersê, ji wêderê jî tevî hêzên te hate Erzirûmê. Bi alîkarîya Xwedê, we hêzê xwe civandin û bajar hildan. Qasidê min ne ziman zanî bû, ne jî nasê wî li bajêr da hebûn, ku xwestekê min bigîhîne te. Li nava leşkeren te da gênêralekî mezin hebûye, di nav teva da yê herî berbiçav bûye, qasidê min diçe cem wî gênêralî û gotinê min jêra dibêje. Ew jî nivîsarekê dide qasid û paşda dişîne. Gava ew vegeriya cem min, min neme stand, mora lê dît, pir kîfxweş bûm. Min gazî keşşa kir, ku bixwînin, nikaribûn bixwendana. Min tu xêr ji nemê nestand... Îcar cara sisya û cara dewî ye ez du kesên xaçparêz, yekî bi navê Kîrakos û yê dinê jî bi navê Pêtros dişnim hizûra te. Hey qedirmezin û sebilindaya min, dixwezim tu bizanbî, rast e bi gelê xwe va biçûkim, lê çavê Osmanyê da gelekî mezin têm xuyakirin. Bi saya Xwedê, sed sîyârên min dikarin dijî sêsid sîyârên Osmaniya derkevin. Ji ber wê jî Osmanî min dijminê xwe dibînin, ji bo ew rastî ye. Padşayê minî mezin, ez xulam, gerekê tu tê derxî nêta dilê min. Dîsa hezar şikir wê demê, ku dengê hatina te ya li Baxîşê, ku bi xwe Bitlîse, bigîhîje min, yan jî qasidê min vegerin û bêjin: hat. Wê demê tu li xulamê xwe mëzeke. Tu Rûsî mezin, ez jî wek gênêralek, serikî min heye, ezê wî serî jî bi qurbana te bikim. Ü temamiya gelê min jî mîna min bi hizkirin û bawarî... Bi destûra Xwedê saxî û silametî, amîn!

Careke din ez ji te hîvî dikim, bona xatirê hizkirna navbera me, bi kerema xwe qasidê min ra, îlacekî ji bona çevê kurê min bişîne.

Neme 22 ê meha Gulanê sala 1830 î.hatyê nivîsar.” (30)

Ji naveroka nemê tê xanê, ku ew neme ya sisiya ne Mîrê Ridiwanê: Mîrzîkê Zaza bi destê qasidê xweye ermenî serleskerê artêsa dewleta Rûs ra şandîye. Nema wîye ewlin negihîstîye cî. ”Nûnerên pêşyê negihîstîne te,xuya ye Tirka ew rê da kuştine. Ez nizanim ci hatye serê wan”-nemê da hatye nivîsar. Nema duda bi destê ermenîkî bi navê Kîrakos Arakêlov dişîne. Nemebir destpêka sala 1829 an digîhîje bajarê Erzirûmê. Koms Paskêviç li wur nîbûye, ew rastî Gênêral-Mayor Pankratiyê tê.

Di miqala xweye “ Rûpelek ji helaqetyê dostanya Ermeniya-Kurdaye dîrokîyê-çandiyê” da Prof. Celîlê Celîl dinivîse: “Ji minra liev hat arxîva Lînîngiradê ya dîrokê rapora gênêral Pankrêtiyê (12 ê yanvarê sala 1829 a), gênêral Paskêviçra, li ser ra rasthatina wî tevî nûnerê Mîrza axa peyda bikin. Raporê da dinivîse: “Van roja binelîyê kela Ridiwanê Gîrakos hate cem min. Ridiwan başûrê Sêrtê, rîya denekî dûrî Hezoyê dikeve, ewqas jî ji çemê Dicilê dûr e. Wî ji min ra nema Mîrza axayê Ridiwanê û Keşîş Hovhanîsê Ermenî anîbû, kîjan tirkan li Bitlîse jê standibûn. Evî Gîrakosî minra ev got.” Mîrza axa, usan jî temamiya Êzdî û Ermenî pir kîfxweş in, ku leşkerê Rûsa padşatîya Bayazêtê hildane û dibejîn, eger Rûs pêşdahatina xwe berdewankin, ewê bi xurtî xizmeta me bikin. Li bin hukumê Mîrza axa da du hezarî zêdetir malê Êzdî û ewqas jî ermenî hene. Ew dikare sê hezar peya û hevsid sîyarî derxe meydana şer. Serokatîya bajarê Sêrtê Taxî axa dike, kîjan di bin bandora Mîrza axa da ne. Du sal berê hukumata Tirka padşahê Dîyarbekirê guhestine û wê demê da hemû beglikên Dîyarbekirê yê serbixwe hukumdayra kesî nas nakin”. (31)

Ew gênêrala cawa nema Mîrzikê Zaza bi zimanê Rûsî dnivîse û bi destê wî qasidî jêra dişîne. Çawa ji naveroka nema sisiya tê xanê, telebextra, neme nexwendî dimîne. Axa usan jî pê nahise serleskerê artêsa Rûs ci cawa wî daya. Ça tê gotin wê êlê da yekî xwendin-nivîsara rûsî zanibûya tune bûye. Mîrzik jî amintîya xwe ewqas jî der-dora neanye. Wekî sura xwe goveka fire da veneke, nemê dîhar nekriye.

Ji naveroka nema jor gotî tê xuyakirin, ku helaqeyên êla Mîrzik û hukumdarên dewleta Osmaniye pir xirab bûne. “Osmanî min dijminê xwe dibînin.” Mîrê Ridiwanê rind zanibûya , ku Osmanî wê demê şerê dijî Rûsa va mijûle, ji pey şerra tevî kurdên musulman wê vegerne ser êla wî. Ji bo wê karê jî xwestiye ese rêya xilazbûnê êla xwe ra bibîne. Ü nema sisiya Rûsara rê dike.

Gelê Împératoriya Osmaniye li nava tariyê û şûndamayînê da bûn. Ne xwendin-nivîsara massayî bû, ne jî infotmasîya pêwîst. Ça piraniya gelên wê Împératoriye usa jî êlên Kurdan haj bûyarên cihanê tune bûn. Piraniya xelqê nizanbûn ne ku welêt, lê êlên cînar da jî ci diqewimîn.

Nema Axê Êzdî ya sisiya wê demê hatiye nivîsar, wextê bi peymana Adirâpolisê ya aşîtiyê (lihevhatinê) êdî ew çend meh bû dewî li şer hati bû.(14 ê meha IX,1829-ê salê.)

Ev neme dîsa bi destê nemebirê nema duda Kîrakos Arakêlov û mamostayê bajarê Ridiwanê yê ermenî Pêtros Xazarov tê şandin. Evan li bajarê Erzirûmê rewestandina şer dihesin. Tê texmînkirin, ku Mîrê kela Ridiwanê spartibû qasida ese gênêral Paskêvîç bivînin û nemê bigîhînin destê wî. Ji bo wê nîtê jî qasidê wî diçine bajarê Tilbîsê. Wê demê bajarê Tilbîsê li Kavkazê merkeza rêvabirya dewleta Rûs bû. Li wura jî nikarin wextê da Paskêvîç bivînin. Gênêral li wê demê çûbiye bajarê Pêtrogradê. Hîuya vegera wî dimînin. Di wê navberê da qasidekî Mîr:Kîrakos ji nexweşîya xolorê dimire. Qasidê din: Pêtros Xazarov heta meha Çileyê Pêşin li Tilbîsê dimîne, rastî Paskêvîç tê û nemê teslîmî wî dike.

Gênêral bi dilovanî û dostanî nemebir û nema Mîrzikê qebûl dike, qasid xelat dike û bê eglebûn cawê dide. Dîyarîkî Mîrzik ra û îlaca çava jî lawê wî ra dişîne.

Tu îzbatî nîne, gelo Serlekere Rûs bi nivîskî cawa nema Mîrzikê Zaza daye yan wekî nema nivîsar rêda nekeve destê dewleta Osmaniye bi devkî bersîva nemê qasid ra gotye, ku ew jî bi devkî bigîhîne Axê Êzdî. Bi texmîna min fikira axryê nêzîkî bawaryê ye. Menîke din jî hye, ku Gênêral bersîv dibe bi devkî dabe. Zanibûye, ku wê nemê jî wek ya duda nikarin bixwînin. Usan, dewî ji şerê Rûs-Tirkâ tê, Hêviyên Mîrzikê Zaza wî alî da jî dişkên.

Kuştina Mîrzikê Zaza û dewiya mîrgeha Xalta

Wê demê rewşa Împératorya Osmanyê him aliyê siyasî û leşkerî, usa jî di aliyê aborî va pirr dijwer bûye.(32) Împératorî bûbû mîna laşekî mezînî rizayî. Ji bo xweyîkirna hidûdan, tim bi dewletê cînarra nav pevçûn, şer û dewada bûye. Halê împératorye ne li Balkana, ne Kavkasê, ne jî sinorê tev Îranê va pak bû. (Şerê Tirk - Îranê yê salê 1821 - 1823; Tirk-Rûsaye 1828 – 1829 - a û hivd). Serhildanê mezîn li nava dewletê xwe da jî pêk dihatin. Fêodalên biçûk û mezîn hukumdarîya Sultân qebûl nedikirin. Serhildana hukumdarê Misrê: Mehmed Elî (1831 – 1832) hîmê dewleta Sultan hejand, ew mecbûr kirin gelek gevêن xwe paşa bavêye. (33) Mîrgehîn Kurdan, yên wek Soran, Botan ewqas qewat bûbûn, ku ne bitenê hukumdarîya osmanîye qabûl nedikirin lê êdî xwe çawa dewletê serbixwe elam dikirin.(13). Herba bi Rûsara ji bo Osmaniye bi undakirinê mezîn bi dewî hat.

Siyasiya osmanî ya wan salan, ku bi rîforman (tanzîmatan) karibe desthilatdariya xwe biparêze, tu encamên berbiçev nedidan. Armancêwan rîforman bûn, ku bi cûrên nûkirin, qewîkirine rêvabirya hukumdarîye, organîzekirina ordîyê, sistêma finansiyê û hinek mecalên din dewletê derxin li ser rîya kapîtalîzmê. Lê sistêma Împératoriye û rêvabirina sultaniyê mecal nedidan miäserkirna rîforman.

Ji pey li hev hatina tev hukumdarê Misrê, (sala 1833 a, 9 ê meha gulanê) û agirbesta tev rûsa Osmaniye ra mecal saz bûn, bi alîkariya şêwrdarê Ewropî “bi şur û agir ” berê xwe bidin Kurdistanê. Gund û bajar wêran bûn, bi seda hezar evd bi hovîti hatin qirkirin. Xelayê, nexweşîya, komkujiya welat dane ber xwe. Reşîd paşa, ji pey wî ra jî Hefiz paşa qetlîn usaye weştiyê Kurdistanê da kîrin, ku fikira weşa ra jî zulma usan derbaz nabe.

Halê Êzdiyan xirabtir bû ji bo ew him ji aliyê dewletê, him jî ji aliyê kurdîn musulman va dihatin qirê.

Rojnema KOVKAS, ku li bajarê Tilbîsê, bi zimanê rûsî dihat weşendin, sala 1948 a dînivîse:“Bi dewî împératorya Osmanyê ra li hev hat serxwebûna wan qebîlan, xazma ya Kurdan û Êzdiyan batmîs bike. Parek ji hinekan lap qelyan, bel-belayî bûn, para din jî tesmîlî hukumata dewleta Tirk bun. (34).

Dr.P. Müler Sîmons, pirtûka xwe ya bi navê. “Dûrch Armênién, Kûrdîstan und Mêzopotamien. (Meinz, 1897) da şedetyê tîne, ku dema ferманa Sultan Mehmedê 1 da “Reşîd paşa êrîşê dibe li ser Kurdistanê, li wê êrîşê da ewî 40 hezar êzidî kuştîne”.

Pêşekzanê Alman yê leşkeryê Hêlmût fon Motkê, ko wê demê osmaniya ra qulux dikir û tevî wê êrîşê bûbû di bîranînên xwe da wa dînivîser: “Dema Reşît Paşa ji pey gelek êrîşen xweye bi mehan berdewam ra, bajarê Cizîrê kire li bin hukumê xwe, piraniya bineliyê wê yê zilam, ewê Êzdi, an jî ew evdêن “MELEKÊ NEQENC” dihebandin kuşt, pîrekên wan jî hêşîr girt.”(35)

“...Di dema şerê Xerza, dema Êzdiyan li dijî leşkerên me şer dikirin, ez çûme cem Hefiz paşa. Ewî xwe dabû serê girekî û şer mîze dikir. Leşkerên wî gelek jin, mîr û evdê hemû yaşa hêşîr girtibûn. Leşkeran serî û guhêñ jêkirî (yê Êzdiyan) tanîn 50 heta 100 quruş zêde distendin. Ew hewar-gazî û qîrîna jinêñ kurd pir barkêş bû” (36)

Lê ci hate serê Mîrzikê Zaza û êla wî?. Çevkanya nivîskî ku gihişte me, bîranîna arxiolog û diplomatê İnglis Aûstîn Hêny Layard e:

Sala 1846 a, rîya wî zaniyarê navdar herêmîn Êzdiyan ra derbas dibe, bîranînê pir balkêş derheqa êzdiyê wê êlê, bûyar, deb û halê wan da hîştyê. Li Ridiwanê, mala birazyê Mîr: Nazî dibe mîvan. (37)

“Nazî ji malbeta serokê Ridiwanê yê dewî ye. Destpêk û dewiya serhatiya apê wî Mîrza axa (Mîrzikê Zaza. E.B.) mîna serhatiya gelek serokên wan gela ne, yên ku Tirkîyayê da ji bo serxwebûnê şerkarî kirine. Gava serfermandarê Osmanyê yê bi nav û deng Reşîd Paşa hucûmî li ser Bakûrê Kurdistanê dike û berê xwe dide Başûr nêzîkî herêma Mîrza axa jî dibe. Mîrza axa xwe dide destê serleşkerê Sutan. Welîyê dewletê Axê ji quesra wî derdixe dewsâ wî yekî bi navê Emîn axa datîne. Evê han hê pak li Ridiwanê cî nebûyî jîna Axê Êzdiyan, bi destê zorê drevîne. Mîrza axa dewsâ dijî wî rahêle çeka, diçe cem Reşîd paşa û dibejê, ku ew pîrek ne jîna wiye, carîye. Dibejê, bira bawariya te ji min

hebe, bira Emîn axa vegere ser karê xwe. Axê Tirk vedigere cîyê xwe. Mîrza axa êrîşê dibe ser wî, wî û du kesên wî ra dikuje. Heyfa xwe hiltîne. Reşîd Paşa hicûmî li ser Ridiwanê dike, lê ji bo wê demê leşkerê dewletê şerê dijî Mîrê Rêwandûzê (Mîrê Kora) va mijûl bûn, nikare heremê bike bin bandora xwe. Dema Reşîd Paşa şerê dijî beglikê Kurd da li ser dikeve. Mîrza axa dîsa diçe xwe davêjê. Padşa dîsa Mîrza axa dike serokê wê heremê.”

“Sala 1837-a Reşîd paşa ji nexweşîya xolorê dimire: Layard dinivîse: “ Ji pey mirina Reşîd paşa ra, walîkî nû tê wê heremê. Ew walî Mîrza axa tegîfî li cem xwe dike û bi xweyîntî dikuje. Mirovîn axê, ciniyazê wî tînin û li ber çêm, li goristana rojavayê bajêr da vedîşerîn.”

Bîranînê gel da jî tê gotin, ku wexta Reşîd paşa dimire, Mîrzîkê Zaza jî bi koma xwe va diçe hewaryê. Hema li wura jî wî digirin, dikine hebsê.

Hemzoyê Xalit bîranîna xwe da wa dibêje: “Dewyê da Mîrzîk girtin. Dewleta Osmanyê Mîrzîk girt. Zilamek ji mala Huseynê Kelo, mala wana Kelhoka bûn, berê ne Kelhoka bûne, lê vê paşyê hatin Kelhoka. Min navê wî zilamî jî zanibû, lê niha ji bîra min çûye. Mera usa hatye gotin. Herda digrin, dîbin hebsa Dîyarbekirê. Go ji hebsê reviyan. Li wê deverê çiyak heye jê ra dibêjin çiyayê Kinêriya. Gundê pîra li wur heye. Direvine çiyayê Kinêriya. Dikevne şkeftekê. Wê şevê berf dibare. Berfê da dixeniqin. Sibê şivan meytê wan divînin. Diçin ciniyazê wan tînin. Mezelê Mîrzîk li nava Çilêriya ye. Çilêriya tev pê zanin.”

Elî Qecer jî wa gîli dike: “ Çend sal pey ra Mîrzîk digrin, dîbin hebsa bajarê Dîyarbekirê. Ji hebsê direve. Direvne çiyayê Bizêrya, nêzîkî gundê Pira-Çinêrya. Wura çawa dibe, nizanim, dimire. Pîr tînin Ridiwanê vedîşerîn. Bavê min digot me mezelê Mîrzîk vekiryê û meytê Keleşê apê xwe kir yezelê wî.”

Ji hersê çevkanya jî xweya ye, ku Mîrzîkê Zaza di sala 1837-a girtine, kirine hebsê. Wê salê jî mirye. Gelo, çawa Léyard dibêje hebsê da dewletê kuşfiye, yan revya ye û le çiyê, ji bagera berfê xeniqîye? Herd çîrok jî nêzîkî bawarê ne. Dibe quluxçiyê dewletê ji kuştibin, ku wê kuştinê ji ser xwe derxin, laş biribin, avîtibin, cîyê, ku derheqa tê gotinê. Ci jî hebe sebebê mirina wî jî dewlet bûye.

Bi Mîrzîkê Zaza jî dewî wê mîrtiya Ézdîya, ya welatê Xalta tê, gund wêran dîbin, hinek direvine Şengalê û Welat şêx... Ev malbeta desthilatdar hukumê xwe unda dike. Ji pey wan bûyara ra Kurdêñ musulman qesrê ji wê malê distînin û Ézdîyan ji Ridiwanê derdixin. Niha peyhatyê wê malbetê li Almanyayê, dijîn.

Dî vê çîrokê da bûyarek heye, ku tek di pirtûka A. H. Layard da tê bîranîn. Ev bûyar di pirtûkê da wa hatye nîvîsar: “ Welîyê dewletê Axê ji quesra wî derdixe dîwsa wî yekî bi navê Emîn axa datîne. Evê han hê pak li Ridiwanê cî nebûyî jîna Axê Ézdîyan (Mîrzîkê Zaza, E.B.) bi destê zorê drevîne. Mîrza axa dîwsa dijî wî rahêle çeka, diçe cem Reşîd paşa û dibêjê, ku ew pîrek ne jîna wiye, carîye. Dibêjê, bira bawarya te ji min

hebe, bira Emîn axa vegere ser karê xwe. Axê Tirk vedigere cîyê xwe. Mîrza axa êrîşê dibe ser wî, wî û du kesên wî ra dikuje. Heyfa xwe hiltîne. Ev bûyara, ne di kilama, ne di bîranînê mezina da, ne jî di nav zargotina Ermeniya da tune. Eger bûyareke wa, eşkere, li wê demê biqewimya, dijwarbihata ji bîrkirin.

Gelo ev bûyara Layard şaş nîvîsîye, yan bûyr û şexsyetine din tev li hev kirye? Bi texmîna min, tu mene tune, ku em nîvîsara diplomatê İnglis bawar nekin. Surê Axayê Ézdî pir bûne. Nemê, ku wî Serleşkerê ordîya Rûsa ya Kovkasê ra sandî tu cîya nayê bîranîn. Bi texmîna me ew neme jî pir bi dizîva hatine şandin ji xêncî çend merivîn Ermenî wê derheqê da kesî nîzanbûye. Tê xanê, çawa hukum darekî fêodalî wê demê çend jînê wî jî hebûne. Ji pey şerê Erenzê ra nav û hurmeta Mzik li nav wê heremê da gelekî bilind bûye. Emîn axa, ku hatibû dîwsa wî, xwestye tîştekî usa bîne serê Mîrzîk, ku wî êlê da nuksan bike, navê wî ra bilîze. Jîneke Mîrzîk direvîne. Mîrzîk û der dorê wîye nêzîk, wê surê pir bi dizîva xweyî dîkin. Tê texmînkirin der-dor û mirovîn Mîrzîkê yê amin hîmlî Ermenî bûne. Mir amintya xwe ermeniya aniye, ew sur tek ermeniya zanibuye û wan jî Layard ra dîhar kirine.

Encemê Lékofînê

- Heta despêka sedsala 19 a, mîrgeha Xalta li Kurdistanê mîrgeheke Ézdîyan ya bi hêz bûye.
- Ridiwan bajar û merkeza mîrgehê bûye.
- Hukumdarê mîrgehêyî derwî serokeşîrê êla Qizila Mîrzîkê Zaza bûye.
- Komkuja herd gundê Dela û şerê Erenza Şêxan, berdewama hevin. Komkuja Delan çend mehan berî Şerê Erenzê pêk hatye.
- Herd bûyar jî alyê musulmanê fanatîk, oldarê deshiletdar bi biryara dîwleta Osmanyê va hatine kirin.
- Şerê Erenzê da saya tifaq û yekîtyê bûye berxwedana gelêrî û dijî artêşa dijmîne giran êzdî biser ketîne.
- Nenihîrî serketinê dora mîrgehê xelega neyartî çê dibe.
- Mîrzîkê Zaza ku bikaribe êla xwe xîlazke rê û dirba digere, dema şerê Rûş-Tirkan nema serleşkerê Rûş ra dişnîn jî bo hevkaryê.
- Ji pey şerê Rûş-Tirka ra ordiya Osmanyê bi serokatyâ Reşîd Paşa berê xwe dide Kurdistanê û zulmekte mezin tîne şerê gelê Kurd.
- Halê Kurdên êzdî xirabtir dibe.
- Mîrzîkê Zaza jî alyê dîwleta Osmanyê va tê girtin û kuştin. Bi kuştina wî dîshiletdarya wê mîrgehê jî tê.
- Ev bûyar di navbera salên 1820-1850 û qewimîne.

Navnîşana serkanyan

1. Mihammed Emin Zekî Beg, Dîroka Kurd û Kurdistanê, Weşena Avêsta, 2002, rû. 47; 84-85. Ekrem Cemîl Paşa, Dîroka Kurdistanê, weşena Înstituya kurdî li Biruksêlê, 1995, rû. 55-56.
2. Layard A.H., Discoveries in the ruins of Nineveh and Babilon, with travels in Armenia, Kurdistan and the desert: Being the result of a second expedition undertaken fort he Brit.Museum Lokdon.1853, Vol. 1, p. 45.
3. Celîlê Celîl, Rûpelek ji pêwendiyêni Ermenya-Kurda yê dîrokî - çandî, Berevoka gotara ya Akadêmya Ermenistanê, Înstitûta Rojhîlatzanyê, Gel û welatêne Rojhîlata navîn û nêzîk, Kurdzanî, cild 13, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan 1985. rû. 93.

- 4.Serkanya 2 a.
- 5.Xaçatûr Aboyan, Kurd, Êzdi, bi werger û pêşnivisara Wezirê Eşo, Yêrêvan;1986.
- 6.G.V. Sirvanzyan, Hinos ev noros, K.Polis,1874. ru, 171-174, bi zimanê ermenî.
- 7.Eskerê Boyîk,Êzdiyatî, Mîrzikê Zaza, Fermanên reş, weşena dengê Êzdiyan, 2002;
- 8.Akti, sobrannîe Kavkasskoy arxêografiçeskoy komisiyê, Cild VII, ru 957.
- 9.Averyayanov P.Î., Kûrdî v voynax Rossii s Pérsiyê i Tûrsiyê v têcêniyê XIX stolêtîya. rûp.132;135;152.Tîflîs, 1900. rû. 10-12.
- 10.Heciyê Cîndî, "Pismamtya gelên Ermenî û Kurd di nava zargotinê da, bi zimanê ermenî, Yêrêvan-1965, ru. 31-32. û romana "Hewarî"
- 11.Dr. Prf. Celilê Celîl "Rûpelek ji peywendiyên Ermeniya û Kurda yên dîrokî-çandî", bi zimanê ermenî, berevoka welat û gelên Rohilata Nêzik û Navîn, cilda 13, Kurdnasi, Yêrêvan, 1985, rû. 93-108. Rojnema Hêvî, Nr. Nr. 120; 121. Di Pirtûka Prf.Celilê Celîl " 13 rûpelên balkês ji dîroka gelê Kurd" "Rûpelek ji peywendiyên ermenya û kurda yên dîrokî çandî.", bi zimanê kurdî, Wiên 2002, rû.5-17.
12. X. Çetoîv, serkanya 4-a, rû 74, (Pêwendiyên Kurdên êzdi di dewleta Rûs ra); K. Çaçanî, Ji helaqetyên Ermenya-Kurdaye çandî; serkanya 4-a, (Pêwendiyên Kurdên êzdi...) rû. 110-114, Wezirê Eşo, Dost û xêrxwezê cimeta Kurdayî Mezin, X.Aboyan, Kurd, Êzdi, bi zimanê kurdî, Yêrêvan 1986, rû 105-113; Casimê Celîl, Şêx Mîrza, destan, almanaxa BAHAR 199. O. C. Calfîlov, Sitiranê Kurdaye Terîqiyê, Sank-Pêtêrbûrg-2003, bi zimanê rûsi, rûp.65-76; bi zimanê kurdî, 309-321.
13. Serkanî 7.
14. Dîsa li wur, rû.140.
15. Dîsa li wur.
16. Serkanî 2.
17. Serkanî 14, rû.176
18. Dîsa li wur.
19. serkanî 7, ru. 145.
20. Dîsa li wur, rû.179.
21. Dîsa li wur, rû. 142.
22. Serkanî 6, rû. 171-174.
23. Çevkanî 7, rû.180.
24. 114, Wezirê Eşo, Dost û xêrxwezê cimeta Kurdayî Mezin, X.Aboyan, Kurd, Êzdi, bi zimanê kurdî, Yêrêvan1986,rû 109.
25. Serkanî 7, rû.135.
26. Dîsa li wue, ru.132.
27. Serkanî 24, ru.109.
28. Dîsa li wur, rûp. 111.
29. Çevkanî 11.
30. Serkanî 7, rû. 65-66.
31. Dîsa li wur.
32. Ş. X. Mgoi.... ïstorîya Kûrdistana, Moskiva, 1999, rû. 121 –127; Serkanya 1-ê (Mîrê Ridîwanê....)
- 33..M. V. Lazarev, Pirsa Kurdan (1891–1917), Weşena Roja Nû, 1999, rû 34.
34. "Kavkas", 1848, N 8, rû.31.
35. Helmut von Motke, Unter dem Holbmond, 258-265, bi zimane almani.
36. Dîsa li wur, rû.264.
37. Serkanî 7, rû 77.

NÊRÎNEK LI DÎROKA KEVNAR



Dr. Tosinê Reşîd\ Istiralya

Heta rojên me jî di nav kurdan de ew bawerî serdest e, wekî berî kurd bi piranîya xwe ve ola îslamê bipejirînin, zerdeşti bûne. Bi bawerîya me ev nêrîn bê bingeh e.

Hozên Arya êdî sedsalîya XVIII Bî (berî Isa) digihîjin Mêopotamîya. Dor sala 1375 Bî di navbera dewleta Hîftan û cîranê wane başûr, împératorîya Mîtannî de peyman tê girêdan. Peyman ji alîyê arkêologan ve li serbajarê dewleta Hîftan, Boghazkoy ê, dema vekolînên salên 1906-7, hatîye ditin. Ew peyman ji bo zaniyarên rojava balkês e, ji ber ku cara yekemîn navê Mithra di wir de rastî me tê. Parastina Mithra wê ji sedsalîya I Bî ji Kurdistanê heta Brîtanîya belav bibe û tesîreke mezin ser olên dûarojê, berî gişkî xaçparêzîyê bihêle.

Ji împératorîya Mîtannî re dibêjin 'împératorîya ji bîra kirî'. Ew împératorî sedsalîyen XV-XVI Bî hate damezirandin û dor 300 salî jîyana xwe domand. Tixûbêن wê ji çiyayê Zagrosê, Kirkûkê (Arrabxa hingê) li rojhilat digihîstin çiyayê Kurmanc û derya Sipî li rojava. Serbajarê wê, Wassukkane, devê çemê Xabûr bû. Misirîya ji Mîtannî re Naharin jî digotin, ku bi rûbarê Ferat re girêdayî bu¹.

Yekemîn şahê Mîtannî Sutara I bû (Roja baş), yê dû wî re Baratarna bû (Roja mezin). Parastina rojê di ola mîtannîyan de cîhê xwe, yê giring hebû. Wan bawarîya xwe bi hêka esmanî jî dianî, ku gor bawerîya wan cihan ji wê derketîye.

¹ Subhash Kak, *Akhenaten, S'urya and Regveda*, www.ece/su.edu/kak/akhena.pdf, July 17, 2003. 2003.

Parastina rojê bingehekî ola êzdîyan e. Hêka esmanî jî durr a ola êzdîya bîr tîne ku gerdûn gişk ji wê sêwirîye.

Mîtannî di dema xwe de yek ji bihêztiñ ïmpératorîyên cihanê bû, lingê xwe bi Misir û Roma re davit, şerê Asorîstanê dikir. Lê ji ber ku ew ser axa Kurdistana îroyîn bû û divêt kurd jê xwedî derketana. Ka, kurd jî li ku ne!

Şahêñ Mîtannî û fereunên Misrîye dînastîya 18 emîn jin ji hev dibirin. Kiye, şahbanîya Axênatêñ (1352-1336), keça şahê Mîtannî Tuşratta bû¹. Dê û dapîra Axênatêñ jî ji malbeta şahêñ Mîtannî bûn. Ev malûmatî di nameyên navbera fereunê Misrîye Axênatêñ û şahêñ Mîtannî Tuşratta de hatine parastin, ku li Amarna Misrîye hatine dîtin². Lê şahbanîya Axênatêñ yekemîn, Nefertiti a bi nav û deng jî nîv Mîtannî bû. Dîtina peykarê Nefertiti li devera Duhokê mak kirina van pêwendîyan e.

Fereun Tûtanaxamên, ku mûmîya wî usan baş hatîye parastin, kurê Axênatêñ bû, ji Kiya.

Axênatêñ (Roj şah), ku ew nav sala şeşemîn, ya hukumdarîyê da ser xwe, wê şorişa olî li Misrî pêk bîne. Wî ji dor 2000 xwedayêñ misrîya tenê yek hîşt, Atêñ. Atêñ li esmana bû û nîşana wî Roj bû. Gor qewlêñ Axênatêñ, Atêñ usan jî di dilê mirovan de bû.

Gor bawerîya piranîya zanîyarêñ pisporêñ dîroka olan, Axênatêñ bavê wan pêxemberan gişkan e, ku bawerî bi İbrahîm Xelîl anîn, monotêyîzm pejirandin³. Ew bawerî jî heye, wekî Müsa pêxember karmendekî dîwana Axênatêñ bûye û bawarîya monotêyîzmê ji wir hidaye⁴.

Xwedayê li esmana ku nîşana wî roj e bingehekî ola êzdîyan e.

Demêñ kevnar ew bawarî ji Hindistanê heta Misrî serdest bû.

Gor P.G. Kreyenbroek nîşan û nexşen ku li Mêopotamîya hatine dîtin (yên salêñ 1098-1044 Bî) heta nîveka yekemîn ya sedsalîya XIX ser dîwarêñ Lalişa Nûranî hebûn (ew ser wêneyêñ A. Layard kişandî hene). Mar, dûpişk, şe, baldar û gelek nexşen mayîn⁵. Ev jî mak kirineke wê bawerîye ye, wekî rehêñ ola êzdîya diçin heta hezarsalîya duyemîn Bî.

Em dîsan bêne ser mîtannîyan. Hinek cîhan tê gotin, wekî mîtannî gelekî ïranî bûne, lê faktên dîrokê ne gor vê bawarîye ne. Di peymana Boghazkoy de şahê mîtannîya Vasukhani(Vasûxanî) teví sond xwarina bi navêñ çend xwedayêñ hûrîya, usan jî bi navê Mithra, Varuna, Îndra û Nasatiya sond dixwe. Navê Varuna ji ïranîyan re ne nas e, lê Îndra û Nasatiya di mîtalogîya ïranyan de ne çawan xweda, lê çawan dêw derbas din. Navê şahêñ mîtannîya (Artatama, Şûtama, Artasûmara, Dûşratta)

hê zû bi sanskritê têñ şirovekirin, ne ku bi ïranî. Usan jî di peymanê de seva peyva *hevta* ne ku peyva ïranîye *hapta*, lê ya sanskrîte *sapta* hatîye bi kar anîn¹. Paşê jî ev peyman sadsalîya XIV Bî hatîye grêdan, lê hozên ïranî wê pişti sêsid salî bêne wê deverê. Ev gişk dibin bingeh, wekî bêjin mîtannî, usan jî cîranêñ wan e rojhilat, kassit, galêñ Hindo-Arya bûn.

Pişti hatina wê deverê mîtannî di nav hûrîyan de hatin bişkavtin, asîmîle bûn, zimanê hûrîyan hildan, lê bawarîyêñ xwe yêñ olî, ku bingehê wan ola hindaye Vedic bû, parastin. Di wê olê de parastina xwedayê S'ura, ku li esmana bû û sêla rojê nîşana wî bû, bawerîke bingehîn bû.

Gor bawarîya hinek zanyaran (Subhash Kak), bawerîya xwedakî li esmana, ku nîşana wî roj be, dikaribû bi rîya jinêñ ji malbeta şahêñ Mîtannî derbasî Misrî bibûye û ji şorişa Axênatêñ e olî re bibûye bingeh².

Gor Şeref xan Bîtlîsî êzdî hema ji wê deverê belav bûne, ku ïmpératorîya Mîtannî lê bûye³. Gelo ev yek dibe bingeh ji bo têkilîyêñ di navbera ola mîtannîya û ya êzdîya de, ez nikarim bêjim.

Seva hatina Hindo-Arya li devera bakûra Mêopotamîya bawarîke mayîn jî heye. Gor zanyarê hindî Subhash Kak dor sala 1900 Bî li Hindistanê rûbarê Sarasavati ji erdhejekê ziha dibe, aborîya gelêñ cih têk diçe û ew koçber dibin û piranîya wan berê xwe didin rojava⁴. Mîtannî û kassit ji wan bûn.

Hozên Hindo-Avropî berî ku koçî başûr, başûr-rojava û rojhilat bikin, bûne du beşan; Hindo-Aryan û Iranîyan. Sebebê vê perçê bûnê hinek zanyar di şerê navbera hozan de, hinek jî di bawerîyêñ olî de dibînin. Çawan tê xuyayê nîrîna duyemîn hê nêzîkî aqilan e; dijîtîya olî di navbera ïranîya û hindo-aryan de demeke gelekî dirêj dom dike. Awa di Reg Veda Hindo-Aryan de *daeva* ji xwedayan re dibêjin, lê di Avesta ïranîyan de *daeva* ji dêwan re dibêjin. Usan jî bal hindo-aryan dûarojê wê ji dêwan re bêjin asûra, ku ji navê xwedayê ïranîya Ahûra tê, Ahûra bi Sanskrit Asûra ye⁵.

Û ev herdu ol berî gişkî li Rojava ïranê û Mesopotamîya rû bi rûyî hev bûn.

Gor zanyarêñ kurd Mehrdat R. İzady, Tewfiq Wehbî û Reşad Mîran çiqwas jî ola zerdeştiyê gîhişte Medîya (rojava ïrane), lê nebû ola serdest. Kelkê Medîya Daeva diparastin, xwedayêñ bi xwe re ronahîyê tînin.

¹ E. Hornung, 2001, *Akhenaten and the Religion of Light*. Cornell University Press.

² W. A. Moren. (ed) 2002. *The Amarna Letters*. John Hopkins University Press. Baltimore.

³ Subhash Kak, *Akhenaten, S'urya and Regveda*, www.ece/su.edu/kak/akhena.pdf, July 17, 2003. 2003.

⁴ S. Freud, 1987. *Moses and Monotheism*. Random House, New York

⁵ Ph. G. Kreyenbroek, *The tradition of the Yezidis and Ahl-e Haqq as Evidence for Kurdish Cultural History*. Worl Konress of Kurdish Studies, Erbil, 2006.

¹ Subhash Kak, *Akhenaten, S'urya and Regveda*, www.ece/su.edu/kak/akhena.pdf, July 17, 2003.

² Dîsan li wir.

³ Şeref-xan ibn Şamsadîn Bîtlîsî, 'Şaraf-namê', Moskva, Naûka, 1967, c. I, rû. 83. (bi zimanê rûsî).

⁴ S. Kak, 2000, *The Astronomical Code of the Rgveda*, Munshiram Manoharlal, New Dehli.

⁵ Subhash Kak, *Akhenaten, S'urya and Regveda*, www.ece/su.edu/kak/akhena.pdf, July 17, 2003.

Gor T. Burrow gelê proto-Hindoary, ku ji rojava Asîya digihîstin heta Hindistanê, êdî parêstvanên Daeva bûn¹. Bi gîlkî mayîn, berî hatina hozên Hindo-Arya û Îranîya, ew ol êdî li deverê hebû.

Navbera sedsalîyên IX û VII BC eşîrên îranî ser axa Kurdistana îroyîn bi cîh bûn. Ew hê jî peyçûyen bawarîyên arîyan û hinda bûn. Gor bawarîya zanîyarê kurd T. Wehbî, xwedayê wan yê sereke, ku nîşana başî û qencîyê bû, Baba Esman bû, ku jê ra usan jî Baba Dîyaûs digotin. Ew anegor xwedayê hindîya, Dîyaûs Pîtar bû.²

Ji xwedayê rada duyemî re (roj, hevv, stêr) digotin ‘dîva’, yan jî ‘dîvas’, bi xwebêja yên ronahîyê tînin.

R. Reşid dinvîse, wekî sola zerdeşiyê li Medîya ê jî belav bû, lê nebû ola serdest, ji ber ku ola cîh, ku berî zerdeşiyê hebû, bi hêz bû³.

Dûarojê, gava zerdeşî bi hêz bûn, wan xelkê ku pey ola kevn diçûn nav kirin “daeva yasna” û wan wateya van peyvan kir; “koleyên dêw”. Gor bawarîya hinek lêkolînvanen kurd “daeva yasna” bi hinek guhastinan îro bal kurda maye. Peyva *dasnî* ku hozeke êzdîyan bi wî navî heye û demên berê mîrgeheke êzdîyan bi wî navî hebûye, hema ji guhastina peyvîn *daeva yasna* çê bûye⁴. Pir caran di dirokê de ji êzdîya gişkan re gotine *dasnî*.

Ne dûrî aqilane, wekî navê “dêwperest” ku heta îro jî hinek kes êzdîyan usan nav dikin, hema ji wê dewranê tê.

Di belgeyên asorîyan de heye, wekî li bakûra welatê wan dewleta Dasinî hebûye. Ji bajarê Duhok re jî berê Duhoka Dasinîya digotin.

Çawa tê xuyayê demên berê *dasnî* devereke hê fire belavbûyî bûne. A.H. Layard, nîveka sedsalîya XIX yekemîn dinvîse, wekî hozeke bi navê *dasnî* li çîyayên nêzîkî Silêmanîyê heye⁵.

Zerdeşiyâ ji xwe re Mazdayasna, ji parêstvanê Daeva re jî Daevayasna digotin. Û Zerdeş ola xwe çawan altîrnâtiya ola Daevayasna raber kir.

Di Avesta de seva rikberîya di navbera parêstvanê Ahûra Mazda û Daeva de, ku di wan têkstan de çawan dijberîya navbera Mazdayasna û Daevayasna tê raber kirin, tê gotin. Beşekî Avesta ya taybetî ji bo dijberîya Daevayasna hatîye nivîsar; Videvdat yan Vendidat (vi-daeva-dat), anti-daeva, dijî daeva.

Çiqwas jî şahêن farsa di nîveka hezarsaliya yekemîn Bî, bûne parêstvanê Ahûra Mazda, parêstvanê Daevayasna man.

Di dewrana Xerxes de (486-465) BÎ, parêstvanê Daeva li Rojava Îranê dijî zordarîya zerdeşiyâ serî hildan¹. Pişti pelçiqandina serhildanê Xerxes wê bide nivîsarê, çawan bi zor xelkê cih birine ser ola zerdeşiyê.

Gor bawarîya T. Wehbî heta sedsalîyên IV-V Pî jî, piranîya kurdên rojava Zagros; Cizîr, Botan, Kirkûk, başûr-rojhilata Kurdistanê a çiyayî, ne zerdeşî bûn².

Bi bawerîya me yek ji sebebê, wekî xelkê împêratorîya Meda ola zerdeşî ne pejirand ew bû, wekî ji şes hozên ku fêdêrasiyona Medan ava kirin, tenê yek, Arîzantî îranî bû, ji Asîya Navîn hatîbû û pismamê Saggartia û Farsan bû. Yê mayîn xelkê jîh bûn, aborîgîn bûn, xwedîyê sistemeke oliye cihê xwe girt³.

Med bi xwe çîneke oldare berî Aryan bû, ku kete nav fêdêrasiyonê.

Çawan me êdî gotîye, Hindo-Aryan bi xwe re bawerîyen ola Vedic anîn, ku wê olê de rola Mithra gelek mezîn e, ew hevkarê xwedayê Varuna ye. Bawarîya Mithra cihê xwe di olên cih de girt. Usane êdî berî hatina hozên îranî (çawan peymana Bagozka yê jî mak dike) li deverê parastina Mithra hebû. Di ola Vedic de Mithra usan jî navekî Rojê bû.

Zerdeşiyâ bi her teherî dixwest xelkê bibin ser ola xwe, heta bi rêya zorê jî. Bi taybetê wan parêstvanê Daevayasna ji xwe re kiribûn hedef. Di têkstan zerdeşiyê ye pîroz de pesnê wan şah û mîrxasan tê dayîn, ku şerê Daevayasna kirine; Vistaspa, Jamaspa, Vistaru. Di wan têkstan de em usan jî rastî helanan tê, ku didane zerdeşiyân, wekî li mal û milkê Daevayasna bibin xwedî. Heta dihat gotin, wekî dermanen nû tê çêkirin berê bidin Daevayasna, eger zêndî man, dû re bidin Mazdayasna.

Ev gişk sîyaseta xelîfîn Abassî û sultanen Osmanîya dijî êzdîya tînin bîra me.

Zerdeşiyâ her teherî dixwestin meda û ola wan ber çavên xelkê reş bikin. Di mîtalogîya farsan de du alîkarêن xwedayê xirabî û tarîyê, Ehrîmane sereke hene û yek ji wan Azhî Dahaka ye. Gor wê mîtologîyê Azhî Dahaka dêwê sê serî ye û zikê wî bi margîsk û dûpişkan ve tijî ye⁴. Gor evsenetîyên zerdeşiyâ, wî xwedayî çemên di nav bajaran re dikşîyan didan rawestandin û xelkên bajêr neçar diman çend keçan ji wî re bikin cangorî, heta dîsan av berda⁵. Usan jî tê gotin, wekî Azhî Dahaka bi teherê zîya û mara dikare dîyar bibe. Di zimanê farsî de jî zîya re dibêjin Ajdaha, ew jî navê Azhî Dahaka tê.

¹ Burrow, T., *The proto-Indoaryans*, J. of the Asiatic Society, 2, 1973, rû. 123-140)

² Tawfik Wehbî, *Dînî caranay kurd.- Kov. Gêlawêj*, 1940, N 11-12, rûp 51-52, Bexda.

³ Reşad Sebrî Reşid (Reşad Miran) *Ètnokonfessionalnaya sitüasiya v sovremennom Kúrdistáne*, ‘Naûka’ Moskva-Sankt-Péterbúrg, 2004, rû. 16.

⁴ Mehmed Mesûd, *Risalek li rişalî zimanekeman*, Kovari “Nûsarî Kurd”, Bexda, 1986, j. 6.

⁵ Layard, A.H., “A Popular Account of Discoveries at Nineveh”, New York, J.C. Derby, 1854, rû. 206.

¹ Subhash Kak, *Akhenaten, S'uriya and Rigveda*, Julay 17, 2003. rû.10.

² Wehbî, Tawfiq, *Dînî caranî kurd*, Kovara Gêlawêj, 1941, Jim. 11-12, rû. 67.

³ Ardalan, *Magians, Mithraists and Zorastrians* <http://newsgroups.derkeiler.com/Archive/Soc/culture.iranian/2006-02/msg01563.html>

⁴ Vesta Sarkhosh Curtie, *Persian mythe*, British museum press, 1997, London, rû. 12.

⁵ Yahiya ‘Ebdulxamî’ Elî, *al-Imlak zâl al-rûâs al-sab’â*, (dêwê hevt serî), kov. Karwan, 1983, N13, Hewlîr, 121-130. (Me ev jêderk ji pirtûka R. S. Reşid, *Ètnokonfessionalnaya sitüasiya v sovremennom Kúrdistáne*, ‘Naûka’ Moskva-Sankt-Péterbúrg, 2004, rû. 66, hildaye).

Divek hema ji vir tê, wekî êzdî bi *Ziyayê zer* sond duxun. Ji bo wan Azhî Dahak ne bûye nişana xirabîyê, wan bawarîyên zerdeşîya ne pejirandine. Riştî vêga-Azhî Dahaka şahê Medayî dawî bû.

T. Wehbî wê bawarîyê ye, wekî Zohak ê ‘Şah Namê’ a Firdûsî hema Azhî Dahaka ye, ku di evsenetîya Newroz ê de wek zilmkar tê raber kirin.¹

Bê guman Newroz cejneke kurda ye, ku ji kûraya hezarsalan tê. Gor ola êzdîya ew cejn pîroz e. Awa di “Mesheba Reş” de tê gotin, wekî roja Newrozê gerek hevt caran dua bikin. Lê çiqwas em zanin, ne di ola êzdîyan de, ne jî di kevneşopîyên wan de tu bes, bazara Kawa û Zohak tune.

Evsenetîya Newrozê ku iro nav kurdan de hatîye pejirandin, ji alîyê zerdeşîyan de hatîye sêwirandin û dijî Meda, dijî parêstvanê Daeva ye.

Xelkê Medîya peycûyên ola Daevayasna bûn. Di wê olê de rola Mithra mezin bû. Kujtina ga ji alîyê Mithra de cejneke wan ya giring bû. Ev merasîm heta iro jî di ola êzdîyan de maye. Kujtina ga beşekî giring, yê mezintirîn cejna êzdîya, Cejna Cama Mêra ye, ku jê re usan jî Cejna Cama Şixadî dibêjin. Ew usan jî dema heca êzdîyan e.

Ji bo vê meresîma giring jî ber çavêن xelkê reş bikin, gor bawerîyên zerdeşîya Ehrîman ga dikuje.

Di ola êzdîyan de gelek êlêmîntên ji Mithraismê têن hatine parastin û gor hinek zanîyaran, Mithraizm bi teherê ezdiyatîfîye li çiyayên Kurdistanê maye².

Gelek car tê gotin, ji ber ku oldarêن zerdeştya ji hoza Meda ye Magi bûn, usane xelkê împératorîya Meda jî zerdeşti bûne.

Pirs ew e, gava Magi di zerdeşîyê de aktîv bûn, zerdeşti hê jî xweya sîstêmeke olî ye rêk û pêk nîn bû. Di Avesta Xort de tesîra bawarîyên Magîyan heye, wan xwedayêن xwe, çiqwas jî ser rada nizm, lê di wê sîstêma ola Zerdeşîyê de bi cih kirin³.

Dema destpêka ola zerdeşîyê de Magiya dijberîya di navbera bawarîyên xwe û yên zerdeşîyeye olî de ne diditîn. Dûarojê, gava ola zerdeşîya bû sîstêmeke rêk û pêk, cihê Magîyan di wê olê de nema. Em di Avesta de rastî peyva Magi nayê, cihê wê peyva Athravan heye⁴.

Magi mîna qewalên êzdîya bûne. Wan têkstên olî (qewl) ezberî zanibûne û dema cejna û qurban dayînê qewl gotine.

Tesîra Magyan, çawan şewirmend, di dîwana şahêن Medan de mezin bûye, wan qewl digotin, naveroka wan şiro vedikirin. Gerek bê gotin, wekî qewlêن wan digotin, yên dewrana berî hatina hozêن iranî bûn.

Magi bi hostatîya ezber zanibûna qewla, stran û şirovekirina wan çawan nav meda, usan jî nav farsan de navdar bûn.

Darayê Mezin Magi vexwandin, ji ber ku wan qewlêن ola zerdeşîyê di bîra xwe de xweyî kiribûn, ezberî zanibûn.

Dewrana Hêlêniya û Romîyan de oldarêن Mithraizmê re digotin, Magi. Tiştekî balkêş e, wekî gor bawerîya hinek zanyaran, hersê aqilbendêن ku ji bo ji dayîk bûyîna Hizretî Isa çübûn Betlêhemê, dikaribûn oldarêن Mithraya, Magi bûna, lê ne zerdeşti, çawan tê gotin. Ew ku wan ber agir dua kirîye bûye mak kirin, wekî ew zerdeşti bûna. Lê mithraya jî dikaribû ber agir dua bikira¹.

Ew ku rehêن ola êzdîya diçin kûraya dîrokê, iro êdî tu guman tune. Hela destpêka sedsal XX rojhilatnas û kurdnas N. Marr seva ola êzdîya dinvîse, “Em li vir bermayêن ola kevnar, ya cih dibînin”².

Di nav êzdîyan de herdem tê gotin, wekî li Hindistanê jî êzdî hene. Salêن zarotîyê min ji mezinan bihîstîye, wekî dema Cenga Cihanîyeye Yekemîn, ofiserekî Brîtanî, ku bi eslê xwe hindî bûye, gava tenê maye, ji êzdîyan re gotîye, wekî ew jî êzdî ye. Nêzîkî Lalişa Nûranî şikevtek heye, ku heta niha jî jê re dibêjin ‘şikevta hindîya’. Gor bawariya xelkê cih, mirîdê Şêx Adî ji Hindistanê hatine, li wir mane û dûarojê di nav êzdîyan de bişkivtîne, asîmîle bûne.

Lî Hindistanê tekîk bi navê ‘Pênc pîr’ heye, ku yek ji xasê wan Şah Şems Tewrêzî ye. Yek ji mezintirîn xasê ola êzdîya Şêx Şems e ku jê re usan jî Şêx Şemsê Tewrêzî dibêjin. Cawan dîyar e, çîna şêxa pişti hatina Şêx Adî Lalişa Nûranî bal êzdîya dîyar bû, usane ne dûr e, wekî xasê êzdîya jî berê Şah Şems Tewrêzî bûye.

Divêt em ji bîra nekin, wekî miskenê baldara Tawis, ku giringtirîn nîsana ola êzdîya ye, Hindistan e, ew li Rojhilata Navîn nayê dîtin. Miskenê dara zergûzê jî, ku nîşanêن êzdîyaye pîroz: xerqe, kulik, tok bi belgên wê reng dîkin, dîsan Hindistan e.

Bingehêkî ola êzdîya, ew bawerîya kirasguhêrînê ye, ew bawerî di ola hindîyan de jî bingehîn e.

Gelo ev bûyarêن dîrokî û mînakîyên di navbera olêن êzdîya û Vedic de dikarin bibin bingeh ji bo zelal kirina çavkaniyê ola êzdîya? Wekî bingehê ola êzdîya ola Daeva ye bi tesîra olêن Vedic û Mîthraizme? Bersiva vê pîrsê hê jî ne zelal e.

¹ Wehbî, Tawfîk, *Li nawçûnî madakan kirdarekî dîn bû*, kov. Gêlawêj, 1940, N 8 Bexda, rû.35.

² Ardalân, Magians, Mithraists and Zorastrians

http://newsgroups.derkeiler.com/Archive/Soc/soc.culture_iranian/2006-02/msg01563.html

³ Dîsan li wir.

⁴ Dîsan li wir.

Notenivîsarêñ awazêñ kurdî yêñ pêşin

(*Ji arşîva prof. Hecîyê Cindî*)



Dr. Nûra Cewarî
Istiralya

Awazêñ kurdî, çawa pareke mûzika kurdîye mûhîm pir giranbihane, bi serecem û taybetyên xweya sazbendyêva ji stranan kêmter nînin, hela hê zêdetirin jî bi karanîna hunerên hacetêñ gelêye sazbendyê yêñ başqe-başqeva - wek Meya, Zurne, Fîqe, Bilûr, Tembûr, Def û Duşbek...

Di nava dengnivîsar /notenivîsarêñ mûzika kurdî yêñ çapkırıda, ji despêka sedsalya 20-î heta îro, bi piranî stranêñ gelerîne. Notenivîsarêñ awaza - yêñ govenda, şivantyê, yêñ dewata -cirîd, guleş û yêd mayîn li ser pêçya dikarin bêne hesavkirinê. Hilbet ji bo xwendevanan notenivîsarêñ strana tevî teksta he hewaskarin ne ku notenivîsarêñ awazan yêñ bê tekst.

Notenivîsarêñ awazan ji bo pêşekzan - muzikzanêñ folkilôrist û sazbendêñ ku nota dixûnîn hewaskar û bi qîmetin.

Çawa awaz kêm hatine dengnivîsarê usa jî hostêñ awaza, yan çawa kurdêñ Armêniyê divêjin - sazbend, kem eyanin, nave wan kêm têne gotinê, ewana kêm têne naskirine

û qîmetkirinê. Bes nave çend sazbenda, weke Egîtê Cimo tê gotinê çawa "Mîre bilûrê", navê Temo wextêda dihate gotinê çawa "Hostê tembûrê".... Lê çığa hostêñ bi merifeta geş hebûne û hene ku tevî stranbêjan strana xemilandine û dixemlinin, konserta çawa bi tenê usa jî tevî komê didin û kem têne naskirinê. Wexte em wana jî baş nas bikin, qedrê wan û berhemêñ wan bigirin.

Herwiha di arşîva prof. H. Cindîda me du notenivîsarêñ awazan dîtin ku pêşekzanêñ ermenî wextêñ başqeda nivîsne. Herdu jî awazêñ şvananîn bi intonasîayêñ gazîkirinêva. Yek bergirtina notenivîsarê klassîkê mûzîka ermenya Komîtase ji arşîva Komîtas, yê din notenivîsarê mûzîkzan Aram Koçaryane ku gotarekî wîda çap bûye. Herdu meselê nota emê bi bergirtina xwe nîşandin berku awaza pêşin ji orîçinalê baş nehatîye bergirtine, awaza duda jî ji bo çapkiranê çûk kirine û bi zehmet tê xwendinê.

Arşîva Komîtas li Mûzêya Ermenistanê ya Edebyet û Çandeida tê xweykirinê. Hejmara dengnivîsarê 1336-e. Sal ne nivîsare, bes jorê "Awazê kurdî" û di nava bendada "ji bo meya" hatîye nivîsarê. Eyane ku Komîtas kutasya sedsalya 19-a tevî hevalekî xweyî êzdî - Üsiv beg li gundêñ Serhedê yên kurdêñ êzdîda bûne mîvan. Divek hema hingê jî ew awaz nivîsibe.

Awaz bi dengêñ dirêj despê dive û paşê deng kin divin û bi lez hevdiguhêzin. İntonasîayêñ gazîkirinê (dengen pir kin tevî yên dirêj) gelekin û hey têne weklandinê.

Mesela nate 1

The musical score consists of four staves of handwritten notation. The top staff has the title "Mesela nate 1" and "Allegro". The notation uses vertical stems and horizontal strokes to represent pitch and rhythm. The music is divided into measures by vertical bar lines and includes various rests and dynamic markings.

Aram Koçaryan pêşekzanê folkilora ermenya ya sazbendyêye. Ewî têzêñ xwe yên doktryê li ser hacetêñ sazbendya ermenya yên geleryê nivîsiye. Notenivîsara wîye "Awazê kurdî" li gotarekî wîye bi sernivîsa "Mîapox srîng" (Meya bi lûlekîva) sala 1962-a li kovara "Têxêkagîr" (Bes) hejmara 11-ada ya Akadêmia Armêniya ya Zanîaryê çawa mesele çap bûye.

Eva awaza jî bi nexş û xemle. İntonasîayêñ gazîkirinê hey li hev tene guhastinê.

Mesela note 2

Tiştékî ecêve ku ev herd awaz bi xeyset, bi intonasîayên xweva, bi dengrêz u bi livandina awazava mînânî hevin. Ewana bi gîana kurdîne û geleki taybetîne. Çawa stranê mîranyê (yên dîrokî), stranê destana, evîntyê evana jî ji jora dengrêzê despê divin, çend cara çivane didin û hêdî-hêdî, qey bejî bi nerdewana peyayî ber bi dengê dengrêzê ya jêrîne qewîn divin. Çawa stranen jorgotî yên dirêje bînfire evana jî bi hunerên sazbendy yên başqe-başqeva dewlemendin.

Herdu awaz jî bi hostatî hatine nivîsarê. Ewana bê çevkanine, em nizanin li ku û ji kê ew awaz hatine nivîsarê.

Mînakya van awaza çend fikra pêjda tîne. Yan awaz eyan bûye, baş hatîye parastinê û pişti wextekî dirêj - nîv dewranî zedetir A. Koçaryan bihîstîye û dengnivîsiye û niha ew nimûn dikare hesabbe çawa şaxekî dengnivîsara Komîtas. Yan jî divek Koçaryan haj dengnivîsara Komîtas hebûye û bi bîr û hunera xwe ew awaz bi nexşen nûva veçekirîye û dengnivîsiye bê bîranîna çevkanî. Çawa jî hebe ew herdû nimûn bi hostatî hatine nivîsarê û bi rastî fonda kurdî ya dengnivîsaren awaza dewlemend dikin.

Ne ku tenê Komîtas û A. Koçaryan qedrê awazên kurdî girtine û dengnivîsine lê usa ji gele roşinbîrên ermenî ji awazên kurdî heyri mane û fîkrîn xwe anîne li ser kaxaz. Emê bes nivîsarê etnograf A. Yrîsyâni bi bîr bînin ku li gotarekî wîda çap bûye. "Ew tiştê ku zar-zmanê wî (yê şvan -N. C.) nikaribû bikira, ewî bi bilûrê, ku hey jê dengê melûl, işke-

The image shows handwritten musical notation on four staves. The first staff has a title in a stylized font above it. The subsequent staves are in 2/4 time, featuring various note heads and rests, primarily in black ink on white paper.

îskê, hey jî dengê eşqê, şabûn û serketinê dihat, kir. Û merî zendegirtî dimîne, ku di nav bedena wî şivanê jar û zeîf da çawa ewqas kel û şewat dikare hebe" /A. Yrîsyâni, Rêwîtî berbi Ermenistana Roava , kovara "Arzagank", 1881, hejmar 3, rûpêl 39/.

ÜSE HERSAN

DÎDEVANÊ SERDEMA XWE YÊ DAWÎ BÛ..!



Dr. Deham Ebdulfettah

Ka em ê ji kû dest pê bikin ...! Temenekî dirêj , jînenîgariyeke rengîn ... û hişekî bîrewer û zelal , hemû buyer û büyînên ku li dirêjahiya wî temenî qewimîne yan jî berguh bûne tê de amade û berdest in ... !

Zincirek ji bîranîn û bîreweleyen dîrokî di ber çavan re derbas dibe ... xelek li pey xelekê dikişe û dirêj dibe ... dirê.. ê .. êj û qonaxêne serdema kurdeweriya tozgirtî nîşan dike ... ! Her qonaxeke nîşankirî bi bazinekî sorxwîn hatiye dorpeçkirin û bi tilîkên dîdevanê vê serdema xwînî hatiye morkirin û wajokirin (imzekirin) ...!

Di navbera " Sêmitikê Newaf "û " Amûda Şewitî " de (95) caran ev Zemîn li dora rojê geriyaye (1915 – 2010) . Di her çend geran de qûçek hatiye rakirin û her qûçek bûye qonaxek ji qonaxêne jînenîgariya dîdevanê vê serdema me ya wêran û sitimî ... !

Pêşengêni riya azadiyê , weku sitêrên ronîdayî di şevêne Amûdê de tovêne bîreweleyen diçandin . Li dora te bûn , heval û hogirêne te bûn ... tu jiwan bûyi û ew ji te bûn ... ! Hûn xwazîyarêne ronahiyê bûn , tu û hevrîyêne xwe . (Mele Hesenê Hişyar , Reşîdê Kurd , Evdê Têlo , Osman Sebrî , Qedrî Can , Cegerxwîn , mihemed Elî Şiwêş , Ehmed Nafiz , Tîrêj û ...). Erê

...! Hûn bûn evîndarêن ronahiyê , xwazgînên rojê ..! we di tarîka şevêن Amûdê de tovêن ronahiyê diçandin ...!!

Çiqas zor û zehmetî we kişand..! we çiqas azar , renc û rencorî daqurtand ..! çiqasî hûn di sermê de , di germê de , li çol û gundan ,tî û birşî şevder diman ...!

Rast , tu nexwendî bû , lê te ezmûna hemû hevalêن xwe yên ronakbîr û xwendewer , di dilê xwe de meyandin . Tu bi textoran re yawir û birînpêç boyî , bi nivîskar û zanyaran re tu şagirt û guhdêr bûyî , bi ramyar û siyasiyan re tu ji wan bûyî ..! Di hemû qonaxêن xebata welatperwerî de tu yek ji wan bûyî ...! Di xweşiyê de , di reşiyê de tu yek ji wan bûyî ...!

Ew pêşengêن riya azadiyê tev çûn , koçkirin û çûn ..! Hebanêن ezmûnên xwe vala kirin dilê te û çûn ..!

Erê , ew çûn û tu li pey wan , weku dîdevanê wê qonaxa dîrokî , mayî!

Di çarçova wê qonaxê de , çi dihat pirsîn tu ji pirsê re amade bûyî ...! Tu dîde û dîdevanê kes û bûyerên wê dema xwînî û qedexe bûyî ...!

Ez û tu , em (35) salan bi hev re , cînar bûn , dost bûn û heval bûn ..! Bi hev re em diçûn nêçîrê , diçûn seyrangehan û bi hev re em li şevbuhêkên siyasi û rewşenbîrî jî amade dibûn ..! Eger carekê nexweşiyek li mi peyda bibûya (nîvê şevê bûya jî) , tu û texturê xwe , hûn li ber sere min amade dibûn , we ez derman dikirim ..! tu ji min re bav û bira bûyî ...!!

Van salêن dawî gavêن te kurt bûbûn , te nema xwe ji tarê berdida . Te her êvarê li zengilê mala min dida û tu li nik min rûdiniş ! pirs û bersivêن te ne yên mirovekî (95) salî bûn . Hişê te , zimanê te , bîreweriya te ,yad û bîranînê te , tev çak û ciwan bûn ..! Te hemû bûyerên giring li cîhanê (nemaze yên bi Kurdan ve girêdayî) dişopandin ..!

Roja (24/ 8/2010) , disan wekî her roj , tu li cem min bûyî û bi wê germiya dilê xwe ya her car te pirsî :

- De bêje lo : çi heye , çi tune ye

- Ma wê çi hebe , Bavê Dara ?! Her tişt wek berê ye , tiştekî nû nîne!!

- Ma hikûmeta Îraqê çênebû , lihev nekirin ?!

- Na , na ..!

- Tu dibê rewşa me Kurdan wê çawan be ..?!



- Baş e û wê baş be jî !!

Demjimêr bû nêzî (6) . Te hêz da xwe da ku tu rabî . Tiştek hat bîra te , te cihê xwe xweş kir û te got :

- De bêje , lo ..! Eger ez mirim tu yê min li kû veşêri ?

- Li goristana Amûdê , li rex gora Diya Dara û keça te Gulê ...!!

- Baş e ...! Ma cî li wir heye ?!

- Erê , erê heye !!

Tu rabûyî ser xwe û tu çûyî ! ... û cereke dî min dengê te nekir...!!

Beriya ku bigihêje mala xwe riya xwe bi cînarekî nexweş xist , çû serdana wî . Bi dengê topa rojiyê (fitarê) re gîhişte malê . Şîva xwe xwar , nimêja xwe kir û çû ser textê xwe . Li (hewşê) xwe li ser nivînê xwe dirêj kir ..!

Nêzî demjimêr (9.45) qêrîn jê hat : Nûra , Nûra were ...ez mirim ...!

Keça wî Nûra pêve çû , .. Serê wî rast kir .. kir kixt – kixt ...! Xwest tiştekî bibêje , devê xwe vekir da bibêje , lê – mirinê rê nedayê û negot ...! Çavên xwe girtin û ... tiştek negot ... , negot û çû ... !!

Gelek tişt ji me re gotin û gelek jî negotin , pêre çûn ... û ... negotin ...! Xwest ku bibêje , lê negotin ...!



Projeya Dibistanên Kurdi li Almanya

Dr. jur. Celalettin Kartal

Pisporê mafê mirovan,
kêmnetew û migrasyonê
Almanya, 04.08.2010.

*Ez vê nûsafê bo bîranîna dehsaliya mirina diya xwe
Rinde' pêşkêsi komelên kurdên li Almanyayê dikim.*

Projên hevpar riya hevkari û yekityî vedikin.

Bo ev nûsaf (rapor) baş bêt famkirin divêt hem rapor hem jî jêrenotên wê yeko yeko bêt xwandin.

Wek têt zanîn derfetên pêşveçûna zarokên biyaniyan di dibistanê dewleta alman de kêm in,² lê “derfetên” zarokên kurdan kêmtil in.³ Dîsa têt zanîn ku *mafê perwerdekirinê mafeke bingehîn e.* Ne tenê dewlet her wisa jî komel, civak û mezheb jî dikarin vî maffî bo zarokên xwe bi karbihînin. Bi vê riyê civaka sunî, ya elewî û ya êzdi, dikarin li Almanyayê taybetiyê xwe biparêzin, zarokên xwe ji bo pêşerojê (paşerojê) amade bikin.

I. Hejmara dibistanêن taybet li Yekîtiya Ewrûpayê

¹ „Civaka bê rê, ol û erkan wek pezê bé xwedî ú bé şivan e.“

² Di nûsafa hikûmeta Alman ya dawî de hate diyarkirin ku zarokên koçberan qurbanen nîzama perwerdekirina dewleta Alman in. Heke zarok wek hev bin ji notên xirab didin zarokên koçberan, bîner li:

<http://www.welt.de/politik/article2575516/Die-neue-tuerkische-Elite-in-Deutschland.html>

³ Kürtlerin eğitiminde başarılı olmaları için Kürt kurumlarının sorumluluk üstlenip buna yönelik lobi çalışmaları yapmaları şarttır.

Li Almanya hejmara dibistanên taybet di sala 2006an de nêzîkî pênc hezaran bû (4.700), ango ji sedî % 7 in. Li Awusturya ji sedî % 11, li Danmark ji sedî 24 %, li Spaniya ji sedî % 32, li Îrland ji sedî % 58, li Hollanda ji sedî % 67 dibistanên taybet in. Hejmara dibistanên taybet di zikê hevde li dewletên OECD ji sedî % 24 in.¹ Rewşa zarokên koçberan li Almanyayê li gor deweltên OECD xeter e.²

Têt zanîn damezrandina dibistanên taybet di destêneyaletan de ye. Di pratikê de eyalet gelek pirsgrîkan ji damezrîneran re derdixin. Ji ber vê yekê *kesên dibistanên taybet damezirînin divêt karzan bin.* Tenê heke planekekwan yê bi rêk û pêk, zelal û berfireh hebe, wê serkevin.

II. Girîngbûn û armanca projê

Bo serkeftina zarokan zimanê dayikê misoger e.

1. Kurdên sunnî

Kurdên sunnî dikarin ziman û toreyên xwe bi vê riyê biparêzin; dikarin girêdayî welatê xwe bimînin; dikarin zarokên xwe fêri dîroka welatê xwe bikin; dikarin wan li Almanya baştır têkildar (întegre) bikin; dikarin dersêna ola îslamê li gor mezheba Şaffî bidine xwandin; dikarin pêşeroja zarokên xwe gaşter bikin; dikarin bibin nimûne ji kurdên welat re; dikarin alîkariya amadekirina “stratejiyeke hevbeş” ji bo hemû kurdan bikin û pireke dialogê ji hemû kurdan re ava bikin; dikarin dîroka îslamê di bin çavekî hevdemî de û li gor berjewendiyê kurdperweriyê binivîsinin; dikarin diyalogeke bingehîn di nav xwe û êzdiyên Almanyayê de ava bikin; dikarin bi alîkariya ronakbirênen xwe yên derveyî welat ola îslamê li gor “mercên dîrokî” şirove bikin; hemû devok û zaravayên zimanê kurdî li gor derfetên xwe nêzi hev bikin.

2. Kurdên elewî

Kurdên elewî dikarin bi heman riyê bêhtir serkevin; dikarin çêtir li zimanê dayikê xwedî derkevin; dikarin kêmâsiyên elewîtiyê di derbarê felsefê de temam bikin; dîroka xwe ji nuh ve bikolin û binivîsin û hwd.

¹ Biner li: <http://de.wikipedia.org/wiki/Privatschule>

² Wek di ezmûnen PISA de derkete holê “micalen wekheviyê” di perwerdekirina Alman de tune ye, birîn li Soziale Herkunft entscheidet über Bildungserfolg, Konsequenzen aus IGLU 2006 und PISA (2008), S. 18, <http://library.fes.de/pdf-files/stabsabteilung/05314.pdf>.

3. Kurdên êzdi

Êzdi hem bi navê kurdên fermî û hem jî bi navê hostêyên “kurdiya modern” têne naskirin. Ji hemû bawermendan re tiştên bingehin (*basic*) ferz in, lê piraniya kurdên êzdi yên li Almanyayê ji *basic* “bêpar in.” Balkêş e ku iroj piraniya *akademikeren* êzdi tenê dikarin bi zimanê Almani xwe baş ifade bikin. Zarokên êzdayî li gor zarokên koçberan ne serkeftî ne. Hem *akademikeren* êzdi û hem mindalên wan di malên xwe de bi almani diaxivin. Bi gelempêrî “dûnavêñ êzdi” jî nikarin erkên parastina ola xwe bi cîh bihênin. Dîsa bi gelempêrî zanîna wan di derbarê çand û olî de kêm e. *Ew tenê dikarin bi riya perwerdekirina xwendegahan serkevin.* Êzdi dikarin zarokên xwe bi vê riyê fêrî zimanê kurdî bikin; dialogeke berz di nava xwe û olên din de saz bikin.

Qewl, diha, çîrok, serpêhatî, stran û berhemên êzdayî, bi zimanê kurdî ne.¹ Beşek ji van berheman kêm têt famkirin. Êzdi dikarin bo perwerdekirinêke hevdemî wan bi kurdiya nûjen bi weşînin. Ew dikarin dûnavêñ xwe (zanyarên olî) wek “teologên” xaçperestan, ilimdarên îslamê û keşeyên cihûyan, di dibistanêñ xwe de perwerde bikin. Êzdi dikarin bo vê yekê zankoyeke xwe li derveyî welat damezîfînin. Ew dikarin bi zimanê kurdî pêwendiyêñ berz di nava xwe û êzdiyêñ welat de ava bikin.

Damezrandina dibistanêñ kurdî wê li Almanyayê bo kurdan gaveke dîrokî be. Ev dibistan wê bo kurdên bakur jî bibe dibistana yekem. Wekî din ev proje wê rê ji gelek xebatêñ din re jî veke. Bi kurtî heger kurd li gorî vê raporê dibistanêñ xwe damezîfînin, wê bi ser kevin.

Beriya ez di vê nûsafê de li ser sê eyaletên Alman (NRW, Nds., Hessen) û cûdayêñ zagonêñ wan rawestim, dixwazim hinek bersivêñ ku min li ser proja dibistanêñ taybet wergirtine, di vir de pêşkêş bikim.

III. Bersivnamên pirsiyarnamê

Pirsgirêka aboriyê wê barê herî giran be ji bo birêvebirina vê projê

1. Platforma Êzdiyan Celle (PEC e. V.)

Wek serokê PEC di bersiva xwe ya 13. 01. 2010 de destnîşankiriye, komela wi “wek navend” dixebsite. Her weha “nêzî 150 heta 200 malbat” girêdayê komela PEC in. Hejmara zarokên kurd yên ku li herema Celle “diploma lîseyê” (Abitur) werdigirin ji sedi % 5 heta % 8 in.

PEC ragihandiye, (Ganztags-)Gesamtschule ji zarokan re baştır e: Zarok di vê dibistanê de arîkariyeke bi taybet diwergirin. Di heman dibistanê de xurtî û kêmasyiyêñ wan têne ditin. Zarokê kêmasyiyêñ wî di derbarê fêrbûnê de hebin, mamoste bêhtir alfîkariya wî dîkin. Ji bilî vê dinivîse, divêt zimanê kurdî di bawernamêñ zarokan de jî wek (ber)nívîsk cih bigre. PEC bawer e, ku ev proje dikare bibe “pira diyaloga” di nav kurd û welatê wan.

Zarok pêşeroj in; xebata perwederkirinê erkekî bingehîn e; zarokên perwerdekirî xwe baş nas dîkin; ew hem xwe û hem jî welatê xwe bizanîn diparêzin; PEC di her alî de amade ye bo pêşkêşkirina proja dibistanêñ kurdî.

Dîsa di heman bersivê de diragehîne, ku pêwîst e di destpêkê de dibistanêñ taybet li bajarê Celle, eyaleta Bremen û bajarê Oldenburg bihêne damezrandin. Li gor wî girîng e ev proje bi karzanî û bi riya mamostêñ berz bimeše. Diyar dike, ku ew di “çalakiyêñ xwe de her dem li gor besdaran diaxivin”, (lê) *zimanê almanî* bêhtir têt bi karanîn.”

Serokê PEC bawer dike, ku di destpêkê de kêm nûner (“Elternvertreter”) wê zarokên xwe bisinin dibistanêñ kurdî, lê heger proje serkeve, hingê rewşê were guhartin. Ew dihêne ser ziman, ku divêt ev proje di derbarê kêmasyian de ji aliyê pîspor û nûnerên zarokan ve bê çavdêrkirin/nirxandin. Di dawî de *pirsgirêka aboriyê wê barê herî giran be ji bo bi revebirina vê xizmetê*.

2. Mala Êzdiyan Oldenburg

Di rewşa iro de damezrandina dibistanen taybet ji me re ne karekî sereke ye.

Berisva serokê vê komelê di 24.01.2010 de kete destê min. Wek serokê vê komelê ragihandiye 240 malbat girêdayê vê sazgehê ne. Tenê bîst zarok besdârî dibistana lîseyê dîbin. Ew xuya dide, ku ew di civinêñ xwe de bi kurdî û almanî diaxivin. Ji bilî vê dibêje, “bi rastî jî perwerdekirina zarokan.. girîng e.” Damezrandina dibistanêñ taybet li Almanyayê hişeyeke balkêş e. *Lê li gor rewşa iro ji me re ne karekî sereke ye.* Berî ku em vê derfetê ji xwe re bi kar bînin, pêwîst e em “pêşî karêñ xwe yen bingehîn pêk bînin.” Di vî warî de hîna... kemasiyêñ me hene. Divêt bêt zanîn, kû endamên me di herema xwe de têkiliyan bi dibistanan re dañîn û li rewşa zarokan dipirsin. Her weha em amade ne bo danasîn û piştgiriya vê projê hemû ronakbîr û karsazan vexwînîn ser komcivînekê.

3. Mala Êzdiyan Emmerich

Pêwstiya me bi dibistanêñ kurdî “... ji nan û avê bêtir” heye...

¹ Concerning Kurdish language and vocabulary, Ezidies' religious texts have been written in pure Kurdish to a great deal thereby preserving hundreds of pure Kurdish vocabularies, p. 13, birêñ li <http://www.lalishduhok.org/books/lalishbook.pdf>

Serokê komela Emmerich di berisva xwe ya 27.01.2010 de ragihandiye, ku li Emmerich dora 300 malbat pişgiriya komela wî dîkin. *Li gor wî ev proje di warê leçûnê (mesref) de ne barekî giran e.* Hejmara zarokên li Emmerich ku besdarî dibistanê lîseyê dîbin, nayêt zanîn, lê ragihandiye, ku keç di derbarê perwerdekirinê de ji kur'an serkeftitir in. Ji bili vê dibêje, pêwîst e em "lobiyek" xurt avakin; zarokên xwe di civaka Alman de bi erêni komê ser hev bikin (positive Integration). Ji bo vê xebatê zemineke qanun ku em pê li xwe û mafêne xwe xwedî derkevin heye. Her weha ev proje bi nirx e. Anglo, divêt li ku derê pêwîstî hebe, li wir dibistanê kurdî werine damezrandin.

Wekî din serokê komela Emmerich dinivise, ku rast e bi vê projê mafê zarokên kurdan wê baştır werine parastin. Ew bawer dike, ku "ev proje dikare yekîtiya ...êzdiyan... jî ava bike." Dîsa li gor wî gelekî "pêwîst e" dibistanê kurdî hebin û bi lezgînî werine damezrandin. Di dawiyê de dinivise, heger ev "...proje di xizmeta ol... û netewa me de be, em amade ne, pişgiriya" wê bikin. Di heman bersivê de diragehîne, ku pêwîst e di despêkê de proje... ji aliye "komîta rêvebir" ve were naskirin û erêkirin. "Piş re bi endamên wê re" were axeftin; dû re "civînên gel werin çêkirin." Hingê "Mala Êzdiyan Emmerich" dikare têkeve xizmeta vê projê. Ji bilî vê dibêje, "pêwîst e komisyonek were li darxistin. Bi hemû mal û komelan re hevdîtin werine bikarhanîn... Bi vê riyê rexstinek ji qanûnnasan jî were damezrandin. Dîsa wek ew destnîsan dike, "...pêwîstiya êzdiyan bi vê projê ... ji nan û avê bêtir" heye,...", lê dibêje, "...em dereng mane" bo vê projê.

4. Mala Êzdiyan Celle

Ev proje ji sedî sed riya serkeftinê ye.

Serokê vê komelê di 05.02.2010 de bersiv daye. Wek ragihandiye, 900 malbat girêdayê vê komelê ne. Di her malbatê de 5 ta 9 kes dijin. Ew dinivise, derbarê entegrasyonê de dewlet peyvîn "têkelkirin" û "helandin" tevlihev dike. Dema behsa "têkelkirin" (entegrasyon) dike, mebesta wê helandin e. Ew dibêje, ku zarokên êzdi ji sedî % 5 besdarî lîseyê dîbin.¹ Anglo rewşa zarokên kurdan li gor zarokên koçber xeter e. Divêt berî her tişti "yekîti" di nava kurdan de hebe. Her weha dibêje, divêt dibistanê kurdî li gelek bajarê Almanyayê hebin.² Perwerdekirin

ya di derbarê ol, dîrok û ziman de girîng e; perwerdekirineke rast pêsiya şâşîyan jî digre. Tîne ziman, ku komela wî amade ye pişgiriya vê projê bike, lê divêt meriv ji vê xebatê re "jidil" be. Dibêje, ev proje ji sedî sed riya serkeftinê ye. Heger dibistanê me hebin, "nûnerên zarokan" jî wê zarokên xwe bişînin dibistanê kurdî. Wek ew dinivise ji bo vê xebatê "pere" hine, lê divêt, pêşî yekîti were avakirin. *Ji bo destpêkirin û birêvebirinê ew amade ye li gor derfetén xwe hemû alikariyê têxe xizmeta vê projê.* Diragehîne, ku ew ji bo nasandina vê projê di demke kin de bi hemû karmandan re li Mala Êzdiyan li Cellê komcivinekê li darxîne. Di dawiyê de diragehîne, ku ji bo *finanskirina* vê projê hinek derfet hene mina "kasa êzdiya, projen Yekîtiya Ewrupayê û yên Alman."

5. Komela Kaniya Spî

Ev proje pirr dereng maye, divêt bi lezgînî were destpêkirin.

Bersiva vê komelê di 07.02.2010 kete destê min. Ev komel dinivise, ku çalakiyên wan hem bi kurdî û hem bi almanî rîvediçin. Wekî din dibêje, ku ew bi derfetén damezrandina dibistanê taybet aghedar e, lê ne bawer e ku êzdi bikaribin dibistanan damezrînin, heger dewlet arîkariya wan ne ke. Ew dibêje, dibistan her roj pênc seet ji bo dersan bes in, lê (*Ganztags-Gesamtschule* wê hemû wextê rojê dom bike. Ji bilî vê tîne ziman, ku ev projê baş e. Her weha ew dibêje, zarok wê bi vê riyê girêdayê gel, ol û welatê xwe bimînin. *Lê ev proje pirr dereng maye, divêt bi lezgînî were destpêkirin.* Yekser bal dikşine ser girîngiya vê projê, dinivise, divêt hemû malbat jî pişgiriya vê xebatê bikin. Lê gumanê wî hene: Gelo zarok wê besdarî dibistanê kurdî bibin yan na. Li gor nerîna wî "ev proje pirr baş e ji bo êzdiyan." "Ev proje wê pêşî li riya helandinê... bigre"... Wekî din dibêje, "em dikarin mamostan pêşkêş bikin û ci ji me were xwestin wî jî pêşkêş bikin..." Di dawî de ew tîne ziman, *ev proje ne barekî giran e bo civaka me*, lê em tırsiyane û gelek caran hatine xapandin. "Her mal dibêje ez, lê di derbarê xebatê de tiştek jî li holê tune ye. Hêjayê gotinê ye, ku ew radighîne, "dibistanê me di bajarekî de anjî li du bajaran têra me na kin. Pêwîst e damezrandin ji aliye dewletê ve were "pêkhanîn." Ev tiş ji mal û komelan re pir zor e, anglo divêt bi riya dewletê be, hingê proje wê ciyê xwe bigre."

6. Civaka Êzdiyan Hessen e.V (Lollar)

Kengî meriv dikaribe vê projê finanse bike, hingê divêt meriv dest bi vê projê bike.

Min bersiva serokê vê komelê di 24. 02. 2010 wergirt. Ew dibêje, em vêga li 160 malbatan dinerin. Ew li eyaleta Hessenê dijin. Her weha piraniya wan bi almanî diaxivin. Di herêma wan de endamên wan dersên

¹ Binêr li bersiva PEC ku behsa hejmareke din dike. Lê herdu jî li gor texmînen xwe behsa hejmarek dîkin.

² Celle, Hannover ú derdora wê, Oldenburg, Bremen, Solingen, Nienburg, Berlin, Bielefeld, Herford, Detmold. Hameln, Hamm, Emmerich, Kleve, Wesel, Goch, Leer (Ostfriesland), Lingen.

olê dibînin.¹ Ji bilî vê yekê dinivîse, heger rewşa zarakan xeter be, divêt meriv kesên zane ji zarakan re “peyda bike.” Li gor wî tenê (*Ganztags-Gesamtschule*) dibistana herî guzîde ye. Her çend bersiva hinek pirsan ne daye jî, destnîşan kiriye, ku divêt “dibistanê êzdi” jî hebin. Ji bilî dibistanê taybet divêt zankoyeke olî, ango “akademiyekê xwedênaşıyê” hebe. Her weha texmîn dike, ku di destpêka vê projê de gelek pirsgirêkên derêن holê. Lê ew dixwaze bîhêne ser ziman, ku ev projake pirr baş e. Bi vê projê hem rewşa zarakan û hem jî rewşa hemû êzdiyan wê baştır bibe. Ew bawer dike damezrandina dibistanê taybet, wê bibe piştgiriya sazkirina dibistanê li welat jî. Dibêje, *kengî meriv dikaribe vê projê finanse bike, hingê divêt meriv dest bi vê projê bike.* Wekî din dibêje, erkên hemû êzdiya ye, ku zarokên xwe di derbarê civakî, çandî û ronakbîrî de pêş ve bibin. Ragihandiye, ku *heger ev proje bi karzanî bi rê ve here, ew ê arikariya vê projê bikin.* Dinivîse, di destpêkê de wê ne hêsanî be ku zarok ji bo besdarbûna dibistanê kurdî werine komkirin. Di dawiyê de balê dikişine ser xaleke girîng, pêwîst e ne kurdên êzdî, lê merivîn vê projê bi rê ve bibin, jê bawer bikin. Herê, berî her tişfî komela wî dikare ji bo vê projê propaganda bike. Her weha komela wî amade ye bo danasîna vê projê komcivinekê jî li dar xe. Li gor nerîna wî ev proje ne bargiraniyek e.

7. Pirtûkxane û Muzexaneya Kurdî Li Stockholmê

Hîna ji dema destpêkî ve min ev saziya kurdên li Swêdê bi vê projeyê agahdar kir. Ev dezgeha kurdî,² hem bi damezrênerê xwe yê xwedî pézanînê pirsên li ser perwerdeyî û hem jî bi serwet û samanên kurdî yên çandî û wêjeyiyênen xwe yên kombûyî, saziyeke girîng e. Damezrênerê saziyê, panzdeh salan karê mamesteaya kurdî kiriye. Vî karî, li dawiya xwandina zanistgehê û bi xwedîbûna diploma, bi şeweyleke fermî kiriye. Ji 23 salan vir ve ye jî, ku bi dehhezarân berhemên wêjeyî yên kurdî komê ser hev kiriye. Ev dezgeh ji aliyê dezgehê dewleta Swêdê xweyî dibe.

Dezgeha Sazendeya (weqfa) Pirtûkxane û Muzexaneya Kurdî ji min re da zanîn, ku ew bi her awayî piştgiri û alîkariya vê projeyê dike.

¹ Wek endamekî heman komelê ragihandiye min, ew ji amade ye propaganda vê projê bike. Divêt bê zelalkirin, ev dibistan wê li ku derê were damezrandin. Wekî din kî mafdare besdari vê dibistanê bibe, kî divê lêçûnê (mesref) bide, ci başî û xirabiyênen vê dibistanê hene. Herê, derfet hene, lê starejiyeke hevbeş şert e. Ta vêga ev strateji tune ye. Wek min got, divêt were gotin, ci armanc bi vê projê werin pêkhanin. Bêyi guftûgo ev tişt na be. Serhat Ortac 14.02.2010.

² www.kurdishlibrarymuseum.org

8. NAVEND – ji bo Lêkolînê Kurdî

Di rewşa iro de damezrandina dibistanê kurdî pirr zor e.

Min Bersiva serokê vê komelê min di 20.05.2010 wergirt. Ew radigihine ku 120 endamên komela Navend hene; hemû çalakiyên wê bi zimanê almanî ne, tenê car-caran bi kurdî ne. Rewşa mindalên kurd di eyaleta NRW ji ya zarokên tirkan xetertir e. Ji ber vê hindê pirr girîng e ku dê û bavên mindalan li zarokên xwe yekser xwedî derkevin. Divê kurd ji “komelên nûnerên zarokan” û „çandeke hemdemî“ bo fêrkirinê ji xwe re biafirinin. Bi vê riyê ew dikarin rewşa mindalan bi guhêrin. Pêdiviya wan bo vê yekê bi kesên zana û pispor heye.

Serokê vê komelê dibêje, ku wî hîna xwe di mijara damezrandina dibistanê kurdî de yekdil nekiriye. Bi ya wî heger dibistan ji hemû zarokan re vekirî bin, entegrasyon mimkun e, lê eger dibistan ji herkesi re ne vekirî bin, hingê “taluka cihêbûna komên homojên” dertê holê.¹ Radigihine, ku di rewşa iro de damezrandina dibistanê kurdî pir zor e. Dibêje, tişte herî baş ev e, ku bo mindalên kurd “baxçêñ zarokan bi du zimanan” bêne vekirin. Her weha divê fêrkirina zimanê kurdî di dibistanê alman de wek zimanê biyanî hebe. Wekî din dinivîs e, divê meriv li ser mijara damezrandina dibistanê kurdî têkiliyên xwe bi “zanyarên kurd” re deyne. Beriya destpêkirina projê li ser *sans* û riskên wê bifikir e. Damezrandina dibistanê kurdî micaleke bo zarokên kurd. Lê divê “herem” jî piştivaniya damezrandina dibistanê kurdî bike û wan bi erêni bi pejrin e. Bi ya wî ev yek ji bo serkeftina dibistanê kurdî pirr girîng e.

Ji bilî van bersivan min çend bersivêngirîng ji henek nasen² xwe jî giritin. Di heman bersivan de tene yek ji wan behsa paşxirabiyênen projê dike. Eşkereye ku ev nasê min li gorî civaka serdest porja dibistanê kurdî dinxirin e.³

¹ “Kurdische Privatschulen können ein Weg zur spezifischen Förderung von kurdischen SchülerInnen darstellen, beinhalten aber die Gefahr der Segregation bei rein monoethnischer Zielgruppe,” so Metin Incesu, 20.05.2010.

² a) Bi rastî pêşînyara te... ji bo zarokên êzdiyan...gelekî bi nîrx e. Ev dibistan ji bo tirkan hene. Her weha ji bo ermeniyêñ Fernsa jî dibistanê taybet heta sinifa liseyê hene. Bi vê yekê ermenî tu carî zimanê xwe ji bîr nakin...Tariq Hemo, Brussel 18.11.2010.

b) Bêguman dê pir baştır bûya ku hemî kurdên li Almanyayê dijîn, besdari projeyeke weha bibin. Di bin sîwana fenomena “miletê kurd” de dibistanê welê ava bîkin û her yek ji wan karîbin rengêñ ol, mezheb û dialektên zimanê kurdî di nêv de bibînîn, perwerde û agahdarîyen hewce werbigirin. Lê divê bêjim ku hûn bi ci awayî an jî di kîjan çarçoveyê de bîkin jî karekî hêja ye. Serdar Roşan, Stockholm 4.7.2010.

³ “Der Gründung einer ezidischen Schule stehe ich skeptisch gegenüber; im Grunde benötigen Eziden nur Unterricht in ihrer eigenen Religion bzw. Kultur; das könnte man im Rahmen eines staatlich kontrollierten Religionsunterrichts besser bewerkstelligen; dadurch würde

IV. Nirxandinek

Her destpêk bi zimane, lê ziman nirxê herî girane.

Li jor hat destnîşankirin, ku serokên komelê bersiv dane, behsa girîngbûna dibistanêñ kurdî dikan. Her weha em dibînin, ku hinek ji wan dinivîsin, damezrandina dibistanêñ kurdî di derbarê aboriyê de bargiraniyeke (PEC e. V.) û hinek jî nerînê berovacî diparêzin (Emmerich û Celle).

Wekî din her çend hinek serokên komelan (Celle û Emmerich) diragihînin jî, *dîsa jî diyar e ku derfetêñ wan yêñ aboriyê kêm in.*

Girîng e were gotin, ku "yekîti" yan jî "hevkarî" her dem bi riya projen hevpar (hevbeş) pêk têt. Yekîti ji ber xwe yan jî bêyi guftûgo pêk na yêt. Li her derî yekîti yan bi riya zextêñ ji der yan jî bi riya projeyen hevpar pêk têt. Ji xwe komela Emmerich û ya Celle jî behsa girîngbûna "yekîtiyê" ("tifaq") dikan. Lê wek li jor hat gotin (birêñ li II), "projeya dibistanêñ kurdî" bo hemû kurdan têra xwe armancêñ hevpar diafirîne.¹ Ango beriya kurdêñ êzdî ji hev tam belav bibin, dikarin vê projê li gor berjewendêñ xwe bi lezgînî meşq bikin (biceribînin). Rast e, "yekîti" geleki girîng û dijwar e, lê *riya baştırın hevkariyeke bingehîn e.* *Hevkariyeke bingehîn ji yekîtiyeke xwar çêtir e.* Heman rê dikare di domanê de bibe sedema yekîtiya komelêñ êzdayiyê. Bo vê yekîti divêt ev proje di nav hemû komelan de bi berfirehî were guftûgokirin. Heger na komelekê li ve projê xwedî derkeve û ya din wê gîlî û gazindêñ xwe pêşkêşî sazgehêñ eyaletê bike. Heger sazgehêñ eylatê ji aliyêñ komelêñ kurdî ve bi şâşî bihêne agehdarkirin, hingê ev proje dipelişe. Belam ev proje di bernama xwe û di bingeha xwe de xebateke hevkariyê ye. *Eşkere ye ku tenê di domanê de û bi riya hevkariyeke bingehîn yekîti dikare were ser pê.* Ev rê li ser projen hevpar, bernamêñ hevpar, armancêñ hevpar û berjewendêñ hevbeş ava dibe.

Wekî din hema bêje tev dinivîsin, ku *ev proje dereg maye.* Ji bilî vê hemû serokên komelan dibêjin, ku ew amade ne hemû ronakbîr û karsazan vexwînin ser komcivînekê.

Balkeş e ji bilî Navend *yen komelek jî behsa nebaşıya vê projê na ke.* Navend li gorî civaka serdest² li mijara damezrandina dibistanêñ kurdî dinêre. Eşkere ye ku ev nerineke "erzan e." Heger ev raman rastbûya, divabû hemû dibistanêñ dêrîn alman riya cihêkirinê vekirina. Wek têt

auch der Kontakt zu anderen Religionen nicht abreißen (keine Gefahr einer sich erweiternden Subkultur)." Serhat Ortac, Hannover 14.02.2010.

¹ Teolojiyeke standard, pirdeke dialogê, parastina ol û ziman, serkeftina zarakan, zemînekî hevkariyê û hwd.

² Ji xwe eşkere ye ku herem ji avakirina dibistanêñ kurdî re nabin piştivan. Berovacî vê yekî herem wê gelek caran bibin asteng bo dibistanêñ kurdî li bajarêñ cure-cure neyén avakirin.

zanîn, iro bi hezaran dibistanêñ dêrê hene. Di nava van fergehan de bi sedan xwendegehêñ yek mezhebî hene. Ta iro tu kesî negotiye, ku dêr riya cihêkirinê di parêze. Armanca hemû dibistanan serkeftina mindalan ne. Nexe ev nerin di eslê xwe de "propaganda" civaka serdest e. Serokê vê komelê jî vê yekê baş zane, lê di vir de Navend an bi zanîn anjî bê zanîn "berdevkiya" civaka serdest dike. Ji bilî Navend tenê yek ji komelêñ jorîn diyar dike, ku ew ne bawer e, kurdêñ êzdî bikaribin bi tenê û bi serê xwe dibistanan damezrînin (Kaniya Spî). Li gor vê komelê pêwîst e dewlet arîkariya wan bike, hingê dikarin dibistanan jî damezrin in. Wek serokê heman komelê di telefonê de ji min re ragihand, ew behsa arîkariya aboriyê dike. Ji xwe hejayed gotinê ye, ku ez di vir de bibêjim ne erkدارiya dewletê ye pêşîya riya belavbûn û helandina kurdêñ êzdî asteng bike. Ji bo nimûne li gorî qanûn bernamake dewletê bo parastina nasnameyên koçberan û civaka wan tune ye!¹ Dewlet li gor qanûnê derfetê dide her kesekî. Dîsa balkêş e ji van serokên komelan hima bejê yek jî behsa girîngbûna perwerdekirina bi zimanê dayikê na ke.² Tenê serokê PEC yekser behsa pejirandina zimanê kurdî dike. Ji bilî vê rastiyê, divêt were gotin heger di hinek dersan de perwerdekirin bi du zimanan be yan jî bi kêmanî beşek bi zimanê dayikê be, li gor nerînêñ hemû vekoleran zarok wê serkeftîr bin. Lewma dewletêñ herî peşketî, dibistanêñ xwe li her derê û li her welatî vedikin.³ Al û sebolêñ xwe, ziman û çanda xwe li her derê diparêzin. Lê raste, dema civak, mezheb yan jî kêmnetew dibistanêñ xwe dixwazin vekin, ew bi pirsgirekên dijwar re rû bi rû dimînin.

Di ser vê yekîti jî diyar e heger damezrînerên dibistananêñ taybet ne zîrek bin, eyaletêñ berpirsiyar wê gelek pirsgirêkan ji wan re derxin in. Lê divêt ew jî wek her kesî ji qanûnêñ dewletê ji xwe re sôd werbigirin. *Pêwîst e kurd jî bibin aktor û legerê çarenûsa xwe.* Ji aktoriyê re zanîn, agahî, bername, mical û bawerî şert e.⁴

Gelo makeqanûn û yasayêñ Alman di qanûn de çend rê û derfetan didin bo damezrandina dibistanêñ taybet? Ev proje bi ci riyê dikare bi karzanî were destpêkirin? Rê û derfetêñ "finanskirina" ve projê li kîjan eyaletan û

¹ Tenê têt zanîn dewleta Alman hin "kêmnetewên kevin" diparêze, lê na xwaze heman mafan bide hemû koçberan.

² Türk kökenli öğrencilerin anadillerini iyi bilmeleri durumunda Almanca'yi da iyi öğreneceği konusunda görüş birliğine varan eğitim bakanlıkları, ardi ardına Türkçe'ye yesil ışık yakıyorlar, birêñ li <http://www.hurriyet.de/haberler/gundem/549111/turkceye-yesil-isik>

³ Têt zanîn ku dewleta alman dibistaneke xwe li Hewlêr di 9/2010 an de diveke. Biner li <http://ds-a.org/de/anmeldung>

⁴ Ji dibistanan re piştgiriya komelêñ nûnerên zarakan, çavdêrkirin û birêvebirina li gorî qanûn fer e. Ji bilî vê yekî ji wan re mamostêñ ziman, çand û olê pêwîstin. Ji xwe hemû mamostêñ din wê bi almani yan jî bi İngilîzî dersêñ xwe pêşkêş bikin.

bi çend in? Ji bo vê projê riya rast kîjan e? Heger komelên kurdî bixwazin proja dibistanêن taybet bi karbihênin, divêt çawa wê bi karbihênin? Ev proje çend dijwar e? Çend “pere” li gor qanûn jê re gerek in? Sazgehêن eyaletê yên berpirs kîjan in? Gelo di destpêkê de pêwîst e ku kurd ci cûreyê dibistanan ji xwe re damezirînin ji bo ku têk ne çin? Ji bo bikarhanîna projê pêwîst e ci komelên wan yên piştivaniyê (Förderverein) hebin? Divêt kîjan demî û çawa daxwaznamêن xwe bo damezirandina dibistanêن taybet pêşkeşî sazgehêن eyaletê bikin? Gelo heger vêga kurd dibistanêن xwe bixwazin sazbikin çiqas dem ji wan re divêt ta ev dibistan werine avakirin?

Hema li jêr ez ê li gorî makeqanûna komera federal û qanunêن eyaletên wê bersivêvan pirsan yeko bidim.

V. Bingeja dibistanêن taybet li Almanyayê

“Law is order, and good law is good order,” Aristotle

Di bin kîjan mercan de eyalet destûra damezrandina dibistanêن taybet dide? Dibistanêن taybet jî her wek dibistanêن eyaletan erkêن perwerdekirinê bi cih dihênin. Lî dibistanêن taybet ji dibistanêن dewelete serkeftir in.¹ *Dibistanêن taybet dikevin dewsa dibistanêن eyaletê* (p. 7 b. 4a). Li gor benda 4ê mafê damezrandina dibistanêن taybet têt bi cih hanîn, ji damezirandina wan re destûdayina ji aliyê eyaletê ve ferz e. Ev dibistan di bin kontrola yasayênen eyaletê de têne birêvebirin. Anglo eyalet li ser wan berpirsiyar e. Ji bo vê yekê divêt ev dibistan di derbarê “armancêن fêrbûnê” de her wek *dibistanêن giştî* (öffentliche Schulen) erkên xwe bîhênin cih. Di derbarê raxistina teknikî jî divêt her wek dibistanêن eyaletê bin. *Ferz e dersdarêwan jî mina mamostênen dibistanên eyaletê perwerdekirî bin.* Ji bilî vê divêt ev dibistan hem ji zarokêñ maldaran re û hem ji zarokêñ belengazan re vekirî bin; ev yek şert e. *Qedexe ye dibistan pirr pere ji nûneren zarokan werbigirin.* Her weha pêwîst e mamosteyêñ di dibistanêن taybet de bixebeitin di derbarê aboriyê û qanûnê de bêkêmasî bin. Heger na, eyalet destûra damezrandina dibistanêن taybet teqeza de. Anglo divêt ev mamoste ne pirr kêmî mamosteyêñ dibistanêن eyaletan meaş (mûce) wergirin.² Her weha dewlet destûrê dide ku dibistanêñ destpêkê (bingehîn) jî werin damezirandin (p. 7 b. 5a).

Gelo şertêñ damezrandina dibistanêñ destpêkê ci ne?

Ji bo nimûnê, li gorî makeqanûn “dibistanek taybet ya gelêri” (Volksschule: Grundschule) dikare were damezirandin.¹ Ji bo vê yekê divêt *sazgeha serkariya fêrkirinê* “taybemendiyek perwerdekirinê” bipejirîne. Heger na, destûra damezrandina dibistanê na de.

Lê ji bo dibistanêñ weha, riyek din jî di makeqanûnê de heye. Ji bo nimûnê heger dê û bavêñ zarokan (nûner) bi fermî bixwazin, ev dibistan dikare weke *dibistanek civakê* jî were damezirandin. Dîsa wek têt zanîn, ev dibistan dikare wek *Bekenntnisschule* jî were damezirandin. Heger dibistanek wisa be, hingê divêt hemû şagirdêñ wê jî ji heman (eynî) mezhebî bin (nimûnê zarokêñ êzdî yan jî yên elewî), lê heger *Weltanschauungsschule* be divêt ew ji her kesî re vekirî be.

Xuya ye ku kurd dikarin li Almanyayê hemû cûreyêñ dibistanan (xwendegehan) vekin. Ew dikarin dibistanekê damezirînin, ku zarokêñ wan herdu danêñ rojê jî tê de perwerde bibin. Ev dibistan dikare *Ganztagsgesamtsschule*² be yan jî *Grundschule* be yan jî *integrierte Gesamtschule* be.³

Herweki kurd dikarin hemû cureyên xwendegehan (dibistanan) damezirînin gelo qanûnên eyaletê alman ji damezrandina dibistanan re geleki asteng in? Heger herê, çend asteng in?

VI. Agahiyêñ li ser qanûnên eyaletan

Agahiyen di derbarêñ qanûn de ji serkeftinê re misogerin. Li jor hat gotin, ku eyalet ji erka perwerdekirinê berpirsiyar in. Komera Federal ji ber vê hindê di makeqanûnê de çarçewek ji bo mercen perwerdekirinê daniye (birêñ li Art. 7 Makeqanun). Hemû eyaleten alman li gorî vê çarçewê qanûnêñ xwe yên perwerdekirinê çap kirine. *Zemîna hemû zagonêñ eyaletan makeqanûn e.* Her eyaletek di barê perwerdekirinê de û zagonêñ xwe de xwediye taybetiyek û cûdahiyekê ye. Eylata herî mazin li Almanya ya NRW e.

1. Birêvebirin û berpirsiyariya li eyaleta Ren-Vestfalya Bakur (NRW)

Wek têt zanîn kurdêñ pirr li eyaleta NRW li Almanya dijin. Bo dibistanêñ taybet, destûrdayin û “finanskirina” karûbarêñ wan paragrafên (§§) 100 heta 115 girîng in.⁴ Gelek rêzikên yasa di naveroka wan de cih girtine. Ez di vê nûsafe de ni karim hemû rêzikên vê qanunê bi berfirehî û

¹ Birêñ li Art. 7 Bend 5 Makeqanun.

² (Ganztags-)Gesamtschule, <http://www.gesamtschule-buende.de/fuereltern/gesamtschule/index.html>

³ Di *integrierte Gesamtschule* de hemû cureyêñ dibistanan (fergehan) hene.

⁴ <http://www.schulministerium.nrw.de/Schulgesetz/teil.jsp?teil=11>

¹ Têt zanîn ku dibistanêñ eyaletê di derbarê “micalên wekheviyê” de “jidî” li erkêñ xwe na pirsin, vgl. <http://bildung.twoday.net/stories/4208648/>

² Birêñ li Art. 7 Bend 4 H. 3 û 4 Makeqanun.

yeko yeko binivîsim. Lî ez dixwazim bi kurî hinek agahiyên bingehîn, ku ji *damezrandina dibistanen taybet* û riya “perekomkirinê” re misoger in (girîng in), binivîsim. Divêt xwendevan agahiyên berfireh li ser vê mijarê di qanûna dibistanen eyaleta NRW de û *biryarnama* (Rechtsverordnung) wê de baş bixwînin. Wekî din ji bo agahiyên destpêkê binere li malpera *Verband deutscher Privatschulen Nordrhein Westfalen e.V.*¹ Ev ‘verband’ heta semîneran ji amade dike. Merivên jidil bixaze dibistanen taybet damezrîne divêt besdareh semînereka vê “serkomela” girîng bibin.

Gelo yasayê eyaletê dibistanen taybet çawa dinirxînin?

Dibistana taybet ji civakê re dewlemendiyek e (§ 100 bend 1). Ew mîna dibistanen eyaletê xedîmaf e; ji şagirtên xwe re destûrnaman derdixe (§ 100 b. 4).² Ji bilî vê li gorî yasayên eyaletê têt rîvebirin (îdarekirin). Divêt komelê damezirenen daxwaznama damezrandina dibistanen xwe ji *sazgeha birêvebir* re pêşkêş bikin (§ 101 b. 1).

Gelo meriv li Almanya dikare dibistaneke olî ji damezrine?

Herê. Agahiyên girîng li ser vê mijarê di benda 5a de ne: Li gorî vê bendê kî bixwaze dibistanen taybet damezrine, divêt ew eşkere bike, ku ew ne dijberê zagon û sazûmaniyê ye (verfassungsmässige Ordnung). Anglo pêwîst e ew girêdayê soza xwe be (zuverlässig). Ev şerîte sereke ye.

Ma meriv dikare bo demeke kurt dibistanan veke?

Na. Heger ku komel yan ji dê û bavêن zarokan dibistanen taybet damezrînin divêt ew wan ne ji bo ‘demsalekê’ tenê bi karbînin yan ji damezrînin. Divêt ew dibistan ji bo domanê damezrînin. Heger salekê dibistan ne xebite, ew dibistan têt girtin. Dema destûra damezrandinê ji aliye eyaletê ve hat dayin, divêt di nava salekê de dibistan bê damezrandin. *Piştî dibistan hat damezrandin divêt damezrêner wê di nava salekê de veke* (b. 7).

Ma kî berpirs e ji bo hemû şertên bicîhanîna destûrê?

Ji vê yekê re *nîrdariya dibistanan berpirs* e (Schulaufsicht, § 104 b. 1). Ji bili vê yekê heman nîdarî berpirs e bo derxistina bawernaman. Wekî din berpirse bo hemû rîzîkên qanûnên bo dibistanen taybet girîng in. Lî heger “xwediye dibistanê” wê bo demeke kurt ne xebitine, dîsa divêt *destûr ji aliyê nîrdariyê ve bixwaze* (§ 104 b. 4). Agahiyên herî girîng di

§ 104 b. 6a de diyar in: Li gorî vê rîzîkê *wezareta berpirsiyar* agahiyên berfireh li ser destûra damezrandina dibistanen taybet, mamostan wan, pîsporiya wan û nîrdariya wan di *biryarnamê* de diyar kiriye (Rechtsverordnung).¹

Gelo kî mafdar e pere bixwaze? Kî mafdar e bo berisandinê?

Dibistanen taybet ji bo arîkariya wergirtina peran xwedî maf in (§ 105a b. 1). Anglo mafê wan heye hem pere bixwazin û hem jî pere wergirin. Nimûne ew pere ji eyaletê bo müçeyên (meaşen) mamosten xwe diwergirin. Dîsa pere bo raxistina dibistanan jî diwergirin. Wekî din pere ji bo hemû avahiyên dibistanan jî diwergirin. Di vê paragrafa jorîn de gelek agahiyên berfireh cih girtine. Divêt meriv van agahiyen baş bixwîne.

Li ser xwediye dibistanen taybet re hatiye ferzkirin ku salê carekê bo karûbarê xwe *planekî* amade bike (§ 112). Di vê planê de divêt hemû ‘perewerdegirtin’ û lêçûnê ji bo dibistanê diyar bûbe.

Hem ji bo berisandin (hesabkirin) û hem bo peredanê *sazgeha nîrdariyê* berpirs e (b. 1). Li ser daxwaziya xwediye dibistanê ev sazgeh her dem bo salekê mafê lêçûnê (mesref) dide dibistanê. Bo vê yekê divêt “xwediye dibistanê” (Schulträger) plana karûbar, *Stellenplan* û listeyek ku tê de diyar e çend mamoste bi ci riyê di dibistanê de dixebeitin û çend müce (meaş) diwergirin bide *sazgeha nîrdariyê*. Divêt xwediye dibistanê vê listeyê pêşkêşî sazgehê bike (b. 1). Pêwîst e ew van tiştan her dem di demê de ji sazgehê re bişne.

Çi di destpêka dibistanen taybet de girîng e? Ji bo dibistanan divêt ci prensîb bîhîn şopandin? Divêt plana damezrandinê cih bide ci? Ci ders bi zimanê dayikê hebin bes e? Kurd dikarin ci mamostan bicebitinîn?

Min li jor nîvîsî (birêñ bin V) ku li gorî teoriya makeqanûnê hebûna dibistanen taybet di bin garantîyê de ne, ango divêt tu kes damezrandin û birêvebirina wan asteng ne ke.

Ne girîng e ev dibistanen taybet di her warî de her wek dibistanen eyaletê bin. Heger eyalet bîne ziman, ku kîmasiyên dibistanê hene û ji ber vê yekê ew destûra damezrandinê ni kare bide/na de, hingê divêt ew vê yekê bi spartek (îspat) bike.

Wek li jorê hatiye nîvîsîn, *bo damezrandina dibistanen taybet divêt prensîba wekhevîyê were şopandin*. Divêt ev prensîb li gorî cudahiyên eyaletan bê birêvebirin. Anglo divêt plana damezrandina dibistanê hem cih bide bernama perwerdekirinê û hem jî cih bide derfetên finanskirina

¹ Ji bo merc û şertên damezrandina dibistanen taybet birêñ li <http://www.vdpnrw.de/archiv/archiv-140502.html>

² Birêñ li § 34 Bend 2 H. 2 SchulG.

dibistanê. Divêt menzelên dibistanê li gorî pêdiviyê wê bin, divêt mamoste û şagirtên wê têra wê bikin. Divêt plana perwerdekirina dibistanên taybet planêن dibistanênya eyaletê bişopînin, lê ne girîng e, ku bi tevayî wek planêن dibistanênya eyaletê bin. Nimûne kurd dikarin ji bo dersên olî, dirokî û felsefa xwe di van dibistanan de mamosteyê wxe bixebitînin. Dîsa dikarin mamosteyê ziman û çanda xwe jî bixebitînin. Heger bernama (konspeta) ji bo perwerdekirin û birêvebirina dibistanênya taybet bi rêk û pêk,ango wek makeqanûnê be, divêt sazgehêن berpirsiyar wê konspetê bipejrînin, astenga li gorî kêfa xwe ji wan re dernexînin.

Piraniya eyaletan piştî sê sal derbas dibin mesref digirin ser xwe. Ev rewş li NRW çewa ye? NRW çend mesref digre ser xwe?

Tenê eyleta NRW hê destpêkê de lêçûnêن dibistanênya taybet digire ser xwe. Anglo dema dibistan hate damezrandin hima bêje hemû lêçunan digre ser xwe. Dîsa balkêş e ku piraniya eyaletan ji sedi % 60 heta % 70yî barê aborî digirin ser xwe, lê NRW mesrefen dibistanênya taybet ji sedi ta % 94 an digire ser xwe.¹ Ji xwe piraniya kurdan li vê eyaletê dijin. Li gorî lêkolinêن zankoya aboriyê ya alman her sal eyalet serê her zarokê ku besdarê dibistanênya taybet dibe kêmzêde 3800 Euro didin xwediyê dibistanênya taybet. Lê lêçûnêن zarokan di dibistanênya eyaletê de 4900 Euro ye. Belam dewlet bi saya serên dibistanênya taybet her sal 670 milyon Euro berhev dike. Tevihev dewlet her sal zêdeyi 45,7 milyaran ji bo dibistanênya eyaletê dide, lê tenê 2,8 milyar bo dibistanênya taybet xerc dike.²

Gelo arîkariya eyalet dide bes e? Heger na, çima? Heger perê ku eyalet dide wan nebes be, divêt ci bikin? Gelo dibistan dikarin ji bo feyda xwe (ango pere qezenc kirinê) bixwebitin? Heger na, çima?

Arîkariya dewletê tenê ne bes e. Hema bêje hemû dibistanênya taybet ji ber vê hindê neçar dimînin ku ji nûnerên zarokan bi riya "komelêن pişîvaniyê" pere bistînin. Wek li jor hatiye destnîşankirin; dewlet garantiya damezrandina dibistanênya taybet dipejirîne. Lê di makeqanûnê de diyar kiriye, divêt dibistan hem ji belengazan re û hem jî ji dewlemendan re vekirî bin. Dîsa li gorî bîryarêن dadresiyê (Rechtsprechung) xwediyê dibistanan dikarin ji nûnerên zarokan re nêzikê 200 Euro'yî bistînin. Ev hem baş e û hem jî xera be. Dewlet diyar dike, ku ew ne li gorî pivanêن wekheviya arîkariya dibistanênya taybet dike, lê di heman demê de barê dibistanênya taybet girantir dike.³ Eşkere ye ku ev yek bi serê xwe nakokiyek e. Lê xwediyê dibistanênya taybet dikarin komelên pişîvaniyê (Förderverein) damezrînin. Ev komel divêt bi riya fermî ji nûnerên zarokan pera ne stînin. Lê heger bistînin, hingê

eyalet (NRW) wan pera jî hesab dike û ji perê dide wan dibire.¹ Anglo heger xwediyê dibistanê pere ji nûneran bistîne jî, divêt vê yekê di peymana endametiyyê de diyar ne ke. Eşkere ye, divêt dibistanan taybet hem ji derive û hem ji endamên "Förderverein" pera wergire.

Ji bili vê yekê divêt dibistan ne bo feydê bixebitin, lê ji bo xebat û xizmeta giştî.

Kesên dibistanekê damezrînin divêt çawa bin? Gelo eyaleta baştîrin kîjan e? Di bin kîjan mercan de meriv dikare ji sedi % 94 mesrefen dibistanê ji eyaleta NRW wergire? Divêt meriv di destpêkê de "destbereki" (Bürgschaft) bi riya bankayekê "razine"? Pêwîst e meriv ci cüreyêن komelan bo damezrandina dibistaneke taybet damezrine?

Kî li Almanyayê dibistaneke taybet damezrine, divêt ew gelekî bîhînfireh, zîrek û karzan be. Heger ew ne wisa be, hê di destpêkê de sazgehêny eyaletê wê ew biwestînin. Karmendên eyaletê dikarin bi gelek rê û astengan damezrîneran biwestîn in.² Ji bili vê divêt bê gotin ji damezrandina dibistanan re hem pêzanîn û hem jî zanîna qanûnê şert e. Mixabin sazgehêny eyaletê, qanunêن berfireh, agahî û bîryarname, dikarin serên zagonnasên pêzanîn jî bişîmin. Divêt di vir de were gotin ku damezrandina dibistanênya taybet karekî dijwar e: Pêwîst e damezrenêr li hevberê karbideşten serhişk, qanûnên bê wate, eyaleten timakok û çavteng û li hevberê derdora dijber têkoşînê bide. Heger damezrîner erkên xwe di despêkê de nebaş anjî tam bi cîh ne hêne, hingê eyalet tenê bo çar salan destûra damezrandinê dide. Destûreke ha nebaş e. Belam damezrîner tenê dikare ji sedi % 50 lêçûn ji eyaleta NRW werbigire. Anglo divêt destpêk baş û profesyonel were amadekirin.

Divêt meriv ji kîjan sazgehê destûra damezrandina dibistanênya taybet bixwaze? Li eyaleta NRW navçeya hikûmetê (Bezirksregierung) ji vî karî re berpirs e. Heger komeleke pişîvaniyê dibistanekê li bajarê Bielefeld damezrîne navçeya hikûmetê ya bajarê Detmold berpirs e.³ Li vê eyaletê destûdayin heye, lê li eyaleten din ji bili destûdayinê pejirandin (Anerkennung) jî heye.⁴ NRW hem di derbarê lêçûnê de û hem jî di derbarê destûdayinê de eyaleta baştîrin li Almanyayê ye.

Balkêş e heger damezrîner xwediyê avahiya xwendegahê be NRW ji sedi % 94an lêçûnê digire ser xwe. Lê heger avahî tenê demankirî be eyalet ji sedi % 87 digire ser xwe. Ji bili vê yekê heger komelek bixwaze dibistanekê 'veke' divêt beriya dema 01. 08 an bi heft mehan daxwaza

¹ Binêr li <http://www.vdpnrw.info/archiv/archiv-131203.html#1>

² Birêr li <http://www.privatschulverband-nrw.de/archiv/archiv-101002.html>

³ „Hewesdar“ (têkîdar) dikarin agahîyen berfireh ji birêz Rainer Breuke bistînin, Dezernat 48, Ersatzschulgenehmigung/Ersatzschulfinanzierung, Tel. 05231-714837, www.brdt.nrw.de

⁴ Bi rastî qanûna bingehin (makeqanûn) behsa pejirandinê qet na ke. Ev eyalet dixwazin bi vê riyê pêşıya damezrandina dibistanênya taybet bigirin.

¹ Birêr li <http://www.privatschulverband-nrw.de/archiv/archiv-131203.html>

² <http://bildung.twoday.net/stories/4208648/>

³ Dewlet li Hollanda hemû lêçunan digre ser xwe.

xwe bide sazgeha berpirsiyar ya eyaletê. Divêt di vê daxwaznamê de hemû pêwistiyên girîng hebin, ango daxwaznameke hem rast û hem jî bêkamsi be.¹ Heger daxwazname bi kemasî be damezrêner ni kare dibistana xwe di wext de veke.

Divêt xwediyê dibistanê di destpêkê de “pêşinatékê” (Bürgschaft) bi riya bankayekê radestî sazgeha eyaletê bike. Heger damezrêner xwediyê avahiya dibistanê be, hingê ji sedî % 6 bes e, lê heger na, divêt Bürgschaft ji sedî % 13 be. Xwediyê dibistanê kîy e? Xwediyê dibistanê dikare komeleke piştivaniya dibistanê be. Ji xwe ev riya baştirin e. Wekî din divêt diyar be, ku endamên komela piştivaniyê ku bi dilên xwe bûne endam ji komelê re. Ango divêt diyar be ku barê endametiyê² endam bi dilê xwe hildigirin. Divêt di rîbaza komeleya piştivaniyê de yekser diyar be, ku armanca komelê ya sereke damezrandina dibistaneke taybet û “finanskirina” wê ye.

Gelo leçûnên dibistaneke taybet ci qas in? Divêt xwediyê dibistanê ji bo çend salan plana xwe amade bike? Çiqas pere ji xwediyê dibistanê re gerek e?

Dema daxawzname bi dawî bû, divêt xwediyê dibistanê plana finaskirinê ji bo sê salan biafirine. Vê planê bi daxwaznama xwe re bide sazgeha berpirs. Pewîst e tê de agahiyên li ser pol jî hebin (sinif: polê 1ê, 5a yan jî polê 10a). Heger dibistana ku têt damezrandin *Gesamtschule* be. Ev dibistan bi cil şagirdan dest pê bike, hingê dewletê tenê mûçeyên (meşen) du mamostan bigire ser xwe. Lê heger sed şagird bin, dewletê mûçeyên pênc mamostan bigire ser xwe. *Li gorî yasa ya NRW serê 19,55 şagirdan mamostak têt “finanskirin.”* Diyare di salên destpêkê de lêçûna dibistanê wê barekî giran be. Lê ev tişt girêdayê cureyê dibistanê ye. Ji bili vê ci qas şagirdên dibistanê pirr bin ew çend dibistan wê erzan be. Ango dibistana damezrandî xwendegha pêşin (*Grundschule*) be, ev dibistan bi sed şagirdan dest pê bike, hingê mesrefa xwediyê dibistanê wê kêm be. Belam ji *Grundschule* re pir mamoste ne pêwîst in. Lê pêwîst e xwediyê dibistanê serokekî hilbijêre û bigire. Serokê dibistanê ji xwe ni kare wek *mamosteyan* zarakan fêr bike. Wekî din di dibistana peşin de hinek ders nîn in. Nimûne di *elementary school* de dersên fizik, kimya û hwd. nîn in. Heger mamostên timod ne bes bin divêt ji bo erk bicîhanînê komel mamostên din bixebeitînin.

Xwediyê dibistanê dikare di destpêkê de mamosteyê olî, yê zimanê kurdî, yê hunerê û yê sporê bi peymanê yeksalî û li gorî mercen xwe

bikarbîne. Lê hê di daxwaznamê de divêt xwediyê dibistanê diyar bike, ku mamostên wî bes in. Heger xwediyê dibistanê (komel) avahiyekî deman bike, eyalet tenê leçûna li gorî mafe demana herêm (ortsübliche Miete) digre ser xwe. Mezelên polan (Klassenräume) tenê dikarin heta 60 m² çarçık mezin bin, lê salona sporê dikare 15X27 m² çarçık mezin be. Heger meztirbin ne xem e, lê hingê eyalet li gorî meter çarçikê di vir de hatiye diyarkirin, digre ser xwe. Ji bili vê yekê pêwîst e Aula û rexgeh jî hebin. Ji bo nimûne bo 500 m² eyaleta NRW 17.000 Euro dide, bo 1005 m² 32030 Euro digre ser xwe. Mûçeyên pênc mamosteyen *timûdom* bo salekê dike kêmûzêde 200 000 - 230 000 Euro. Heger avahî ya xwediyê dibistanê be, ji vê meşrefe ji sedî % 94an digre ser xwe. Ji bili van peran lêçûna raxistinê, lêçûna tiştên ferbûnê, telefon, Internet û herk (Strom) jî heye. Dibe ku pêwîstî bi mezelekî kompyuter û ciyê xaringehê jî hebe. Heger di nava hev de ji dibistaneke pêşî re bo sê salan 600 000 heta 690 000 lazim e, eyaletê di bin şertên kûvşkirî de ji vî pereyî ji sedî % 94an bigre ser xwe. Lê eyalet vê leçûnê li gorî dibistanê giştî dijimêre (hesab dike). Têt zanîn ku dibistanê taybet ji yên giştî (eyaletê) girantir in. Ango divêt ji vî pereyê diyarkirî ji sedî % 25 ji perê xwediyê dibistanê hebe (nérina nivîskar). Xwediyê dibistanê dikare van perana ji endamên komela piştivaniyê wergire. Heger sed mal piştgiriya komeleke piştivaniyê bike, her yek ji wan mehê 100 Euro bide, hingê her serê salê 120 000 Euro komê ser hev dibe. Lê heger zêdetir be hê baştir e. Bi vê riyyê xwediyê dibistanê wê dikaribe sazgeha berpirs çêtir qanî bike.

Gelo ez çima behsa van agahiyên berfireh dikim?

Di vir de problem destûrdayina dibistanê ye. Belam eyalet gelek pirsgirêkan ji damezrêneran re derdixin. Lê bi ya min bi vê riyyê eyalet wê pirr pirsgirêkan dernexe. Heger na, eyaletê bêje, rast e, îro hûn dixwazin dibistanê damezrînin, li sibê roj jî hûn ê zarakan li holê bê mamoste û bê xwedî bihêlin. Ev erkê we wê sibê dîsa têkeve “stuyê” me. Em vê yekê na xwazin.

Wek we li jor dît min qet behsa zêdekirina mamosteyan û şagirdan jî ne kir. Heger serê salê bîst şagirdên din jî besar bibin û li gorî wan mamoste jî zêde bibin, hingê divêt meriv li gorî wan hesabê xwe bike. *Dîsa hûn dibînin ku min behsa lêçûna nivîsgeha dibistanê û mesrefê kopîkirinê jî ne kir.*

Ev tiştên ez di vir de destnişan dikim tenê pêwistiyên girîng in. Gelek caran dibistanê taybet na yêne damezrandin ji ber ku sazgehê fermî bawer na kin ku komelê piştivaniyê dikarin bi micalên xwe dibistanan “herdemî” finanse bikin. Gelek caran jî bernama perwerdekirinê ya dibistanê ji sazgehê berpirs re bê bawerî ye. Lê divêt bê gotin astenga mezin pirsgirêka finankirinê ye.

Gelo rewşa damezrandin û finanskirina dibistanê taybet li Niedersachsen çawa ye?

¹ Birêñ li § 1 Abs. 1 S. 2 der Verordnung über die Ersatzschulen (ESchVO) vom 05.03.2007 in der z. Z. gültigen Fassung (SGV NRW 223 - BASS 10 - 02 Nr. 1).

² Piştivanî, peredana mehaneyê, xebat û xizmeta dibistanê.

2. Niedersachsen (Saksonya Jérin)¹

Ji bo Saksonya Jérin heman makeqanûn misoger e (biner li jor V). Li Saksonya Jérin şert û mercên di qanûna perwerdekirinê de diyar in ji şertên NRW cudatir in.² Ev eyalet – heger rewşeke awarte nîn be – *di her sê salén pêşîn de arikariya dibistanan na ke* (§ 149 b. 1ê). Tenê heger xwediyyê dibistanê bi dibistaneke damezrandî re bixwebsite, hingê dikare pişti salekê arikariya lêçûnên xwe ji eyaletê wergire (§ 149 II NSchG). Ji bo vê yekê divêt meriv dibistaneke hatibe pejrandin bibîne, bernama wê ya perwerdekirinê wek wê bikarbîne û serokatiya wê qebûl bike. Lê disa jî alîkariya finaskirinê (lêçûnan) tenê dibistana pejrandî dikare bixwaze. Ev arikariya lêçûnî li gorî NRW kêm e. Hêjâyê gotinê ye ku karmendekî berpirsiyar bi riya telefonê ragihande min,³ ku *Saksonya Jérin* her serê şagirdkî 2200 Euro digire ser xwe. Li di qanûnê de diyar e (§ 150 b. 3 NSchG) ku ev yek girêdayê cûreyê dibistanê ye. Heger dibistan Grundschule be, hingê kêmtrî 2200 Euro ye, lê heger dibistan *Gymnasium*, ango lîse be, hingê piçekî zêdetire (2373 Euro). Lê divê bê gotin ku di nava vî pereyî de lêçûnen demanê (Mietkosten), yên pirtûk, raxistina teknolojiyê û meaşen mamosteyan jî nîn e (§ 155, Persönliche Kosten für Lehrkräfte). Qanûna Saksonya Jérin behsa mafê şagirdan (Schülerbetrag, § 150 b. 3), ji bili vê behsa *Zuschuss zu den Sozialversicherungsbeiträgen für das Lehr- und Zusatzpersonal* (§ 150 b. 8), weki din behsa *Personal- und Sachkosten* (§ 151 b. 1) û last, but not least behsa *Zuwendungen zu den Kosten der Neu-, Um- und Erweiterungsbauten sowie der Erstausstattung von Schulen* dike (§ 151 b. 2). Lê ev rîzik li gorî yasayê ne mafekî teqez e, li gor şirovekirina merivê karbidest e (Kann-Regelung).

Ji bili vê yekê nebaşiyên qanûna eyaleta *Saksonya Jérin* pirr in: Yek ji wan ew e, ku ev eyalet hem behsa destûrê dike (§ 145) û hem jî behsa pejrandinê dike (§ 148). Destûr (Genehmigung) di destpêkê de ye, lê

pejrandin (Anerkennung) tenê pişti sê salan mimkun e (§ 148 b. 1). Pişti ku sê sal ji ser damezrandina dibistanê derbas bûn, dibistan têt pejrandin. Hêja hingê eyalet leçûnen dibistanê li ser daxwaza xediyê wê digire ser xwe (§ 149 b. 1, Finanzhilfe als Zuschuss zu den laufenden Betriebskosten)⁴ û wê dipejirîne (§ 148 b. 1).

¹ Bo agahiyên berfireh birén li Merkblatt der Landesschulbehörde Niedersachsen <http://www.landesschulbehörde-niedersachsen.de/themen/schulorganisation/schulen-in-freier-traegerschaft/Merkblatt-ueberarbeitete%20Fassung%20Maerz%202009.pdf>

² <http://www.schure.de/nschq/nschq/nschq.htm>

³ Birêz Klaus Sidortschuk, Niedersächsisches Kultusministerium, Telefon: 0511-120 72 05.

⁴ Sowohl das Niedersächsische Schulgesetz (NSchG) als auch die Verordnung über die Berechnung der Finanzhilfe für Schulen in freier Trägerschaft (FinHVO) enthalten grundlegende Informationen über die Finanzhilfeberechnung. Detaillierte Grundlagen

Wek hat nivîsandin *qanûna vê eyaletê ne baş e*. Heger dibistaneke taybet ya zarokên belengazan sê salên li benda wergitina leçûnan bimîne, wê dergên xwe bigire.¹ Hem *Saksonya Jérin* li gorî *Ren-Vestfaliya Bakur* hindiktir pere dide û hem jî xwediyyê dibistanê sê salan bê pere û bê hêvî dirawestîne. Ev ji bo kurdan bareke giran e. Kî bixwaze ku aghiyên berfireh di vî warî de bixwîne, divêt ew li jêrenota jérin bi riya Înternetê binêre.²

3. Hessen

Rêzikên qanûn yên girîng ji bo damezrandin û finanskirina dibistanê taybet bi paragrafa 166 dest pê dike.³ Li vê derê jî mîna Saksonya Jérin hem destûr û hem pejrandin heye (§ 167 b. 3, § 173 b. 1). Li Hessen'ê jî komel dikarin bibin xwediyyê dibistanê; dikarin dibistanê li gor yasa damezrînin (§ 166 b. 2). Wek di p. 167 b. 4a diyar e *nîrdariya dibistanê* (Schulaufsicht) dikare dema bixwaze dibistanen taybet, ders û mamostên wê kontrol bike. Dibistanen taybet ku li vê eyaletêbihêne damezrandin, divêt ji *dibistanê giştî* bi nav kûvş bin (§ 168). *Li Hessen rewşa finanskirine bo dibistanen taybet ji ya Saksonya Jérin piçekî baştir e, lê disa jî ne wek ya NRW ye*. Ev eyalet jî pişti sê salan leçûnen dibistanen taybet digire ser xwe; ji sedî % 75a pera dide xwediyyê dibistanê. Wekî din ji lêçûnen salên derbasbûyî jî, ji sedî % 50 dide xwediyyê dibistanen taybet. Biner ji bo agahiyên berfireh li *Gesetz über die Finanzierung von Ersatzschulen (Hessen)* di bin jêrenotê de.⁴

finden sich in weiteren Erlassen des Niedersächsischen Kultusministeriums sowie Rundverfügungen des Dezernates 5 der Landesschulbehörde.

¹ Das Bundesverfassungsgericht betonte aber in seinem Urteil vom März 1994, dass die Wartezeit keine faktische Errichtungssperre sein darf und nachträglich ein finanzieller Ausgleich geschaffen werden muss. Dies wurde bisher nur in den Ländern Hessen und Hamburg realisiert, wo 50 Prozent der nicht gewährten Zuschüsse nachträglich über einen Zeitraum verteilt gezahlt werden. <http://www.freie-schulen.de/>

² Birêz li Finanzhilfe nach dem Niedersächsischen Schulgesetz,

<http://www.landesschulbehörde-niedersachsen.de/themen/schulorganisation/schulen-in-freier-traegerschaft/finanzhilfe-fuer-schule-in-freier-traegerschaft>

³ Hessisches Schulgesetz, §§ 166 ff., birêz li <http://www.reinerungnitsch.de/hess-schq.pdf>

⁴ Gesetz über die Finanzierung von Ersatzschulen (Ersatzschulfinanzierungsgesetz - EschFG -), birêz li http://www.jurpc.de/hessenrecht/hessenrecht/72_Schulen/72-41-ESchFG/ESchFG.htm

VII. *Di destpêkê de çi girîng e?*

“Lawo, di hemû tiştên nû de risk jî heye û nûr jî heye.”

Rindê

1. Navê dibistanên kurdî

Ji bo nimûnê meriv navê dibistanê dikare deyne (Ganztags-)Grundschule für Chancengleichheit. Bi ya min kesek li dij dibistaneke bi vî navî dernakeve. Nimûne meriv dikare navên dibistanên kurdî di destpêkê de deyne Dibistana Dewrêşê Evdî, Hevaltî, Diyalog, Dara Mirazan, Hêvî, Piştgirî, Mizgîn, Hevkarî. Ez di vir de dixwazim bêjim, ev nav bila navên “neutral” (bê ali) bin. Heger ne wisa bin, dibe sazgehêن eyaletê pirsgirêkan derxînin.

2. Ciyê rewâ

Eşkere ye ku hejimara kurdan pir e li Almanyayê. Ji ber vê hindê pêwîst e hema bêje li hemû bajarêن Almanyayê dibistanêن taybet hebin. Lê damezrandina dibistana bo kurdan girêdayê derfetêن aboriyê û karzaniyê ye. Derfetêن aboriyê yên li gor yasa li hemû eyaletê Almanyayê ne wek hev in (li jor biner). Lobiyeke kurdan ya payeberz nîn e. Di vê rewşê de Kurd dikarin hem ji yasa yên eyaleta NRW û hem jî ji komelêن piştvaniyê bo damezrandina dibistanên taybet werin damezrandin sôd werbigirin. Yasayên eyaleta NRW bo damezrandina dibistanên taybet derfetên baştıر didin. Ji ber vê yekê komelên kurd dikarin – heger micalêن wan hebin – di destpêkê de dibistanên taybet li gelek bajarêن NRW damezrînin.

3. “Sermamostê îdeal”

Divêt komelêن piştvaniyê serokekî¹ hilbijérin ku di derbarê gelek mijaran de pîspor û agahdar be. Serokeke wisa divêt mamosteyen dibistana xwe bi serê xwe hilbijêre. Serokên baş “sermamostê pêzanî” ye.² Ji bo nimûne ev serok dikare “sermamosteyekî jikarketî” be jî. Pêwîst e ev serok “rêşan” be, ji mamosteyan û şagirdan re ruhnas, guhdarvan, mamoste û heval be, ji dibistanê û şagirdên wê re “berdevkê” dilşewat be, lê berî her tiştî hosteyekî bêtirs û “tenok” be. Diyar e serokeke wisa wê mamostên xwe li gor pîvanêن *teamplayer* hilbijêre.

¹ Binêr li Christian Pfüller, *Die gute Schule. Wo unsere Kinder gern lernen*, 2009.

² Der Leiter der Schule muss die Eignung für die Verwaltung und Leitung der Eratzschule besitzen. Es dürfen keine Tatsachen vorliegen, aus denen sich ergibt, dass er keine Gewähr dafür bietet, nicht gegen die verfassungsmäßige Ordnung zu verstößen (§ 145 Abs. 1 Nr. 2 NSchG).

Divêt ew bi xwe ji mamostêن xwe razî be. Sed heyf ne karekî hêsanîye meriv mamostêن baş li Almanya bo dibistanêن taybet peyda bike. Belam piraniya wan dixwazin di dibistanêن giştî de bixebeitin; bibin “karmend.” Berî her tiştî divêt ev mamoste amade bin ku bernama dibistanêن kurdî li gorî berjewendiyê nûneran bikarbinin. Wekî din divêt bo damezrandina dibistana kurdî komelêن piştvaniyê werin damezrandin. Hemû endamê komela piştvaniyê divêt yekser arîkariya dibistanê bikin. Di heman demê de divêt ev endam dibistana kurdî kontol bikin. Şert e mamosteyen dibistana kurdî rêsê ji şagirdêن xwe re bigirin.

Ji bili vê divêt were zanîn dibistaneke baş xwedî “dijber e.” Ji bo nimûnê; burokrazi gelek caran astengan jê re derdixe. Wekî din gelek caran dê û bavêن zarokan jî dijberiyê heyber dibistanan dîkin.

4. Gotin û pirsên dawiyê

Divêt bêt gotin min di vê raporê de behsa gelek micalen din yên qanun nekir. Ji bo nimûne dêrên xacparêz anjî cihû dikarin “dibistaneke olî” bi destê eyaletan damezrinin (§ 129 NSchG). Heger bi vê riyê dibistan bêt damezrandin hingê hemû lêçun eyalet werdigre. Komela Kaniya Spî di bersiva xwe de yekser behsa girîngbûna alîkariya dewletê kiriye. Lê ola êzdî ta îro ne hatiye pejrandin anjî mafê “statusê giştî ya qanûn” wernegirtiye.¹ Heman tişt ji ola islamê re ji gengaz e. Lê divê bêt gotin, ku ola islamê oleke li Almanyayê pir bi îmtiyaz e.

Ji bili vê endamekî komela Hessen di bersiva xwe de behsa Ergänzungsschule jî dike. Damezrandina Ergänzungsschule li gorî qanûna perwerdekirinê karekî pir hesaniye, lê ev derfeteke qelse. Eşkerye ku ezdayî bi ve riyê nikarin nasnama xwe yekser li derveyî welat biparêzin; serkefin.

Ango riya baştîrin riya proja dibistanen taybet e.

Tekildarêن vê proja taybet dikarin ji bo destxistina agahdariyê berfireh besdarî semînerekê li eyaleta NRW bibin (birêن li V. 1). Ev semîner ji aliyê Verband deutscher Privatschulen Nordrhein Westfalen e.V. ve têne birêvebirin. Di van semîneran de riya damazrandin û “finanskirina” dibistanên taybet têt şirovekirin. Bo şasî di destpêkê de pir çê ne bin, besdarbûna semînarjan jî girîng e.

Heger kurd têra vê projê pera ji kesên zane, komelan, weqfan, ronakbîran, tevgera azdadîyê, mîzgeftan û alimên xwe kom bikin, dikarin dibistanên xwe sazbikin.

¹ Der Staat verleiht den Status einer Körperschaft des öffentlichen Rechts auch Organisationen, die nicht staatliche Aufgaben erledigen, sondern Teil der Gesellschaft sind, http://de.wikipedia.org/wiki/K%C3%B6rperschaft_des_%C3%BCffentlichen_Rechts

Ji bo nimûne êzdî dikarin navenda dibistanê kurdî li Bielefeld anjî Emmerich (NRW) vekin. Wek têt zanîn êzdî li Bielefeld li Emmerich pir in. Kurden Êzdî dikarin bi serê xwe dibistaneke mazin li Bielefeld'ê vekin. Zarokên wan dikarin ji hemû eyaletan besdarî vê dibistanê bibin. Ew dikarin li wir li riyekî “hevkarîyê” bi derê re biggerin û ji pêzanîn wê sôd werbigirin. Heke avahiyê dibistanê milkê wan be, hingê dikarin ji sedî % 94 leçunê dibistanê bistin in. Heger perê wan têrî projake mazin ne ke, divêt di destpêkê de tenê dibistanekê vekin. *Ji bo dibistaneke wisa 1000 000 Euro bes e.* Li divêt ev dibistan dîsa li NRW were damezrandin. Hemû komelên Kurd dikarin bi çavê projake pilot wê bisopînin.

Heger li Saksonya Jêrin vekin, hingê dîsa dikarin bi sazgehê dêrê re têkiliyê deynin. Divêt yekser bi *Konföderation ya Protestanan* re biaxin (ne bi serokên dibistanan re).¹ Têt zanîn ku têkiliyên wan bi metranê dêrê re hene. Dîsa têkiliyên wan bi *Diakonie* re jî hene. Heger ew sê salan li pey hev bi dêrê re “hevkarîyê” bidominin, wê hinî gelek tiştên îdarêkirina dibistanan jî bibin. Têkiliyên weha hertim li gorî “berjewendiyê dûali” dimeşin. Divêt bo vê yekê jî derê re diyar be, ci kara wê di vê hevkariyê de heye. Beriya têkildanînê divêt bernama wan hatibe amade kirin; hertiş ji herdu aliyan re zelal be. Wek nimûne divêt ezdayî zanibin ew ci ji dêrê dixwazin. Wekî din feyda derê di vê “hevkarîya bi ezdayîyan” re ci ye.

Rast e, ne şert e kurd bi alîkariya dêrê yan jî “Waldorfschule” dibistanê xwe damezrînin. Lê heger bi arîkariya dêrê dest bi vê projeyê bikin, dibe ew bikarîbin çêtir nûnerên zarakan qanî bikin.

Bi kurtî divêt komîsyonekê zûka hilbijîerin û ew dest bavêje projeyê. Lê gelo ci pirsgirêk wê di destpêkê de derê? Qanîkirina nûnerên zarakan (1), daxwaznamake baş û rast (2), pirsgirêkên bi damezrandina komelên piştiyanîa dibistanan ve (3), peydabûna “sermamosteyekî iîdeal” (4), peydabûna mamosteyen din (5), dîtin/kirîna ciyekî guzide (6), pirsgirêkên aboriyê (7), diyarkirina cûreyekî dibistanê (8), (bernameyeke perwerdekirinê?) û hwd.

Beriya daxwaznamâ damezirandinê were pêşkêskirin, divêt ev tişt tevbihêni diyarkirin/çareserkirin. Heger vêga dest bi meşandina vê projê bikin, dibe ta sê salên din dibistana kurdî bi damezrinin. Anglo hêjayê gotinê ye ku çendin zûka ew li vê projeyê bipirsin, ew çend zûtir wê serkevin. Lê dibe pişti bîst salên din feydê ji vê projê bibînin.

Raste, ev proje dereng ketiye. Heger ev proje dereng ketibe (Mala Emmerich, Kamiya Spî), gelo¹ çend kurdên êzdî li Almanyayê wê pişti 20 salên dinê li nasnama xwe xwedî derkevin? Heger ev proje “bêtirî nan û av ji wan re gerek be,” (Mala Emmerich) gelo ew li benda ci ne? Heger ev proje dikaribe “pirekê têxe nava wan û welatê wan” (PEC Celle), gelo çima ta vê gavê sekinîne? Heger ev proje dikaribe riya nava hevkariya kurdên êzdî li Almanyayê veke (Mala Emmerich), gelo ew li benda ci ne? Heger ezdî na xwazin teqez vejerin welatê xwe, gelo ci ta vêga wan bê bîryar dihêle? Heger ev proje “ji sedî sed riya serkeftine be” (Mala Celle), ma ezdî wê kengî li projê xwedî derê? Heger rewşa zarokên kurdan xeter be, gelo çima ta iro ev proje ne hatiye danasin? Heger raste ku ji bilî kurdan, hemû komên koçberan dibistanê xwe li Almanyayê damezrandine² gelo îcar ne dora wan ne? Heger di vê rewşê de êzdî ni karibin riya hevkariya nav komelên xwe bibin in û ava bikin, gelo wê bi ci riyê serkevin? Heger “...perwerderkirina zarakan.. girîng” (Oldenburg) be, ma çima ev komel vê projê paşve dixin? Gelo ji van komelên bersiv dane kîjan wê di demeke kin de konferensekê bo riya parastina êzdiyên li Almanyayê li darxe û vê projê danesine? Bo nimûne Mala Cellê dibêje (birên li bin III. 4), ku wê bo nasandina vê projê di demke kin de li Mala Êzdiyan komcivinekê li darxîne. Nexe ev proje wê bo komelên jorîn bibe azmûnek (test).

Bo vê hindê heger kurdên ezdî sibê dibistanê xwe damezirînin, ez şaş na mînin. Lê bi ya min ya rast ewe ku “tu kes li ser hêkê nekirî mijul nebe.” Tiştên girîng ewe ku kurd di nava xwe de xwe yek dil bikin. Ta xwe yekdil nekin û hertişten xwe amade nekin, ne gereke civaka serdest şıyar bikin.

VIII. Hinek raman li ser proja dibistanê taybet (kurdi)³

“Heke yek rastiyê bizane û li gor wê neke, hingê cesaretê wî kêm e.” Konfîciûs

Ti civak yan jî kêmnetew nikare bê perwerdekirina bi zimanê dayikê, fêrkirina dersên dirokî, perwerdekirina ol û toreyên xwe û hevgirtinêke berz hebûna xwe li dervey welat bidomin e; nasnama xwe biparêz e. Anglo damezrandina dibistanê kurdî ji kurdên êzdî re mesela hebûn û nebûnê ye.

Kurdên êzdî li Almanyayê dema windakirina xwe dijîn. Zarokên wan

¹ Ew dikarin li ser vê mijarê agahiyêن berfirêj ji “Evangelische Konföderation Niedersachsen” bistinîn, <http://www.evangelische-konfoederatiion.de/>

¹ Dîsa divêt bêt gotin ku van komelên bersiv dane ta iroj hinek xizmeten girîng pêşkêsi êzdiyan kirine.

² <http://www.welt.de/politik/article2575516/Die-neue-tuerkische-Elite-in-Deutschland.html>

³ Ez di 9. 5. 2010 de besdarî civîneke endamen serkomeleke ezdayî bûm. Min ev tez yeko yeko bi devkî peşkêsi civinê kirin.

tenê ji sedî % 5 dibin xwediyyê diploma liseyê, yên alman ji sedî bêtirê % 30 dibin xwediyyê heman diplomayê.¹ Bi damezrandina dibistann taybet kurd² wê bibin “faktoreke girîng.” Ew dikarin di destpêkê de dibistaneke taybet ava bikin, hima hingê eyaletên alman wê bi wan re têkiliyên jidil deynin; hinek mafêن piçuk pêşkêsi wan jî bikin.³

Pisporêن êzdî, zanyarêن êzdînas û berpirsiyarêن eyaletan dizanin, ku êzdîyêni li Almanyayê ji salen 1990 an ve dihelin. Ta îro di nava kurdan û eyaletên alman de têkiliyên “jidil” tunin.⁴

Paşeroja zarokên êzdî di xeterê de ye. Pirraniya wan di nava malên xwe de bi kurdî na axivin. Ji ber sedemên têt zanîn nikarin nîrxên xweyî olî û civakî bi parêzin. Belam divêt were gotin heger di hinek dersan de perwerdekirin bi du zimanan be yan jî bi kêmanî beşek bi zimanê dayikê be, li gorî nerînê vekoleran zarok wê serkeftîtir bin.

Damezrandina dibistanêن kurdî wê baweriya kurdêن êzdî hem bi wan û hem bi komelên wan re xurttir bike. Dibistanêن kurdî, heger di destpêkê de yek bejî, wê di paşerojê de ji kurdan re bibe ciyê serbilindiyê; dilên wan bi wan û sazgehêن wan ges bike. Êzdî heke bi vê riyê serkefin, wê ji hertişti re vekirî bin û têkiliyên berz bi komel û serkomelên xwe re deynin. Anglo ev projê dikare bibe sedemê baweriyeke berz. Rûpelekî nû û bi hêvî veke. Lî ji eyaleten alman re bê bawerî ye ku kurdêن êzdî wê dikarîbin “rewşa helandina” xwe berovacî bikin; bibin “lêpîrsê çarenûsa xwe.”

Lê eger kurden êzdî li dijî asimilasyona civaka serdest jidil berxwe bidin, serokên komelên wan dev ji xebata desthilatdariyê, pevçun û xwe xapandinê berdin, hingê ewê dikarîbin vê projê bi lezginî mesq bikin, hem rûyên xwe û hem yên civaka xwe ges bikin û êzdiyêni li Almanyayê ji taluka hebûn û nebûnê rizgar bikin.

¹ Zarokên tîrkan hema bêje se caran (ji sedî % 14) ji zarokên êzdiyan serkeftitirin, lê wan penc dibistanêن taybet damezrandine, biren li http://www.youtube.com/watch?v=UO_1e_OmWiQ. Heke em dibistanêن Europaschulen ji bijmirin hingê hejmara wan hê jî zedetire. Biren li <http://www.aziz-nesin-q.cidsnet.de/>

² Êzdî yên bakurê Kurdistan ji ber sedemên olî, ji welat hatin bi dûrxistin.

³ Bo nimûne “dersen ola islamî” berî sala 1999 an li Almanyayê tune bûn. Wezareta perwerdekirinê ya NRW di 1999 de mafê dersen olî cara yekem pêşkêsi nûnerên islami kirin. Çar sal dûre eyaleta Saksonya Jérin (8/2003) ji heman maf pêşkêsi wan kirin. İro bi sedan mamosten islâmî ji aliyên eyaletan ve di dibistanêن giştî de hatine bi wezîfekirin. Pirraniya wan mamosten zimane dayikê ne û bi almanî baş nizanin (rewşa Saksonya Jérin).

⁴ Bo nimûne xwendevanêن seminerên min gotin, “em bawerin, êzdî wek *lîliputaner* ne.”

REZO-ARO

ji me xeyidî û çû...



Dr. Bavê Nazê

Dostê min yê ku heta-heta ez deyndarê wî me, ji me xeyidî û çû..Ew çû pişti eşeka dirêj û bê dawî...

Ji xwe, di vê dawiyê de, Rezo êşek li ser êşa ku her dem pê re heval bû, zêde bû.

Êşa pêşî êşa milet û welatê wî bû û êşa duyem jî, êşa nexweşiya wî ya giran bû. Her dem jî, kengî ku ez li gel diaxivim, min jê dipirsî : Kengî emê zora vê êşê bibin? Ewî digot: “Xwedê bê erê nêzîk...” Lê êşê ew bir û çûna wî bû êşa dilê hevjin, zarok û binemala wî û ya rast ya hemû kesen ku wî dinasin... Erê ew çawa ji ber êşa miletê xwe diêşiya, niha jî miletê wî.

Her çendê, ez li ser valahiya ku Rezo ji me re hiş, biaxivim, ezê nikaribim, heqê wê bidim...

Bi vê yekê, diyar dibe ku Rezo mirovekî taybet bû û ciyekî wî yê taybet, di nav miletê wî de hebû.

Aya ew taybetî ji ci dihat?

Berî her tiştî, ji xebata wî ya bê etlahî, ji bo doza milet û welatê wî, dihat. Ji xwe Tolstoy ji mîj ve nivîsibû: “Dunya, li ser milê kesê ku bêdeng dixebite, rawestyaye...- Ew bi xwe, li xwe vedigerîne- na, her wiha jî li ser milê wî digere...”

... Erê, Aro, ji me xeyidî û çû..Ew çû û valahî di meydana xebat û jiyana xwe de hişt. Lê di dilê me de, tu carfî ciyê wî vala namîne. Ew jî dihêle, ew her dem bi me re be û bi giyanê xwe wê her û her zindî be. Bi taybetî, ew min vedigerîne wê qunaxa naskirina me ji hev re û bi vê jî, ezê hîn bêtir wî bi we bidim naskirin...

...Sal, sala 1975, li Moskow, carekê Seîd ji min û Mihemed re got: "Hevalekî me hatiye, ez dixwazim, wî bi we bidim naskirin..." Ew heval Rezo bû. Bi xwe, dema min ew dît hîç ew nekete çavên min. Ew jî, ji ber cil û bergên wî û porê wî. Di wê qunaxê de, ez weku hemû koministan, min bi çavên xirab li kesê porê xwe dirêj dikir û şarlisto li xwe dikir, dinêrî. Rezo jî di hevdîtina me ya pêşî de, şarlistoyeke pir fireh li xwe kiribû û pêlavake penîbilind li pê kiribû, porê wî girtibû heta ser stûyê wî. Min xwe negirt û jê re got: "Eve çiye, ma tu şerm nakî, çîma te wiha bi serê xwe kiriye?" Rezo, bêdeng û çavên matmayî li min nihêrî. Li vir Seîd xwe avet nav gotinê û got: "Diyare, modêl hîn negehiştiye cem we koministan. Ez dibêjim, kengî ew modêl nemîne, hunê hingê bidin pey." Ü ya wî derket.

Lê pişti çend rojekê, dema min Seîd dît, min jê pirsî: "Ev ci kes bû, te ji me re anî, ma kesekî din nebû ku hun ji xwe re bikin heval?!"

Wê çaxê, weku her dem, bi bêhnfirehî Seîd li min vegerand: "Rezo hevalekî pir başe, heger tu nezik wî nas bikî, tu nêrîna xwe biguherî..."

Way xwedo ci qasî Seîd di gotina xwe de rast bû!

Rezo-Aro her dem ji nêrîna peşîn nedihate pesendkirin, lê bi demê re, hedî-hêdî di çavên kesen ku ew ji wan nenas bû, mezin dibû û weku tête xwestin dihate dîtin.

Dure Mihemed Ebdo, li ser nêrîna me ya peşîn bi henekî her dem dubare dikir: "Bi wê pêlava penîbilind û şarlistoyê te meşa te dibû ya kosmonaftê ku li ser heyyê dimeşîya..." Mihemed bi gotina xwe re, lasayîkirina wî dikir... Her dem jî, Rezo bêdeng digirnijî.

Roj bi roj, baştir me hev nas kir û nêrînen me di pirsa netewî de pir nêzî hev dibûn, wê jî hişt dostaniya me bi hêztir bibe.

Sala 1976, pertûka Salnikov li ser Lîtkîn hate weşandin. Lîtkîn jî qehremanek ji şoreşa Oktobirê bû û bi netawa xwe kurd bû. Ji bo me jî, bibû cihê şanaziyê. Di vê navê re, carekê Rezo hate cem min malê û min ew pertûk nîşanî wî da. Ewî got: "Ez tênakîhêm, hun edeb dixwînin, lê tiştekê ji bo edeb nakin. Hema vê pertûkê wergerîne..." û min jî dest bi wergerê kir. Jixwe, ev pertûk bû egerê wê yekê ku "Komala Kawa ji bo çanda kurdi" bête damezrandin. Û ji bo min jî ew bû gava pêşîn, ji bo nivîskariya min. Û kengî min li gel Ebdi Hecî "Çiya û Çek" ya Cewms Olderêc wergerand, hema pêre-pêre min dest bi nivîsîna romana xwe ya peşîn "Çiyayê bi xwînê avdayî", kir. Min, wê çaxê bi ererbî dinivîsî û kengî min roman bire serî, kê pêşniyar kir nema tê bîra min, da ku em li ser binivîsin werger ji zimanê kurdi. Ji wan çar damezrênerên "Komala

Kawa..." (Rezo, Seîd, Mihemed Ebdo û Ez), Rezo baştirin kes bû ku kurdî dizanî. Me li ser pertûkê nivîsî wergera ji kurdi: Rezo. Pertûk jî, di bin navê Bavê Nazê hate weşandin. Li vir, me li hev kir ku di paşerojê de, pêdiviye Rezo bi wergera ji zimanê ererbî ji bo zimanê kurdi rabe.

Weku em dibînin Rezo rê li ber "Komala Kawa" vekir ku me bi zimanê ererbî pertûkê xwe diweşandin, êdî xwest ku riyeke din li ber me veke, ewî got; çawa be gerek hun xwe fêrî zimanê kurdi bikin, jixwe, li gel ku Rezo peymangeha niftê li Moskow dixwend, her wî sala 1979-ê mamostayetiya zimanê kurdi dikir. Heftê carekê û du caran şagirdên kurd yên ku dixwestin xwe fêrî zimanê kurdi bikin, Rezo wan fêr dikir. Ez jî yek ji wan şagirdan bûm. Xwes tê bîra min, ew pertûkê ku ji bo fêrkirina zimanê kurdi pir sade bûn, hema bêje ji bo şagirdên seretayî bûn. Armanca van pertûkan, fêrkirina xwendina zimanê kurdi bû. Ci wêneyê giyaneweran hebûn, navê wan jî li bin bûn. Min bêjeya "Çêlek", "çilek" xwend. Mamosta Rezo ne bêxeyd got: "Mala teyo, heger tu nizînî bixwînî, ma tu wêneyê çêlekê ji nabînî?!"

Em hemû kenian.

Jixwe, ew kesê ku romana min ya "Çiyayê bi xwînê avdayî" bixwîne, dê bibîne ku min diyarî Rezo kiriye û tê de nivîsiye: "Heger ne ew ba, ez ne dibûm nivîskar." Gelek caran li ser vê yekê pirs dihatin kirin, ew çawa tu bê Rezo nedibûyi nivîskar?

Li vir, fere bête gotin, heger ne Rezo bûya wê "Komala Kawa" çenebûya. Jixwe, bi avakirina "Komala Kawa", min dest bi werger û nivîsê kir. Lê ji bilî vê yekê, rola Rezo ji bo nivîsîna romana min ya pêşîn jî hebû. Ewî heftê carekê, riya xwe bi min dixist, ji bo ku ew besen ji romanê dihate nivîsîn, bixwîne. Hegerbihata min tiştek nû ji romanê nenivîsîba, xwe dixeyidand. Û ci cara ku beşek ji romana bixwenda pesnê min dida û digot: "bidomîne." Ev jî bû egerê ku palder li cem min ji bo nivîsê çê bibe.

Mamosta Rezo sala 1980-ê xwendina xwe bire serî û vegeeria welat. Xebata wî pişti vegera wî pir aliye, pêwistiya xwe bi vekolînên taybet heye. Ji ber vê çendê, ezê vî warî bihêlim ji bo paşerojê.

... Û gotina dawî ku min dixwast ez ji momastê xwe re bibêjim, eveye: "Rezo mala teyo, tu û mirin?"

CEGERXWÎN

bilbil û mertalê jar û bindestan



Berken Bereh

*"ji ku ye?", "li ku ye?", diçî ku?" nebî
Cihan tev seranser welatê me bî Cegerxwîn*

*Beriya ku xwe
noqî behra
wêjeveniya nemir
Cegerxwîn
bikim,dixwazim
çend tiştan di
derbarê netewe
wêjeya wê de
vebêjim.gregory
jusdanîs di pirtûka
xwe ya bi navê
"modernîzma derengmayî çanda estetîk"de;*



*Ji neteweyek,bo bikare bibe netew pêdivî bi
du tiştan heye;avakirin û damezrandina tixûb
û wêjeya netewi...netew ne tenê sînorêñ xwe
her wiha divê sînorêñ hiş û bîra xwe jî fireh
bike".*

*Ruhê zimanekî di heman demê de ruhê
wêjeya neteweyekê ye" Lew,ziman nişaneyâ
herî resen û xweser û tekane stûna neteweyê
ye.Ji ber vê ye"wêje,rojnivîskû çiroka
neteweyê ya rabirdû,îro û dahatûya wê ye"û
îşareta amadebûna hemdemî û modernîzmê ye.*

*Entelektuelê Afrikî Ngugî"li efrika nivîskar û siyasetvan di heman
demê de eynî kes e û tevli tékoşinê dibin;ji bo wan pêniş û çek heman
alav in lew,di xizmeta azadiya welatê xwe de ne.Ji ber hindê li efrika du*

*estetîkên dijber hene;yek estetîka zilm û zordariyê ya din estetîka
tékoşîna netewî"ye.*

*Dîsa Addison Gaylee,xweşikbûna helbest,newa an romanekê ne
girînge,ya girîng ew e ka,ew melodî,helbest,lîstik an romanê jiyana
reşikekî çawa xweşiktir kiriye "ye.*

Cegerxwîn yekemîn kese ku xwe li helbesta kurdî girtiye û xwestiye
kiraseke nû li wê bike. Ger em dakevin qesra helbesta Cegerxwîn em dê
bibînin ku helbesta kurdî çawa aso û bergeha xwe fireh kiriye û xwe
gihandiye çerxa nûjeniyê. Seydayê Nemir li Dêrikê (Şebetxanê) dest bi
nivîsandina helbestê dike. Cara yekem li hember neqenciya melayek ku
xwarina wan çêkiribû nehiştibû bi wan re lê bi feqeh û zarokan re bixwin
nivîsandiye. Vê serpêhatiya xwe di kitêba xwe ya "Jînerîgariya min" de
wiha dibêje;"Min di wê çaxê de ristek nivîsi da destê Mela Îskender
Efendî û Seydayê mezîn got:- Kuro kê ev rista ha çêkiriye? di bersivê de
min got;- Ezbenî min çêkiriye. (Seydayê mezîn got;) - Ji bil ko di biwara
we de Mela Yûnis neqencî kiriye, lê ev rista te gelek xweş hatiye. Pê de
here tê bibî ristevanekî mezîn. Ew rist;

**"Ehmedê Qêsim şehê bêkevçi ye,
Li bin siya darê tenê rûniştiye
Mela Eli zû gazi Haris,Hemo kir
Gotî; em çûn hûn werin teşbîhê gur"(r;91)**

Belê ji van ristan jî xuya dike ku Seydayê Mezin li hember neheqî û
sitemkariyê helbest nivîsandiye û heta dawiya temenê xwe jî ev
taybetmendî û berxwedêriya xwe domandiye. Di dîwanên wî de besa
mezîn ev cure helbest cî digrin û navê wî bûye şûr û gurz di destê xizan û
jaran de hember desthilatdar û zordar û sitemkaran.

Seyda ji bo xwendina xwe hem li navçe û bajaran digeriya û hem jî
ristên xwe dinivîsandin. Exleb bi awayê Ehmedê Xanî ku teşeya di Mem
û Zînê de bikar anîye dinivîsand. Lê dema li Amûdê Mîr Celdaet
Bedirxan lê bû mîvan û bo helbest nivîsandinê qala rê û rîbazên nûjen
kir, dev ji teşe, awaz û honandina berê kir. Seyda di vê der heqê de wiha
dibêje; "Zû gazi min kirin û gotin; Mîrê Botan dixwaze te bibîne.
Dilxwêş çûme cem Mîr û ji min hin pirsên torevanî, ristevanî kirin û
dawî got;

- Dixazim ez hin ristên te bibihîzim.Min hin ji ristên xwe jê re gotin û wî
ji min re got; - Ristên te yên yekane pir xweş hatine. Dixwazim tim li vê
gorê çêkî û ji min re bişenî Şamê ku di Hawarê de belav bikim. Bi ya min
be, tê dev ji awayê Xanî, Mem û Zînê berdî. Ev îşê çirokan e seyda!Min

gotina wî xiste serê xwe.” Cegerxwîn êdî helbest û ristên xwe ji Mîr Celadet Bedirxan re dişîne û bi saya Mîr Celadet Bedirxan û Kamûran Bedirxan helbest û ristên wî di kovarêن ”Hawar”, ”Roja Nû”, ”Stêr” û ”Ronahiyê” de têن weşandin. Bi van kovaran nav û dengê Cegerxwîn li her deverê ku kurd lê dijîn belav dibe. Cegerxwîn êdî ne mela ye, ristevanekî hosta û helbestvanek hêja ye. Melatiyê tenê bo aborî û jiyana xwe ya rojane berdewam dike. Kar û xebata wî ya herî giran li ser helbestê ye. Tim dixwîne û dinivîse. Bi her xwendin û gera xwe ya li welêt û serpêhatî û qewimînan turikê xwe dadigire û wan bi ristan li ser kaxizan reşdiike. Berhemdarî û pir nivîsandina wî, bi ya min bi jiyana wî û rewşa welêt ve girêdayî ye. Ew bi xwe mirovek diltenik, nazik û hestiyar û pêjinkar bû ye. Ma êdî kesekî xwedî van taybetmendiyan be dikare li wenatek ku serî heta binî di nav bextreşî, talan, êş û azar û sitemkariyê de dinale, bi rehetî binive û neqîre. Wê demê welat li ber çavên wî tê parce kirin, talan kirin, wêran kirin. Xizanî, jarî û bindestî heta heft qatên ezmên hilkişya ye. Di navbera êl û eşîran de tim kuştin, talan kirin û malwêranî ye. Şêx, axa û beg li ser gel zordariyê dinik. Her raperîn û berxwedanek kurdan ji ber van sedeman têk diçe. Her ku diçe têlén zingarî li ser gerdana welêt têن şidandin. Helbet di van şert û mercan de rist û berhemên Cegerxwîn jî li ser van babetan û mijaran ava dibe. Ew têdigihîje ku heta şêx û axa û beg serdestê gel bin û pêşengiya wan bikin dê tu derd û birînê kurdan çareser nebe. Ji bo vê yekê jî her tim di civat, civîn û şêvbêrkan de dijberî û giliya wan dike. Dixwaze ku kurd rojekê nêzîk de hişyar bibin û xwe ji bin zilm û zordariya wan rizgar bikin.

**“Kurdmanc hemî axa û beg û mîr û mela ne,
Hikmet ev e, her dem ko belengaz û geda ne.**

**Axa û began destê sitem daniye ser wan;
Talanker û diz û keleş û bê ser û pa ne.**

**Şêxan û melan xişt û def û ayet û enwar
Wek gurzê giran dane milan,şêrê xuda ne.**

**Zana ne li cem her yekî sed xap û du sed fen,
Kurdmanc reben hov û dewar,dil û bela ne.**

**Ma ez ne ji ber derdê ewan bûme Cegerxwîn Ev derdê li nav
Kurdê wekî jan e di can e. (Dîwana Kîne Em r;38)**

Cegerxwîn mirovek ronakbîr û hişmend bû û di bîr, bawerî û ramanêن xwe de nûjen bû. Qasî helbestê ji siyasetê û felesefê jî fam dikir. Wî dema behsa kurdan dikir dixwest bibêje ku kurd miletik in û ewî tu car

parçebûna welatê xwe ne eciband û her çend kurd ne xwedî dewlet û komarê bin jî wî tim behsa Kurdistanê dikir.

**“Bax û bostanim ka?
Ax,gulistanim ka?
Dijmin tev girtin ax!
Ax,Kurdistanim ka?
“Kîne em?
Kurdê Kurdistan”(Dîwana sêyemîn)
“Xakî Kurdistan bi qurban pir ciwan û paqîjî”(dîwana uyemîn)**

Cegerxwîn mirovek gelperwer û mirovperwer, hestiyar bû. Aşiq û dilsozê gelê xwe bû. Ji qewmiyeta xwe gelek hez dikir. Kurdpererek bêhempa bû. Heta goşt û neynûk û bi hemû şaneyêن xwe li neteweya xwe xwedî derdiket. Ewî baş dizanî ku riya inernasyolî jî bi xwedîderketina neteweya xwe ve girêdayî ye. Ango kesê ku hez ji neteweya xwe neke û pê ne bawer be nikare bibe internasyolîst jî.

**“Marksîmê dixwazim,
Li her derî dibazim,
Kûbîme-serfirazim
Berê her tişti Kurdim.”**

Hosta û Mîrê helbesta kurdî Cegerxwîn di biçûkatî û heta bêhna xwe ya dawî hiş, mêjî û wî dilê xwe yê pak tim ji bo xizan, belengaz, hejar û karkeran re bikar anî. Lew re wî hê di zaroktiya xwe de gelek zilm û zor û neçeyîya, axa, beg û kevneperek û şêx û melayan bi xwe dîtîbû û gelek ji destê wan kişandibû. Ji bo vê yekê jî her tim dixwest gel li van xwînmijan bihese û himber wana hişyar be û berxwe bide. Ewî dizanibû ku heta ev zaliman hebin welat zor tê rizgar kirin. Ji ber ku wan tim hevalbendiya mêtîngîkaran dikir û dijminatiya gelê xwe ji xwe re ji bo pereyan bidest bixin bikar dianîn.

**“Ev rengê biraflî me nevê ger timî wa bin,
Hevsar me girêdayî bi kurtanê kera bin.
Ew begler û axa û emê jar û geda bin
Ew rençberê dijmin û emê rençberê wa bin.
Ey karker û cotkar bese,dem hatiye rabin!”(Dîwana Duwemîn-Sewra Azadî-1954)**

Hostayê peyva kurdî Cegerxwîn di hiş, raman û bîr û baweriya xwe de mîna serkanyêن li zozanêن welatê xwe zelal û ronî bû. Ewî her katê jiyana xwe de bo hişyariya gel û jiholêrakirina kevneperekîyê têkoşa. Hem bi rabûn û rûniştina xwe ya rojane û hem jî bi peyamên xwe yên di rist û çarîn û helbestan de bi rikeberî da xuyakirin. Ne hemberê olê bû.

Lê himber wan kesên ku olperestî bo berjewendiyêñ xwe bikar dianî.
Kevneperestî, olperestî û paşverûtiya şêx û melayêñ sextekar anî ziman;

“Me be olperest ey hevalê delal
Bi her kesre rast û diristbe heval.
Bizan ko ne bes ol etizbû û xişt
Di bin banê şêxan de milet bîrişt

Heçî tiştê pak edi her ol û dîn
Bihûne,birêse,ji bo me werin.”(Dîwana Zend-Avesta r;123)

“Beg û şêx û axa,diz û zorker in
Di çavêñ me de hê wekî rêber in”(H.D.r;163

Ne rojî ew e ko xwe birçî dikî
Belam zanibe ka ji bo çi dikî?(H.Diwan-165

Seyda Cigerxwîn di heman demê de mîna bijîşkekî zana û jêhatî û
xwedî zanînê bû. Ewî di beytên xwe de tiştine ku ji bo tenduristiya mirov
ne baş in birêz dike û dibêje xwe ji wan dûr bixin;

“Tu parêzê bigre ji tiştêni bi rûn
Eger ko bixwî jî,bixwe nerm û ron

Geya û ber û zebze bêtir bixwe
Çiqa ko bi xurfî bikarî bixwe

Çi tiştêni ko tê de witamîn heye
Bixwe ew ji bo te gelek fêde ye

Ne dagre ne vala bîhêle tu zik
Ji şor û tewaşê xwe bigre bi rik

Mexwe herçî tiştê bi don û giran
Tu qenc hûr bike bide ber diran”(H.Dîwan165-166)

Seyda himber êlperestî û neteweperişiyek xav bû;

“Mebe êlperest ey kurê xwendavar
Hemî kurd yek in ey keça namîdar
Dema nema ël û bavik nema ey heval
Di ser rebihirtin geleç cax û sal
Rizîne,genîne,mebe êlperest
Ku dijmin ji bavê me ev reng dixwest
Çi Xerza û Bota û Zaza û Tor
Çi Kurmanc û Kelhor,çi Goran û Lor

Hemî qey ne kurd in çîma perçê bûn?
Bi destê neyaran ve berdan hebûn”(Zend-Avesta r;115-116)

Gelek nirx dida kesên ku bi zimanê xwe diaxivin. Lewre wî baş dizanî
hîm û stûna bingehîn a netewbûnê ziman e. Ji bo wê jî tim bangî gel dikir
ku bi zimanê xwe re rabin û rûnêñ û heta ji wan dixwest ku hînî zimanek
dewlemed jî bibin;

“Vejêne zimanê xwe ey xendevan,
Nebûye milet hîç kesek bê ziman

Tu kurmanciya xwe ji bîra nekî
Eger baş nizanî divê zêdekî

Zimanê biyanî dixwêñî çîra
Zimanê xwe carek naxwêñî bira?”(H.Dîwan r;77-78)

Seydayê Nemir her wekî derheqê şoreşgerî, serxwebûn, propaganda
Nêçîrvanî, Lîstîk û yarî, evîn û evîndarî, jîn, dîrok, kesayetiyêñ hêja,
dostî,birafî, şer aşti....jî nivîsine. Seyda her tim biratiya gelan, wekhevî û
azadî daxwaz kir. Ji bo gerdûnek paqîj, zelal û hawirdorek hêşîn
têkoşıya. Geh delalî, jarî û bindestiya gelê xwe der kir, geh li kêleka
Robson azadiya reşikan xwest;

“Ey heval Robson
Derdê min û te ev derdê giran
Zordestiya ku hate nav cîhan
Fermo em herin
Tevde bigerin”(Sewra Azadî-1954)

Diyan biyan fû,diyan biyan fû!
Lingê koledar li ser te rabû
Kûrê te gernas xwe dane kuştin
Navek pir bilind ji bot e hiştin-sewra azadî 1954

Bengiyê aştiyê û hevalbendiya gelan dikir û dostekî wan bû.heta jê
diyat banga aştiyê dikir û rû û encama şerî kirêt derdixist holê.

Ji hev re bêjin derd û kulêñ xwe
Bikin yek hemî bîr û dilêñ xwe
Barê aştiyê hildin milê xwe
Guh nedîn reng û deng cilêñ xwe
Carek bipirsin ji xortê Qurî
Ka bedrin asî gîrsî û hurî
Li ber firoskan ci tiştê durî
Di şer de her dem xwîne difûri

Di helbesta xwe ya “sermestê evînim”de bi pirsan dixwaze di derheqê çêbûn û hebûna dinyayê de li me bide zanîn ku ev dinya ne ji adem destpêkiriye û wê her û her bidome.Bersivê van pirsan ne cizirî,ne xanî û ne feqî zaniye lê,ger tu bixwazî fêr bibî wer filsefa nû bixwîne,zanî kî ye Cegerxwîn?dibêje

Zimanزان,lêkoliner û wêjewan Qanatê Kurdo ji bo Cegerxwîn wiha dibêje;merivê baş her çar dîwanê wî bixwîne(hingê tenê çaran dîtibû)mijûlî naveroka wan û sazmaniya wan be,wê bê ser wê fikrê û wê ramanê û bêje bi rastî her çar dîwanên Cegerxwîn ansiklopediya peydabûn û pêveçûyina neteweyê kurd e,ya helkeftin,serketin û daketina şerê serxwebûna kurdane,ensiklopediya rabûn,rûniştina kurda ye,ya hevbendiya kurd,ereb,faris û tirkane.Zendavista-şefaq rû;29

Ku em bala xwe didine berhemên Cegerxwînem vê rastiya Qanadê Kurdo destnîşankirî bi zelalî dibînin.Cegerxwîn di berhemên xwe de her tim behsa jiyan,rabûn,rûniştin û adet û toreya kurdan vegotiye û wek dayikekê dixwaze di gel bide ji ber kirin.Di heman demê de ev xema rîspiyeke ye da dundana wî ji toreya bav û kalan dûr ne ke ve.Helbesta wî ya ji biçûkan re ya bi navê “jîn,jîn û jîndarî” de jî erk û rola jînê ya di domandina malbatî de bi awayek xweş û lihevhatî û helbestyane vegotiye.Di helbesta xwe ya bi navê “rebename” de uzrê xwe dixwaze ku mîrên kurd pir neheqî li jin û zarokan kiriye.

**Divê jin azad bibî
wekî me ew dilşad bibî
Perda serî berbad bibî
Wê pir ji me tehlî vexwar-zend avista.**

Mixabin ta îro jî em mîrên kurd hê jî bi gor daxwaza Cegerxwîn tev nagerin. Di helbesta bi navê “cizîrî rabe meyzêne”de gazî cizîrî,geylanî û şîrazî dike û dibêje ku ka ew evîna hûn li pey ketibûnû ew filsefa we pê sond dixwar.Va insen gewher parce kir,li ser heyvî dîkin geşte,lê hê warê te perîşane û gulên te pişkavtin.Ez ne dijmin û ne dostê “dîn”im lê bi derwêşî û bi gaz gazî kes negihaye mafêñ xwe.

HUNER Û AFIRANDINA WI

Seydayê Cegerxwîn di helbesta kurmancî de ekoleke.Ewî hemî ezmûn û ceribandinê beriya xwe têk bir û di helbestê de qonaxeke nû da destpêkiran.Bêhtirîn jî helbest ji qata jorîn ango ji qesr û serayan derxist û anî li meydanê li nava gel raxist.Helbesta kurdî bi wî karî dakeve nav gel û hemû qatêñ milletî.Ewî naveroka helbestê ji nû ve saz kir û reng û durveke din dayê.Kiraseke nû jê re fesiland.Bi wî hemû bereyêñ gel bi êş,azar,xem û kulên xwe cih girtin,bi vî awayî deriyê helbestê ji civakê re vekir.Di derbarê vê angastê de Ehmed Huseynî wiha dibêje

Helbesta kurdî di destpêka xwe de,yanî ji Elî Herîrî,Melayê Cizîrî,Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî heta ku digihije qonaxa Cegerxwîn, yanî heta gîhîst qonaxa wê helbesta dibistanê ku di zimanê zanistî de jê re Skolastîk tê gotin,nifşekî spartîye nifşekî din,heta ku gîhiştiye Cegerxwîn,tu guhertin tê de çênebûye.Yek ji şagirtên herî dilsojane yên wê ekolê Cegerxwîn e.Lê di vir de rola Cegerxwîn pir balkêş bû.Cegerxwîn faktorên bingehîn ên wê helbestê herifand û cara pêşî Cegerxwîn ew helbest bi civatê ve girêda.

Yanî veguhestineke bingehîn xiste sitriktura helbesta klasik.Ew jî ber bi civatê ve kişandina helbestê bû.Yanî ji forma wê ya metafizikî wekî ku Sokrat filsefeya Yewnaniyan ji esmanan daxist erdê Cegerxwîn jî helbesta kurdî ji metafizikîyê ber bi civakê ve anî û ber bi bûyerên rojane ve kişand.(Jiyana Rewşen-hejmar 43 rû;16

Seydayê Cegerxwîn van mijar û babetan bi gelek şewe û awazan nivîsandiye.Di dema destpêka helbest nivîsandinê de bêhtirîn di bin bandora Melayê Cizîrî de bû ye û şewaz û teşeya wî û ya Ehmedê Xanî bi kar anîye,yanî bi erûza erebî nivîsandiye.Ev formen han jî wê demê ne tenê di helbesta me de,di helbesta hemû gelên rojhilatê de hebû.Formen nivîsandinê jî an muxames(pêncane), mesnewî,quesîde, xezel û rûbayî bû.Dema Celadet Bedirxan lê dibe mêvan û jê dixwaze dev ji vê stîla nivîsandinê bedre,ew jî berê xwe dide helbesta nûjen û rê û cihokên wê.Êdî ew,mijarên xwe bi piranî kêşeyî,kîteyî dinivîsîne.Ew cure helbest jî din av xwe de dibine çend beş;helbesten şeşbangî (şes kîteyî),helbesten heftbangî, helbesten heşbangî, helbestêndeh, yanzdeh,duwazdeh û panzdeh bangî.Di piraniya helbesten wî de kêşesazî(kafiye) heye.Helbesten wî bi tql tên gotin û benden wan di dawiyê de bi hev ve têr girêdan û wiha jî ritm û awazeke xweş jê derdikeve.Dema mirov helbestan dixwîne ew ritm û awaza hundurîn ji xweber dibe sedema melodyekê û mirov dibêje qey mirov stranê distrê.Ji xwe gelek helbesten wî bûne bingeha stranan û dengbêjan ew kirine stra.Niha em çend mînakan ji wan bidin;

**Biskan tu bes çîn çîn bike
Miskîn muqabik dîn bike
Seyda tu bes xemgîn bike
Pêşkêşî yek biskêñ xwe ke.**

“milkê “xeten” textê “xeta”-muxames-pêncane di dawiya van ristan de jî bike bike dibe kafiye.

**Tu serbest bijî pir xweş e ev jiyan
Ne tenha ez û tu belê tev cîhan**

Ev her du rist jî mînaka beyitêye û dawiya wan bi jiyan,cîhan diqede û kafiye heye û di heman demê de jî ev cure helbest jî her dem jî alî Seyda

Cegerxwîn ve ji berk u ji panzdeh beytan dibuhure dibe mînaka qesîdê jî.Di heman demê de mînaka yanzdeh kîtyiye jî.

**delal û rind û şêrînê
were nik min şeva înê**

**wekû Zehra û perwînê
ku xanî têk de gûşen bî**

ev ali jor jî mînaka rûbâiyê ye.Ji ber ku ji çar ristan pêk hatiye. Hostayê gotinê di helbestên evîniyê de gelek caran tixûbê hunerê dirûxand û deriyê erotizmê vedikir ku caran digiha pornografîyê. Em baş zanin ku di folklora kurdî de erotika her hebû ye.Vêca serwerê hunera gel Cegerxwîn jî li ser wê mîrate û xezîneyê bejn avêteyiye.

**Ji baxê paxil û singê
Eger sêvek bidî Seyda**

**Xurînî kup ê bişkînim
Diçim ser rê ku rêuî me**

**Eger sêncâ rez û baxan
Çîrand û dest birin sêvan
Dibî lêv herne ser lêvan
Li min megre ku sêwî me.**

Seydayê Cegerxwîn di helbestên xwe de gelek cureyên hunera afirandinê bi kar anîye. Ewî ji bo ciwaniya helbestê istiare, mubalaxa, danberhevkirin, şayesandin hwd cureyên afirandina hêmayan ceribandiye. Hêmayên wî her bi peyvine sade û ji rêzê hatiye pêk hatin.Bi vî awayî ew, li me dide zanîn ku her tişt û peyv dikare bibe alava ciwankariyê. Bes hêmayên te divê ji şenberiyê pêk bê. Lew, ew, dixwaze raman û peyama xwe ragihîne civakê û bi helbesta xwe wê, rake ser lingan. çend mînak ji hunera wî;

Rondik bir û de hatin

Wek Dicle û Ferat in-(mubalaxa)

**Ez bûm xezûrê axê
Bûm şêrgele nav taxê-(istiare)**

**Çawa deng ji tifingê hat
Şahê mezin bû ye mat**

**Seraba her du lêvîn sor
Bidî min tif li kewser bî-(danberhevkirin)**

**Ji çavên reş dîbarî sihrebazî
Kepû almas,diran rengê birincê-(şibandin)**

**Resgûlîne yan du mar in
Ser li singê dane hev-(şayesandin)**

**Padîsha ebrûmaha
Zêrkulaha kesk û sor
por û biskê,rengê miskê
Nûbihara min ew e.(kesandin)**

Seyda di helbestên xwe de gelek peyvîn di jiyana rojane de wek peyvine der adet têن bikaranîn xistiye nav helbesta xwe ;Gayê -beş,kerê reş,derpêqeşmer,seg,zira,kerê,lotadevê,çiyamih,bizin,lat,mar,hirç,hov,ser go,siktir,mîkrob,çirt,virto,nûn,dal,sîrk,Her wiha peyv û termêni biyani jî di elbestên xwe de bi kar anîye. Kerneval, Piano, Sinfoni, Ate, Garson, Leb, Mey, ebrû, ay, perî, ziba, zulf, tîr,dîsa peyva sêv ku di wêjeya devkî de dihate bi kar anîn daxîl helbesta nivîskî kiriye.

Li ser gelek pêşeng û pêşewayên kurdan; Qadî Mihemmed, Mirado, Leyla Qasim..helbest lê kiriye.

Dîsa di helbestan de lîrizmeke ber bi çav heye.Her rist bi hev re tên girêdan û mîna çem û robarê me ku,jî lûtkeyên çiyayan bi xumexum û xuşexûş diherikin,bi awaz û dengekî xweş in.Gelek ceribandinê ku tenê cara ewil wî bi kar anîne jî hene û bo helbesta me ya nûjen bûne bingeha afirandinê.Çend mînak;

**Gul-guj û him-him
Ferat im Ferat
Xuş-xuş û xum xum
Ferat im Ferat
Ferat im kêferat im
Kar im,xebat im
Jîn û felat im.
Va ye ez hat im**

**Dîsa;
Leyla bijî sed aferîn
Ji bom e bû ye ol û dîn
dîsa li min der bûn birîn
Heta ciger min bû ye xwîn
Leyla kî ye
Leyla jîn e
Leyla min e
Leyla min e**

Cavkanî;

Kîne em-pelesor yayınları 1992
Zend avista-şefaq-wesanen deng Stokholm 1981
Hêvi-Aşti- weşanen deng Stokholm 1983
Antolojiya helbestanen kurd-pelesor yayınları 1992
Jînenîgariya min-Apec û Keyo Cegerxwîn-stokholm 1995
Jiyana Rewşen-hejmar 43-2000

Mehfel

Govareke rewşenbîrî werzaneye.

Jimare

(2)

Payîza
2010

*Mehfel ye destur daye ji
bal sendîka
rojnamenivêşen
kurdistanê ve, li pê
biryara jimare (272) li
roja (10\6\2010).*

Xudanê imtiyazê
Rêsan Hesen Cindî

resandinay@yahoo.com
07504501690

Sernivêskar
kovan rêsan Xankî

Xanki_kovan@yahoo.com
07504969810

Sikirtêrê nivêsinê
Hecî Mexso Heso

Hijy_mag2010@yahoo.com
07504576304

Desteka nivêseran:
Misto Liyas Dinanî
Merwan Şêx Hesen Reşkanî
Liyas Ne'mo Xetarî

Derhênanâ Honerî
Xankî

g.mehfel@yahoo.com

Çapxana Hawar- Dihok

*Şiklê rexâ erebî quba Mehma Reşan e li Quntara çiyayê Meqlubê şêxa. Yê
rexâ latinî kevrê Sîhanê yê pîroze li ber hewdên Kaniya spî li peristgeha
pîroza Laliş. Herdu ji bal Xankî ve hatine girtin.*

Babetên di govarê de derbirînê ji boçona nivêskaran dikan

www.arsivakurdji.org